lêkolîn

SALIHÊ KEVIRBIRÎ



serpêhatî – dîrok – sosyolojî
20 kilam 20 qewimîn

# Filîtê Quto

NEFEL

www.nefel.com
info@nefel.com

# Filîtê Quto

# Filîtê Quto

SALIHÊ KEVIRBIRÎ

NEFEL
Stockholm
2002

www.nefel.com
info@nefel.com

**Salihê Kevirbirî:** Filîtê Quto

Weşanxane: Nefel
Sandfjärdsgatan 10, 11 tr.
120 57 Årsta / Sweden

www.nefel.com
info@nefel.com

© Salihê Kevirbirî û Nefel

Çapa dîjîtal: 2002
ISBN: 91-89687-03-5

Grafîka pirtûkê: Arif Zêrevan

Bêyî destûreka nivîskî ti kes nikare vê pirtûkê ji nû ve
bi ti awayî çap bike, kopî bike yan li ber wê zêde bike.

Çênabe ko ti kes fayla vê pirtûkê kopî bike
û di Internetê de bêxe malpera xwe.

# Nêverok


Spasname ........................................................7

Salihe Kevirbirî kî ye ...............................................8

Pêşgotin .........................................................9

1. Şer û kilamak ji herêma Xerzan:
   Şerê pencînaran û elikan ......................................11
2. Xwespartinek li Dêra Axtermanê*cem Metran Îsa:
   Meyrema File û Eliyê Qolaxasî ..................................19
3. Rêbirê karwan û posteya dewletê:
   Emê Gozê ....................................................26
4. Fatihê heft gajaran û fermandara artêşa jinan:
   Gênc Xelîl û Edûlê ...........................................34
5. Ji birakujiya nava eşîran nimûneyeke sosret:
   Emînê Perîxanê-Evdilê Birahîm ..................................49
6. Li Çiyayê Qîre, Delana Paşo, şerê reşkotiyan û etmankiyan:
   Şerê Filîtê Quto û Mamê Elê Etmankî ..........................59
7. Şerê Mala Eliyê Ûnis qewmê çiyê:
   Şerê Newala Qeremûsê .........................................76
8. Mêrxasekî çê û kuştineke bêbext:
   Behcetê Dawûd ................................................83
9. Ji Deşta Xerzan mêrxasekî çê:
   Bişarê Çeto ..................................................88
10. Dîroka ko di çiyayê Sason û şikeftên Karmelîhê de hatê neqişandin:
    Raperîna Mala Elîyê Ûnis .....................................95
11. Ji zargotina welatê Serhedê mînakeke sosret, malkambaxî
    û şerê xal û xwarziyan: Şerê Xûrûcê ..........................99
12. Ji herêma Xerzan serpêhatî û kilameke çêjdar:
    Babê Fexriya Siwarê Gêjo ....................................109

13. Şerê Hesoyê Birahîm (sînikan) û Hecî Mihemedê Mistê (reşkotan):
Şerê Hethetkê ........................................................ 113
14. Karesatek ji herêma Serhedê:
»Çûro û Fesîhê Mihê Mîrze« ............................................ 119
15. Li Geliyê Zîlan Çemê Hesen, evdalê evîneke bêmirad:
Heso û Nazê .......................................................... 127
16. Bavê Elfezya Siwarê Eznawir:
Ferzende Beg ......................................................... 139
17. Welatperwerekî hêja, dostê feqîran:
Dr. Yusuf Azîzoglu (1917–1970) ........................................ 143
18. Teyrê ser milên qîz û bûkan:
Dengbêj Ferzê ........................................................ 148
19. »Mîrê ribabê« Miradê Kinêû nîmûneyek ji dengbêjiya wî:
Firman a* ............................................................ 153
20. Li warê Serhedê axînek ji kezebê:
Qezaya Bûlanixê ...................................................... 159

 E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

*Ji bo bîranîna Evdalê Zeynê, Resoyê Gopala,*
*Şakiro û mamosteyê min Mehmûd Baksî*

## Spasname

Xwendevanê/a hêja,

Ev pirtûka di destê we de, ked û xebata pênc salan e. Bi awayekî serpêhatî, sosyolojîk û dîrokî ji bîst kilam û qewimînan pêk tê. Bi armanca xebateke arşîvî bû kitêb û heger Yezdanê Dilovan hêz û qewet bide, wê xebatên bi vî rengî wekî rêzepirtûk bidome. Kitêba mijara gotinê, jêderka xwe ji zargotin, dengbêjî û stranbêjiya kurdewar wergirtiye. Lewre jî rol û giraniya dengbêjên ji çar aliyên welêt zelal û berbiçav e. Ne ji dengbêjên wekî Gerabêtê Xaço, Zahiroyê Mûşî, Bekirê Îdirê, Zilkûfê Erzeromî, Cahîdoyê kurê Hiseynê Mûşî, Kazo û Salihê Qubînê bûya, wê ev pirtûk nehata pê. Lewre jî di serî de Salihê Qubînê ko di tevahiya kilaman de jê sûd hatiye wergirtin, spasiyên xwe pêşkêşî dengbêjên navborî dikim û xwe li ber van harddîskên edebiyata klasîk a kurd ditewînim.

Her wiha rehma Xwedê ji dengbêjên bi navê Xalê Birê (Birahîmê Newrozî), Şikrî Îzol û Hiseynê Mûşî re dixwazim ko keda wan jî di vê berhemê de heye.

Li hêla din, di warê teknîkî de xweşhaliya xwe ji bo ked û xebata mamoste I. Îşler û Aysel Çetînê tînim zimên û yek bi yek spasiyên xwe pêşkêşî hevalên xwe yên Rojnameya Azadiya Welat, Kovara Jiyana Rewşen û Înstîtuya Kurdî dikim...

18-ê nîsana 2001-ê

Budapeşte / Macaristan

**Salihê Kevirbirî**

## Salihe Kevirbirî kî ye

Di sala 1973-an de li Batmanê hate dinyayê. Bi eslê xwe ji Misircê (Kurtalan) ya Xerzan e. Xwendina xwe ya destpêk, navîn û lîseyê li navçe û bajarên wekî Batman, Farqîn, Misirc û Edeneyê kir. Di sala 1992-an de bi derketina rojnameya Welat re, ji zimanê dayîka xwe haydar bû. Li herêma Çukurovayê di rojnameya Welatê Me de cara yekem dest bi karê rojnamegeriyê kir û heta rojname hate girtin, li herêmê berpirsiyariya rojnameyê kir. Piştî girtina Welatê Me, kar û barê rojnamegeriyê di rojnameya Azadiya Welat de berdewam kir. Di destpêka sala 1997-an de hate Stenbolê, di heman rojnameyê de bû berpirsê karên nivîsaran û ji ber vê peywira xwe, bi dadgeh, girtîgeh û dozgeran re nasraw bû. Ji bilî Welat, Welatê Me û Azadiya Welat; nivîsar, hevpeyvîn û lêkolînên wî di kovar û rojnameyên wekî Özgür Polîtîka, Demokrasî, Özgür Bakiş, Yeni Gündem, Jiyana Rewşen, Avaşîn û Nûdemê de hatin weşandin. Beriya ko biçe ser dilovaniya xwe, bi nivîskar Mehmûd Baksî re li ser romana Serhildana Mala Eliyê Ûnis kar û xebat kir.

Salihê Kevirbirî, li ber qedandina Antolojiya dengbêjan e û dest bi romana Koçero kiriye.

Piştî pirtûka bi navê »Filîtê Quto«, pirtûka wî ya bi navê »Bir Çixlixin Yüzyili: Karapetê Xaço« (weşanên Sî – adar 2002 / tirkî 144 rûpel) hate weşandin.

 E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

## Pêşgotin

Şovalyeyên derebegtiya Ewrûpayê navê xwe dane bajar, qad, salon û gelek cihên girîng. Lewre di dîrok û civaka hemû netewe û gelan de, çîna feodaliyê bi xwe re çand, wêje û folklora xwe jî pêk aniye. Di wê demê de ew çand hatiye afirandin. Di nav mercên wê demê de; ew tişt, ew bûyer, ew leheng, ew qrîter hemû siruştî û normal in.

Ew nirx û hêjayî hemû hîmê civaka me ya îro ne. Heger ew roj nebûna, wateya van rojan dê nehata zanîn. Diviyabû mêrxasan »destên xwe biavêta qebza xencerê«, diviyabû »zîn û heqîb li hespên xwe bikirana û şer heft rojan bidomiya«. Heger serdema feodaliyê, senaryoyek ji vê dinyayê be, ew kesên ko di kilaman de cih digirin an leheng in, an fîgûran in. Bêyî wan nedibû.

Tevî ko civaka me kurdan, ne bi hemdê xwe digere û kemilandina xwe ne li gorî pîvanên sirûşt û civakê pêk tîne jî, motîfên çanda me ya berê reng û tama xwe diniqûtîne ser jiyana me ya îroyîn jî. Ji xwe ya normal jî ev e. Lê mixabin li welatê me bêyî ko navgînên hilberînê û jiyana aborî biguhere, bi zoreke jakoben a ko navê wê »rêzik û şoreşên Atatûrk« lê hatiye danîn, hate xwestin ko nirx, kelepor, kinc û berg, wêje, çand û hemû hêjayiyên din ên me bêne guhertin. Ev guhertineke ne normal, bi zorê û bêesl bû.

Êdî wisa hate fikirîn ko li welatê me, di wextê xwe de jiyina nîrê feodaliyê, qebahet û şermek bû ji bo me kurdan. Camêrên xwendeyên kurdan, di bin bandora çepgiriya kemalîzmê de çanda xwe ya hêja nedîtin. Xweyîtî lê nekirin. Çanda berê wekî temelê çanda îro nedîtin.

Gelo bajarvaniya Ewrupayê li ser kîjan temelî hate avakirin? Kîjan neteweya Ewrûpî dijminê çanda xwe ya berê ye?

Helbet hemû hêjayî û pîvanên berê nûjen dibin, têne guhertin an jî hinek ji holê radibin. Lê ew otantîzma wan divê ko ji aliyê nifşên nû ve bête zanîn. Lewra perçeyek ji bedena me ne.

Sihet xweş Salih Kevirbirî, Xwedê qewetê bide te, ji bo ko tu domahîka van xebatan bibî serî. Kîjan kurdên ko van şer û kilaman bixwîne, ewê

vegere rojên zarokatiya xwe. Ewê dê û bavê xwe, bapîr û dapîra xwe, axa û welatê xwe bi bîr bîne.

13/4 2001

**Hasan Kaya**
Serokê Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê



E-POSTE: **INFO@NEFEL.COM** MALPER: **WWW.NEFEL.COM**

## 1. Şer û kilamak ji herêma Xerzan: Şerê pencînaran û elikan

Eşîra Pencînaran û Eşîra Elikan 2 eşîrên sereke yên Herêma Xerzan bi xwe ne. Pencînarî û Elikî ko ji aliyê nifûsa xwe ve pir zêde ne, li herêmê, li gelek gundî belav bûne. Bi taybetî Eşîra Pencînaran ji 7 bavên bi navê Mûsikî, Welî, Kejikî, Ferxikan, Terxanan, Miradan û ji Mala Şemdîn pêk tê. Ev her du eşîr di dîrokê de gelek caran Deşta Xerzan bo xatirê qirên û şerên xwe yên eşîrî kirine gola xwînê! Mêr ji hev kuştine, keç ji hev revandine û talanên hev birine. Wekî gelek herêmên welêt, li vê herêmê jî, bi taybetî ev bûyer, serpêhatî û qewimîn -çi çê çi xirab- bi saya serê dengbêj û goyendeyan heta îro hatine. Gelek kes li gorî xwe rabûne û nav li van qewimîn û şeran kirine. Hinek ji wan wekî 'malwêranî', hinek kes ji wan wekî 'ehmeqî', lê gelek kes jî navê 'mêrxasî'yê li van qewimînan anîye.Êdî wisa bûye ko, li Herêma Xerzan, mirov nikare gundekî destnîşan bike, ko ji van şerên eşîran re çavdêrî yan jî malevanî nekiribe. Ango, şerê berberiyê lê neqewimîbe.

Şerê Eşîra Pencînaran û Eşîra Elikan jî, yek ji van şeran e, ko bi talanbirinê dest pê kiriye û bûye sedema kuştina (ji Mala Dîbo - elikî) û Gêncoyê Çeto (ji Mala Faro - pencînarî). Beriya ko em derbasî kilama vê qewimînê bibin, werin em kurteserpêhatiya vê karesatê hîn bibin:

### Kuştina Silêmanê Mistê û Gêncoyê Çeto

Mala Faro diçin talanê Gundê Qurê û Serpirê, ko nêzîkî Eskîfê ne, tînin. Li hemberî vê yekê jî, Silêmanê Mistê, jê re 'Gula Mala Dîbo' jî tê gotin, diçe talanê Xatma tîne. Dema ko Silêmanê Mistê tevî karwanan talanê tîne, ji ber rabûna ava Çemê Bişêriyê felat nabîne ko derbasî aliyê din ê avê bibe. Lewma jî, li Gundê Dusadekê li hemberî Gundê Qumaro, ko li aliyê Çiyayê Kolik dikeve, dimîne û li wir radizê. Di vê navberê de, bi şev nîvê şevê, heywanên ko Silêman wekî talan bi xwe re anîbû dadigerin ciyê xwe yê berê, ango dizivirin Xatma. Ev jî dibe sedem ko zilamên Mala Faro (Pencînarî) bên talanê xwe bibin. Mirovên Silêmanê Mistê jî, ji

Eşîra Elikan, Mala Dîbo ne, tên hewarê û li wê derê, di navbera Pencinarî û Elikan de şerekî dijwar derdikeve.

Silêmanê Mistê li qada şer, ji aliyê Ehmedê Îskanê mêrxasê Mala Faro û kurê birayê Bişarê Çeto bi xwe ve tê kuştin. Birayê Silêman Emê jî, bavê wan yek e, lê diya wan cihê ye, heyfa Silêmanê birayê xwe distîne. Ango, Gêncoyê Çeto, ko birayê Bişar û Cemîlê Çeto ye, dikuje. Li gorî saloxdayînan, cendekên Silêmanê Mistê û Gêncoyê Çeto dikevin ser hev. Piştî vî şerî hevalbendên Mala Faro diçin cenazeyê Silêman hildidin û bi xwe re dibin Gundê Eynqesrê, ko qesr û qonaxa Bişar û Cemîlê Çeto li wê ye.

### Kilam li bakur, rohilat û li Qefqasyayê olan dide

Ev kilama ko yek ji 'derdê bê derman' ê şerên bav û bapîrên me ye, li herêmên Xerzan, Serhed û Amedê ji aliyê dengbêjên wekî Şakiro, Qasimê Qûbînî, Teyîboyê ji gundê Sierta ya Misircê (Qurtelanê), Huseynê Farê, Mehmûd Qizil, Zahiroyê Hingilosiyê Mûşî û Salihê Qûbînî ve, bi guherto (wersiyon), ango şêweyên zêde ji hev ne cuda têne gotin. Her wisa li gorî lêkolîna ko me kir, Dengbêj Birahîmê Newrozî (Xalê Birê), ko temenê wî li dora 65-70 sal e, ji eşîra Smaîl Axa (Simko) ye û hê jî li gundê Coniyê ya bajarê Urmiyeyê bi cî û war e, bi xêra Radyoya Urmiyeyê, Beşa Kurdî ev kilama bi dengê xwe yê zîz û zelal li seranserê rohilatê welêt gerandiye û kiriye ko Kurdên Rohilatî jî, ji vê meseleya qetilxwînî haydar bin. Li aliyê din, dîsa em pê dihesin, ko bi dehan caran di Radyoya Yerêwanê de Keremê Seyad bi pêşkêşkirinên wekî, »Gohdarêd ezîz! Niha jî, ji devê Garabêtê Xaço kilameke ji Deşta Xerzan!...« tevî vê kilamê kiriye ko bi dehan kilam, lawje û stranên eşîrî, evînî û şeran li çermedora Qefqasyayê belav bibin.

Belê. Çawa ko beriya şer û di dema şer de ji devê dayika Silêmanê Mistê, Xatê ve hatibe qîrkirin û bangkirin, bi salan e kilam hatiye gotin û heta îro hatiye.

Kerem bikin werin em dêhn û bala xwe bidine qêrîn û awaza Xatêya diya Silêmanê Mistê, ko me ji devê Dengbêj Salihê Qûbînê girtiye.

Silêmanê Mistê: Gula Mala Dîbo
Erê ha dayêêê, ha dayêêê, ha dayêêê, ha dayêêê, ha dayêê
Xatê dibêê Silêmanoo lawo memanî
Ji kula dilê min re lawo xweş memanîîîeûû ayyyy
Silêmanê Mistê; Bavê Xelîl, Bavê Faris


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Bavê Ezê, Kekê Bedêêê le Gula Mala Dibo
Kum û kolozê xwe girêda lawo bi romanîîî
Lawo kum û kolozê xwe girêdaaa bi romanîîî
Destekî cilê şevê li xwe kir, wê rojê hilanîî
Rext û qatiya girê dabûû destê xwe avête qayişa
Tivinga Elemanîî
Xwe berdaye Sîxûra malê binyê mîrata Mizareşêê
Birek devrûtê Mala Dîbooo, ji kezebşewityaaa Reysê Derwêş
Cindiyê Hacîî, Birahîmê Mamûd
Lawo van şevgeran dayê bi xwe re hilanîîînnnûûûeeêêêû
Lawo van şevgeran dayê bi xwe re hilanîîîn
Xwe berdaye Pira Memikan, li Borê Qumaro de derbas bûn,
Li Warê Gundir deee hevraz bûn, derketine
Gaza Çiyayê Kolik, Zengayê Mamoo
Li hafa Deşta Xerzan di Warê Simê de rûniştin
Şêwr û mişêwireteka giran danîîn
Sê heb şade şûtên Silêmanê Mistê Bavê Xelîl
Gula Mala Dîbo hene xwe berdaye Deşta Xerzan
Peşiya terş û talanê Mala Farooo
Talanê giran bi nijdevanîî
Terş û talanê Xatimiyan
Terş û talanê Mala Keran
Terş û talanê Mala Faro
Ga û gamêşê nozde cotan
Ji Gola Modê
Ji Xata diya xwe re lawo vê sibê diyarî anîîeeêêêû

Were ha weylêêê, ha weylêêê, ha weylêêê
Ha weylêêê, ha weylêê
Xatê dibê Silêmano lawooo
Carê bi nezanî terş û talanê Xatma neynin
Talanê Mala Faro yee
Herçî Mala Faro ne mêrî ne, mêrkuj in
Terş û talanan tînin
Hûn xweyê bavê min bûyo
Terş û talanên xwe vegerîniineeêêaaxay
Haîhahîhîîî

Le Xatêê dibê Silêmano lawo memanî
Ji kula dilê minoo te re berxêm lawo xweş memanîîî
Vê sibê peyakî derketî ji Xopana Xatma
Lawo ji xwe re bi hewar û gazîîî
Hewar daye Gozelderêê, Marîbêê, Eynqesrêê
Cemîlê Çeto Bavê Feremez
Di Qesra Eynqesrê de rûniştin û şêwr û
miþêwireteke giran danîîîn
Le qirara kuştina Silêmanê Mistê
Bavê Xelîl Gula Mala Dîbo lawo
Bi xwe re hilanîîn
Xwe berdaye Deşta Xerzan dayê bi giranîîîeeêêaaaxê
Lawo xwe berdabû Deşta Xerzan dayêê bi giranîîî
Ewî qîrekî dabû
Li Mûsikan, li Weliyan, li Kejikan, li Ferxikan
Li Terxaniyan, li Miradan, li Mala Şemdîn
Li heft bavên Pencînaran
Xwe berdane Deşta Xerzan
Bîra Kurêdiya, girtine Pozê Xatma
Rêçiyan rêç û dews û çepera Silêmanê
min deranîîeeêheêax
Haîhaîîî

Were ha weylêêê, ha weylêêê
Ha weylêêê, ha weylêêê, ha weylêê
Xatê digo Silêmano lawo
Wezê diyarê Çiyayê Kolik bi Zengayê Mamo
Ketim lawo li vî banîîî
Bala xwe bidê Cemîlê Çeto Bavê Feremez
Bi siwariyên hespê li xulaman lawo dikir gazîî
Bavê mino hûnê mêr in mêrê çê ne, çê bixebitin
Bi sê dengaaa li Silêmanê Mistê Bavê Xelîl
Gula Mala Dîbo dikir gazîîî
Dibê, lawo ezê îro wê yekê bi serê we de bînim
Tu rojeka wekî roja îro
Li terş û talanê camêra nedî
Ji xwe re nebî lawo bi mêranîîî


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Îro giran e dengê têzê tivinga ketine Çiyayê Kolik
Zengayê Mamo li ser serê Silêmanê Mistê
Bavê Xelîl Gula Mala Dîbo lawo îro kirine kafirstanîîî
Le Xatê dibê: Silêmano lawo
Carê te digo, hevza xwe bike lawo ji hemî hevzî
Hevza xwe bike ji kozikên serê Çiyayê Kolik
Lawo kozikê Mala Faro neeee
Lawo nîşanê Mala Faro zehf in pir gelek in
Temamî bi kimkevej in
Destê wana bi sustem in
Dê rebeno nîşançî ne
Serê kewa berenadinnnnn hahî hahîîîî

Were ha weylêêê, ha weylêêê, ha weylêêê
Ha weylêêê, ha weylêê
Xatê dibê Silêmano lawo
Dêhn û bala min lê ye min dît çend peyayê
Mala Dîbo li serê Çiyayê Kolik lawoo dageriyan
Ezê rabim cerê xwe hildim
Li pêşiya van xweşmêrên Mala Dîbo bisekinim
Ezê dibêm, di bextê we û Xwedê me
Silêman û Ebê, Reysê Derwêş, Cindiyê Hacî
Birahîmê Mamûd kane lawo ne xwiya neeê
De lê Xatê rebenê Silêman û Ebê, Reysê Derwêş
Cindiyê Hacî, Birahîmê Mamûd
Li serê Çiyayê Kolik ji xwe re
kemîn vedaneeeêêûûûayy

Le Xatê dibê, Silêmanê lawoo
Ezê bi Çiyayê Kolik, bi Zengayê Mamo
Hafa Deşta Xerzan ketim
Qasê Koro, pismamê xayîn heyra min go ha hewar e
Emê va ye Silêmanê minê lawooo ne xwiya yeee
Tivinga Emê li mila ye
Tivinga Silêmanê minê reben
ezê bi kewkî lawo bi desta yeeêêû

Xatê dibê, Emê di bextê te û Xwedê me
Silêmanê min ka ye lawo, ne xwiya ye

Dibê: Xatê rebenê, termê Silêmanê Mistê
Bavê Xelîl Gula Mala Dîbo
Li serê Çiyayê Kolik li Mexera Bênderokê mayeeêê
Were ha weylêêê, ha weylêêê, ha weylêêê
Xatê dibê, Emê lawo memanî
Ji kula dilê te re berxêm lawo xweş memanîîî
Tu bala xwe bide Cemîlê Çeto
Bavê Feremez bi tan û niça îro çi bi serê kekê te ve anîîî
Tu bavê diya xwe bûyo lawo
Şerê xwe bikin îro bi giranîîî
Belgî Xwedê Teala siûd û îqbalê ji te re li hev dû anîîî
Te heyfa Silêmanê Mistê Bavê Xelîl
Gula Mala Dîbo bi destê xwe hilanîîûûêêê
Belê tana Emê hilanî
Li serê xwe li serê kevirê kozikê de deranîî
Derbekî daye bejn û bala Gêncoyê Çeto
Zavê destbihene termê Gêncoyê Çeto
Bi ser termê Silêmanê Mistê ve danîîeeêêû
Le bi sê denga li Ehmedê Îskan
Li peyayê Mala Faro li Bavê Misto dikir gazîîî
Dibê: Bavê Misto, tu dagere
Heyra nizanim tu çewanîîêêêû
Te digo, ezê herim di Qesra Eynqesrê de rûnim
Pesn û wesiyetê xwe bidim lawo bi mêranîî
Te digot, ezê bêjim
Li terş û talanê xwe da li pêşiya heval û xweşmêrên
Mala Dîbo deranî û anîî
Yekî weka Silêmanê Mistê Bavê Xelîl
Gula Mala Dîbo serekvanê nijdevanan
Lawo îro di gerewa talan te danîîn
Tu nabêjî min xortekî weka Gêncoyê Çeto
Zavê destbihene îro di gereva Silêmanê Mistê de danîî
Tê dagere sed carî bi serê bavê te kim
Derbeka daye li bejn û bala Gêncoyê Çeto


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Zavê destbihene le zavekî bîst û çar roja ye
Hêja hena zavatiyê li desta ye
Îro min heyfa kekê xwe bi destê xwe hilanîîî

Were ha weylêêê, ha weylêêê, ha weylêêê
Ha weylêêê, ha weylêê
Xatê dibê, Silêmano lawo
Bila şereka giran li me çênebûya li Çiyayê Kolik
Zengayê Mamo, li Hafa Deşta Xerzan
Lawo vê sibê li diyaraaaneêêûû
Heyfa min nayê li kuştina Silêmanê Mistê Bavê Xelîl
Gula Mala Dîbo, heyfa min tê li wê heyfêê
Çardara Silêmanê Mistê Bavê Xelîl Gula Mala Dîbo
Girêdane, dar nebû çar darên Gêncoyê Çeto
Birine Eynqesra Bavê Şebo
Lawo bi xwe re birine nav beyaraaûûêê haîhaîîî

Xatê: »Gênco bi gîzme û qondere ye,
Silêmanê Mistê bi çarox û bi gore ye!«

Piştî kuştina Silêmanê Mistê û Gêncoyê Çeto, Xatêya diya Silêman diçe ser cendekên van her du mêrxasan. Bişar û Cemîlê Çeto tevî xulam û şerkarên xwe li ber siya Qesra Eynqesrê rûniştine û dêhn û bala xwe didinê ka Xatê wê li ser cendekan çi bike. Balkêş e, ko Xatê pêşî diçe ser cendekê Gêncoyê Çeto, pişt re jî diçe ser cendekê kurê xwe Silêman. Her çi qas êdî neyar bin jî, Xatê vê yekê ji bo xatirê ko li hafa Bişar û Cemîlê Çeto ye dike. Bê guman di vir de mezinahî û şêrejiniya Xatê derdikeve holê. Xatê ne bi tenê li ber kuştina kurê xwe dikeve û pê diêşe, her weha ew ji ber ko mêrxasekî mêran e, li ber Gêncoyê Çeto jî dikeve û kezeba wê dişewite. Li hemberî vê kirina Xatê, Bişarê Çeto berê xwe dide Xatê û jê re wisa dibêje: »Xatê! ka kilamekî bavêje ser Gêncoyê Çeto û Silêmanê Kurê xwe...« Xatê berê xwe dide Bişêr û jê re wisa dibêje: »Ka ez çi bêjim? Gêncoyê birayê te bi gîzme û qondere ye, wê xelk bêje Silêmanê Mistê bi çopikê çolê, bi çarox û bi gore ye.« Di vir de, Xatê dixwaze bibêje, bi gîzme û qonderê Gênco axa û xwedan eşîr e, lê Silêmanê kurê wê gundiyekî bi çarox û bi gore ye. Lê, Bişarê Çeto van gotinên Xatê nahewîne û wisa lê dizivirîne: »Na Xatê, Silêmanê kurê te jî, wekî birayê

min Gênco mêr û mêrxasekî çê ye.« Û dixwaze ko li gorî vê yekê dawiya kilamê bîne. Lew re jî Xatê wekî dawiya kilamê li ser her du cendekan wisa dibêje:

»Were ha weylêêê, ha weylêêê, ha weylêêê
Ha weylêêê, ha weylêê
Xatê dibê, Silêmano lawo
Bila şereka giran li me çênebûya
Li Çiyayê Kolik, Zengayê Mamo
Li Hafa Deşta Xerzan lawo vê sibê li diyaraaaneêêûû
Gênco bi gîzme, bi qondere ye
Wê xelq bêje Silêmanê Mistê bi çopikê çolê ye
Bi çarox û bi gore ye
Pirs bike wê eşîra bi xwe re
Roja şerê Çiyayê Kolik Zengayê Mamo
Silêmanê Mistê beramberî Gêncoyê birayê te ye
Hahîîîîeeêêûû...«


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

## 2. Xwespartinek li Dêra Axtermanê* cem Metran Îsa: Meyrema File û Eliyê Qolaxasî

Meyrema File, keça keşe, bûka Sarkîs jê re digotin. Malbata Sarkîs Meyrem ji kurê xwe re xwestibû, lê hê nebiribûn, ango daweta Meyremê nekiribûn. Meyremê keçeke bedew bû. Li dora wê, ji delalî û bedewiyê nav û îsmê wê belav bûbû. Delaliya Meyremê çûye ber guhê Waliyê Wanê bi xwe jî. Walî rojekê Meyremê dibîne û dil û çav berdidê, xeber ji der û dor û malbata wê re dişîne û dibêje: »Ji îro û pê ve bila tu kes behsa Meyremê neke. Heger sax be ji min re ye, bimire ji axa sar re ye!« Û wisa didomîne: »Kesê ko Meyremê ji xwe re bibe, bila ruhê xwe hesab neke, ez wî li dinyayê sax nahêlim!« Mala xezûrê Meyremê Sarkîs jî, ji tirsa walî newêrin bûka xwe bibin, yan jî berdin.

Li gorî saloxdayînan û goyendeyan, bi qasî 4 sal derbas dibe. Meyremê jî, li mala bavê xwe dimîne. Rojekê Meyremê bi qasidekî xeber ji walî re dişîne û jê re wisa dibêje: »Xwedê heqê min ji te re nehêle! Tu li ser qedera min rûniştî. Ne tu min ji xwe re dibî, ne ji tirsa te kes diwêre min ji xwe re bibe. Yan destê xwe ji ser min hilde, yan jî peyayekî xwe bişîne ko ez ji te re werim...« Walî difikire, dibêje: »Gelo ez kê bişînim?« Eliyê Qolaxasî xizmetkarê nava mala wî ye. Di dilê xwe de dibêje: »Wele Elî mirovekî namûskar e û rast e. Ezê Elî bişînim pey Meyremê.« Walî radibe Eliyê Qolaxasî dişîne, jê re dibêje: »Tuyê herî Meyremê ji min re binî. Gava ko Elî tê cem Meyremê û Meyremê çav bi Elî dikeve, ji ber ko Elî xortekî pirr qeşeng û bedew e, aşiqê bejn û bala wî dibe. Her çi qas Elî pirr bedew be jî, ji ber feqîriya dinyayê cil û libasên wî ne ew qas baş in. Meyremê dibêje: »Elî tu hatî min ji Walî re bibî?« Elî dibêje: »Belê Xatûna min!« Meyremê dibêje: »Elî, ez bi vî şiklê hanê bi te re nayêm. Ez qîza keşê me û tu min ji Waliyê Wanê re dibî. Ez bi vê girêdana te bi te re nayêm. Heger pere li ser te tunebin, ha ji te re pere; here cem berber teraş bibe, here hemamê serê xwe bişo, destek cilê efendî û kumsoran li xwe bike û were ko ez bi te re werim...«

## Qam û qidûmên Elî dişikên...

Eliyê Qolaxasî bi ya Meyremê dike; diçe teraş dibe, destek cilên efendiyan li xwe dike, diçe hemamê serê xwe dişo û dadigere cem Meyremê. Bi vî halê xwe, Elî çi qas qeşeng û delal bû, qeşengtir û delaltir bû. Her weha dema ko Meyremê çav bi Elî dikeve, eşqa wê ya ko heye deh qat zêdetir dibe. Meyremê berê xwe dide Elî û jê dipirse: »Elî, ka xwe bide ber Êynê, tu xweşik î, yan ez xweşik im?« Elî bersiva Meyremê dide: »Estexfirillah xatûna min, tu ji min û ji bavê min zêde yî!« Meyremê dibêje: »Elî, henek û laqirdiyan neke, ya rast çi be wê bibêje. Wele tu xortekî qeşeng î, ez jî qîzeke bedew im. Em her du layîqî hev in. Were min ji xwe re bibe. Haşa hizûr, ker di diya wî waliyî ne. Çi dike bila bike.« Piştî van gotinan qam û qidûmên Elî dişikên, ziman lê dieliqe, nizane çi bibêje, ji tirsa walî. Ji Meyremê re dibêje: »Xatûna min, çi heqê te li min heye? Ez hê ciwan im, bi miradê xwe şa nebûme. Tu li birrîna serê min digerî? Tu jî dizanî, walî zalimekî wisa ye ko, ez hêlîna xwe bibime esmanê heftan, wê walî min bîne xwarê û min bikûje!«

## Xwe diavêjin tor û bextê Metran îsa...

Meyremê berê xwe dide Elî û bi awayekî acizbûyî jê re van gotinan dibêje: »Binêre Elî, heger tu min ji xwe re nebî, bi nav û îsmê Xwedê saeta ez bigihîjim cem walî, ezê bibêjim, wele dema hatinê, Elî di rê de dest avêtiye namûsa min!« Elî piştî van gotinên Meyremê kete nava Xelîl û Celîlê! Dizane ko Meyremê ji xwe re bibe jî wê serê wî bê jêkirin, ji walî re bibe jî. Dema ko Meyremê ji walî re wisa bibêje, wê serê wî were jêkirin. Elî ji Meyremê re dibêje: »Xatûna min, de ka ji min re bibêje, ezê te bi kû ve bibim? Kesê ko me bistirîne jî tuneye.« Meyremê jê re dibêje: »Elî tuyê min bibî biavêjî Dêra Axtermanê cem Metran Îsa. Wê Metran Îsa li ber barê me rabe.« Elî qebûl dike, tevî Meyremê berê xwe didin Dêra Axtermanê cem Metran Îsa.

Ji vir û pê de bi awayekî kilamî weha diqewime:

Meyremê dibê:
Elîyo sibe yeeee, gelo min go wa ye çi sibeka bi xêr û bêr ee
Rabe qeyîk û gemiyê Metran Îsa gelo li hev girêdee
Emê îro xwe bavêjin tor û bextê Metran Îsa lo di dêrê deêêê
Heyla delîl li min û li vî Metranî, li vî hogiçî ax lo li vî beranî
Bila ji diya Metranê Dêra Axtermanê pêştir nebêje


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Min çok da erdê ji xwe ree kurek anî
Metran Îsa ji wî zemanî, heta vî zemanî nav û dengêêê xwe deranî

Elî dibê:
Meyremê sibe yeeee gelo wa ye min got
dîsa çi sibeka bi xêr û bêr eee
Minê rabûye qeyîk û gemiyê Metran Îsa temamî
kar kir lo li hev girêdaaa
Eliyê Qolaxasî rabû bi destê Meyrema File,
le qîza keşe, bûka Sarkîs
Dostika Waliyê Wanê girtî lo mîro ji xwe reee lo revandiye
Minê xwe li Xwedê û li nav û dengê
Metranê Dêra Axtermanê xwe girtiye
Qesta Dêra Axtermanê kiriyeee
Heylo delîl delîl tew lo lo diloo
Heyla delîl lo li vî Metranî
Bila ji diya Metranê Dêra Axtermanê pêştir nebêje
Min çok da erdê ji xwe ree lo kurek anîîî
Metran Îsa ji wî zemanî, heta vî zemanî
nav û dengêêê lo xwe deranî
Erê dibê sibe yee gelo va ye fecir lê da çi sibeka zû yeee
Metran Îsa rabûye qesta Dêra Axtermanê kiriyeee
Belê, bala xwe dayê ko reşekî li binê Dêra Axtermanê sekiniye
Erê Metran Îsa dibê:
Kuro, şeva vê nîvê şevê ka bêjê îşê te li binê
Dêra Axtermanê li vir çi ye
Eliyê Qolaxasî dibê:
Metrano, ez çi bikim îro filetî ye
Minê rabûye bi destê Meyrema File, qîza keşe, bûka Sarkîs,
Dostika Waliyê Wanê girtî ji xwe reee lo min revandiyeee
Minê xwe li Xwedê û li nav û dengê Metranê
Dêra Axtermanê xwe girtiyee
Eger îro tuyê Meyrema File li min mar bikî
li ser dînê Muhemmed eee
Sed aferîn dîsa ji nav û dengê te ree
Heger tu mar nekî ezê qebûl bikim dînêêê lo Metran Îsa
Heyla delîl delîl lo li vî Metranî

Metran Îsa ji wî zemanî, heta vî zemanî
nav û dengêêê lo xwe deranî

## Camêrî û mêrxasiya Metran Îsa...

Belê, wekî ko ji kilamê jî diyar dibe, xwespartineke eşkere û mecbûrî tê dîtin. Lew re ji bo bihevrebûn û zewaca Meyrema File û Eliyê Misilman mahrkirineke olî pêwîst e. Eliyê Qolaxasî ji Metran Îsa dixwaze, ko ew ji bo mahrkirinê bibe alîkar û jê re weha dibêje: »Heger tu li ser dînê Muhemmed, Meyrema File li min mahr bikî, sed aferîn ji nav û dengê te re! Na, heger tu li ser dînê Muhemmed mahr nakî, ji bo pêkhatina vê yekê ezê werim ser dînê te, ango ezê jî îro bibim file...«

Lê balkêş e, li gel van gotinên Eliyê Qolaxasî mêrxasî û camêriya Metran Îsa derdikeve holê. Lew re Metran Îsa ji bo mahrkirina Meyrema File li Eliyê Qolaxasî, pejirandina dînê Xirîstiyaniyê ya Elî qebûl nekiriye û soz daye, ko ewê gazî mele û du feqiyan bike, ji bo ko mahra wan li gorî şert û şirûtên Îslamiyetê bibirrin.

De werin bi awayê kilamî guhê xwe bidine Metran Îsa bê ka ji bo van gotinên Elî Metran Îsa çi gotiye:

Erê, Metran Îsa dibê Eliyoooooo lo wez wiha nakim
Ez vê yekê li dinyayê qebûl nakim
Wele nav û dengê Dêra Axtermanê kevin e,
mezin e, ez xirab nakim
Ez vê serê di nava dînê Muhemmed de qet rast nakim
Ez ji boyî xatirê kevnejinekê dînê Muhemmed
li ber tu dîna zelûl nakim
Lawo, ezê îro gazî meleyek û du heb feqiya kim
Ezê bi qewlê Xwedê, bi hedîsa Resûlallah bînim
Meyrema File lo lo li te mar kim
Heylo delîl delîl tew lo lo diloo
Heyla delîl delîl lo li vî Metranî
Metran Îsa ji wî zemanî, heta vî zemanî
nav û dengêêê lo xwe deranî

## Waliyê Wanê dê û weledê xwe diavêje!

Gelo di vê navberê de rewşa Waliyê Wanê çawa ye? Jixwe piştî ko Elî Meyremê revandiye, dinya alem pê hesiyaye. Bê guman, tiştekî mezin û


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

ecêb e ko, xizmetkarekî wekî Eliyê Qolaxasî Meyrema File, ko dostika Waliyê Wanê ye, revandiye. Piştî ko Walî jî pê dihese, »dê û weledê xwe diavêje«, çav lê sor dibin. Radibe kaxizekê ji Metran Îsa re dişîne û tê de dibêje: »Min seh kiriye ko, du kevok firiyane, hatine ser Dêra Axtermanê danîne. Tu wan kevokan ji min re dişînî, ezê bidime te hezar kîsan. Tu dişînî bişîne. Na, heger tu wan kevokan ji min re naşînî, ezê Dêra Axtermanê bi ser serê te de bînim xwarê!« Di vir de, ji kevokan qesta walî Meyrem û Elî ye.

Werin vê gavê jî em dêhn û bala xwe bidinê bê ka Waliyê Wanê hêrsa xwe çawa vereşiyaye û li hemberî vê yekê Metran Îsa çi daye dest, ango çi jê re gotiye.

Walî dibê:

Kaxizekî ji Metran Îsa re reş kiriye bi rê kiriye
Erê Walî dibê: Mêtrano dîsaaa lo lo bi min dîsaaa
Min dît du kevok ji selîsa fir dan hatin Dêra Axtermanê
li cem Metran îsa
Heger tu wan her du kevokan bigirî bişeyînî
Ezê bidime te bi qederê hezar kîsa
Heger ko tu negirî, neşeyînî
Ezê bikim kevir û kuçikên Dêra Axtermanê
Bi ser serê te de lo lo werin xwarêêêê
Heylo delîl delîl tew lo lo diloo
Heyla delîl delîl lo li vî Metranî
Metran Îsa li binê Dêra Axtermanê ji xwe re lo kemîn danîîî
Metran Îsa ji wî zemanî, heta vî zemanî
nav û dengêêê lo xwe deranî

Dotira rojê Elî zava ye,
Meyrem bûk e...

Metran Îsa mêrî ye, mêrxas e. Ji gotina xwe nayê xwarê, guh nade »hezar kîsên« zêr û pereyan û nabe şirîkê kuştina her du kevokan, bêbextiyê li Meyremê û Elî nake û ji walî re vê xeberê dişîne:

Erê Metran Îsa dibê:
Waliyo, lawoooo lo ez Metran im,

Ez kekê Bedran, Henan û Yewnan im
Ezê bi kumê metraniyê bigirim li erdê xim
Ezê laşa sawî Dêra Axtermanê rakim
Lawo sibê lad e, wê file bikevin, bikişin sûkan û çarçiyan e
Wele sibe vî çaxî Elî zava yeeee, lo ax Meyrem bûk eeee
Haylo delîl li min û li vî metranî
Li vî hogiçiyî li vî beranî
Ji diya Metranê Dêra Axtermanê pêştir
Bila nebêje min çok da erdê ji xwe re kurek anî
Metran Îsa ji wî zemanî heya vî zemanî,
 nav û dengê xwe deranî
Metran Îsa li qarşiyê Walîyê Wanê,
Di binê Dêra Axtermanê hêja şerek danî
Heyla delîl delîl lo li vî Metranî

Piştî van gotinên ko Metran Îsa û Waliyê Wanê ji hev re dibêjin, walî leşker dişîne ber Dêra Axtermanê, Metran Îsa jî bang li temamê filehên der û dora Wanê kiriye. Ew jî hatine xwe li Metranê xwe girtine. Waliyê Wanê bala xwe didê ko, rewş xirab e, şerek derkeve, wê ji her du aliyan jî wekî »gola xwînê« xwîn birije. Pişta stûyê xwe dixwirîne, siwarî û leşkerên xwe ji ber Dêra Axtermanê dikişîne û berê xwe dide Wanê.

Metran Îsa dotira rojê, li Dêra Axtermanê dawet, kêf û şahiyekê li dar dixe û li gorî şert û şirûtên Mihemedî Meyrema File li Eliyê Qolaxasî mahr dike.

***Dêra Axtermanê:**
Yek ji dêr û manastirên herî girîng ên qirna navîn a Xirîstiyaniyê Dêra Axtermanê ye, ko li Girava Axtermanê ya li Behra Wanê ye. Girava ko herêmeke tûrîstîk a welatê me ye, li başûrê behrê (di gel ko li gorî pîvanên erdnîgariyê gol e, gelê me jê re Behra Wanê gotiye), nêzîkî Bendava Vestanê (Gewaş) ye. Her weha Girava Axtermanê 5 km. dûrî navçeya Vestanê, 50 km. jî dûrî bajarê Wanê ye.

Dêra Axtermanê, di navbera salên 915-921'ê de, bi ferman û xwesteka Mîrê Vaspûrakan Gagîk Ardnuziyê Yekem, ji aliyê Avahîsaz Manuel ve hatiye avakirin. Mîrnişîniya Vaspûrakan di sala 1021'ê de ji aliyê Bîzansiyan ve hatiye rûxandin û Dêra Axtermanê di sala 1113-an de veguhestine manastirê. Vê wargeha kevnar heta sala 1895-an jî, hebûna xwe

bi temamî parastiye. Ji avakirina manastirê heta roja îro, »Dêra Navendî« ko »Kompleksa Dêra Xaçî ya Pîroz« e, Şapeliya Zakarîas ko di salên 1296-1336-an de li başûrê rohilatê dêrê hatiye lêkirin, Jamaot (wargeha ketinê) û qûleya naqosê, ko di dawiya sedsala 18-an de, li deriyê başûr ê dêrê hatiye çêkirin, li ser piyan mane.

Dêra Axtermanê taybetmendî û girîngiya xwe ya dîrokî him ji mîmariya xwe ya bê hempa û him jî ji xêzên ko ji mijarên Incîl û Tewratê hatine wergirtin digire. Mixabin îro freskên ko di mekana navîn de ne ji dirûv û taybetmendiyên xwe yên hêja gelek tişt wenda kirine.

## Çavkanî:

1. Ji bo serpêhatiya kilamê agahiyên ko ji çend rîspî û dengbêjên herêmên Botan û Xerzan hatin wergirtin.

2. Gotinên kilamê bi xwe, ji devê Dengbêj Salihê Qubinê hatin girtin.

3. Agahiyên teknîkî û dîrokî yên der barê Dêra Axtermanê de ji kovara bi navê »Dünyada Van« û ji nivîseke Zanîngeha Yüzüncü Yilê, Fakûlteya Wêjeyê, Para Arkeolojî û Hunerê hate wergirtin.

## 3. Rêbirê karwan û posteya dewletê: Emê Gozê

Her wekî ko em ji çîrok, lorî û serpêhatiyên bab û bapîrên xwe dizanin, di dem û dewrana xwe de, êl û eşîrên giran, mêr û mêrxasên cengawer tirs û sawa Roma Reş bûn. Gelek caran li ber mêrê çê yên şevger, şerker û nijdevanên[1] kurd ên ko deşt, newal û çiyayên bilind ji xwe re kiribûn wargeh; karwan û posteyên leşkerî yên dewletê, nedigihîştin ser cih û warên xwe. Tim û daîm, Roma Reş, a ko ji wan siwarçakên[2] dewletê şikestekên dijwar dixwar, ji ber ko bi wan nedikarî, çiqas eşîr, kom û malbatên dorhêlê hebûn, li hev kom dikir û dişand ser wan kesan.

Di dîrokê de bi sedan kesên wekî Bro Heskê Têlî, Ferzendeyê Bavê Elfezya, Keremê Qolaxasî, Koçeroyê Farqînî û hwd. bûne sedem ko, xew li zabit, yuzbaşî û bînbaşiyên dewletê biherime. Belê! Emê Gozê jî yek ji wan mêr û mêrxasan e ko, bi dehan sal e, li çarmedorê welatê me, di devê dengbêj û goyendeyan de bûye benîşt, îro bûye lehengê vê nivîsê.

### Nasnavê Emê Gozê û qewmîna li Geliyê Belîsê:

Emê Gozê kî ye? Di serî de em wî nas bikin. Emê Gozê ji Eşira Elikan[3] ji Mala Remo ye. Pismam û xweşmêrê tivingê yê Şemsedînê Hesenê Ozman e. Şemsedîn, hem serokeşîr û hem jî rihspiyê wan e.

Emê Gozê, tevî çend peyayên bijare yên eşîrê, ji Deşta Xerzan radibin û li mintiqeya Geliyê Belîsê diçin pêşiya poste û karwanê zabit û cendermeyên Roma Reş. Bi wan re şerekî dijwar pêk tînin. Leşker û zabitan ji hev dipelişînin û malzemeyên di karwan û posteyê de, wekî talan, ji xwe re tînin. Piştî vê qewimînê, ji ber ko dewlet hêz û quwetê di xwe de nabîne, êl û eşîrên dorhêlê dicivîne ser hev û berê wan dide ser Hesenê Ozman û şerkerên wî. Gelo ew eşîrên ko dewletê şandin ser mêrxasên Hesenê Ozman kîjan bûn? Eşîra Pencînaran[4] ko ji heft bavikan pêk tê û wekî eşîra Cemîlê Çeto tê binavkirin, şêxên Geliyê Zîlan, Mala Eliyê Ûnis, Çerkez û Bêzarê Deşta Mûşê û Eşîra Remiyan, navê çend eşîr û kesên ko di kilamê de derbas dibin, bi xwe ne. Her weha Nehiye Midûr


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

û Qeymeqamê Zoqê[5], Qeymeqamê Elmedîna[6] û Qeymeqamê Kopê[7] (Bulanixa Muşê ) jî piştgiriya hêzên dewletê dikin û zabit û leşkerên xwe dişînin ser Emê Gozê.

Pismamê xayîn Simê Ozman diçe ser dews û çeperan

Balkêş e ko tevî van eşîran, Simê Ozman jî, ko pismamê Emê Gozê bi xwe ye, bi leşker û cendermeyên dewletê ve tê ser Mêrxasên Hesenê Ozman û Emê Gozê. Simê Ozman û Emê Gozê ji Eşîra Elikan in. Simê Ozman ji Bavik ango Mala Dîbo ye, lê Emê Gozê ji Mala Remo ye.

Di kilamê de li ser vê yekê ango li ser xiyaneta ko Simê Ozman bi pismam û eşîra xwe re kiriye, Gozêya Diya Emê, berê xwe dide Emê û jê re weha dilorîne:

»...Gozê dibê; bila tirsa te tune be ji eskerê dewletê kurê xelkê ye

gava xwîn bikeve erdê, terqîn bikeve tivingê, bira li bira nabe xweyî ye;

Bila tirsa te tunebe ji eskerê Eliyê Ûnis wekî kewê çiyê ye,

Bila tirsa te tune be ji her sê zarê Çeto yek Bişar e, yek jê Cemîl, yek jî Gênco ye,

Yek jî jê re dibêjin Mihemedê Derwêş babê Şemsedîn peyayê keşkaniyê Kekê Meysê ye,

Bila tirsa te tunebe ji Emînê Ehmed Lawê Perîxanê, çavê wî li talan e ko were lihêf û dewşeke ji xwe re bibe birevîne,

Bila tirsa te hebe ji Simê Ozman malikşewitî, pismamê xayîn e, bi kozik û deverê me dizane...«

### Lingê xwe qeyd dikin û miftê dişînin Qesra Baxemsê[10]

Belê...Vê gavê jî em vegerin ser qada şer. Wexta ko tevahiya van eşîran tevî dewletê diçin ser Mala Hesenê Ozman; Emê Gozê, Hesenê Şêxo û Mihê Emer xweşmêrê bi nav û nîşan in. Li kozika Kolanê[8] Hedîsê Zêwikê[9], soz didin û ji hev re dibêjin: »Kuştina me hebe û reva me tunebe!« Bi vê gotinê jî namînin, her sê ciwamêr lingê xwe di kozikê de bi hev re qeyd û zincîr dikin, mifta qeydê jî dişînin Qesra Baxemsê cem Hesenê Ozman.

Kilama Emê Gozê li çar aliyên welêt, bi guhertoyên (versiyon) cur bi cur tê strandin. Me xwest ko ji wan guhertoyan, a ko li Herêma Xerzan û li Herêma Urmiyeyê tê strandin bidin ber dêhn û bala we. Guhertoya ewil ji Herêma Xerzan ji devê Dengbêj Salihê Qubînê, a duyemîn jî ji devê Dengbêj Xalê Birê (Birahîm Newrozî) hate wergirtin. Salihê Qûbînê li Xerzanê, Xalê Birê jî li Urmiyeyê dengbêjên bi nav û deng in. Di

navbera her du kilaman de, li gel ko ji deverên ji hev dûr hatine strandin jî, zêde cudabûn peyda nebûye.

Niha jî kerem bikin werin em bi hev re guhê xwe bidin kilama vê qewmînê ko me ji devê Dengbêj Salihê Qûbînê û Xalê Birê (Birahîmê Newrozî) girtine..

(Ji devê dengbêj Salihê Qûbînê)

Bişarê Çeto gazî dike
Dibê: Emê Gozê, Hesenê Şêxo, Mihê Emer
Lawo malê ticaran bidin werin rayê
Eger hûn neyên rayê,
Ezê îro Qesra Baxemsê bidim bayê
Aliyekî bikim sekla tewla canikê hespa ye,
Aliyekî ezê bikim kadîna kayê
Ezê berê çilûx û çicûxê we bidime Bexdayê

Emê Gozê, bi sê denga bang lê dike
Dibê: Bişaro bi serê bavê te kim
Heçî hûn Mala Faro ne, malekî malmezin in, parsûhişk in
Xeber bi serê we de naçin
Ezê îro malê ticaran bidim, werim rayê
Hetanî sax bim li heyata dinyayê
Le serê min li ber êl û eşîrên giran hilnayê

Piyê minê li qeydê ye mifta qeydê li jor e li ba Hesenê Ozman e
Min sozek bi mala Hesenê Ozman re daye
Îro di Kozika Kolanê de kuştina me heye carekî nayême rayê

Gozê bang li kurê xwe dike
De lêxe Emê Gozê de lêxe enîgiçiyo pozberano de lêxe
Le bavê min o şer giran e îro hûnê bi hev re lêxin
Le navê nam û namûsê lawo bi dinê xin
Navê revê pîs e giran e
Li pey malbata mala bavê min û xwe nêxin

Dibê: De lêxe Emê Gozê de lêxe


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Mihê Emer Hesenê Şêxo, Mihê Emer
        çend peyayê kozikê bavê min bûno
        şer giran e bi hev re lêxin
Îro qûndaxa sûstemê[11] li erdê xin
Nam û navê namûsê bi dinê xin
Navê revê pîs e giran e
Li pey malbata mala bavê min û xwe nêxin

Sîsilê bi sê denga li palê qesrê dike gazî
Dibê: Dora qesra kekê min bi gilgil e
Dora avayê kekê min bi gilgil e
Dengê top û tivingê hikûmatê, bêşatêşê[12] Mala Faro
Ji siba Xwedê ve li ser qesra kekê min rebenê bi xura-sxur e
Dibê: Qesra kekê min di kortê de
Avayê kekê min di kortê de
Tim û baran û payîzan çiqas xweş e ji herbê re
Îro çiqas Bişarê Çeto ji mala xwe rabe
Qol û benda li kekê min girêde

Dibê: Bi hela hela nav tê danê
Berê sûstema dane Kozikê Kolanê
Destê xwe avêtine ser mîratê tetika bi hev re tilî danê
Heyfa min nayê li wê heyfê
Cenazê Emê Gozê, Hesenê Şêxo, Mihê Emer
Maye li Hedîsê Zêwikê li Kozikê Kolanê

Seyrê Dibê: Mihemedo lo bira
Havîn e ji kula dilê min bira ji te re xweş havîn e
Le xelkê der û bênderên xwe hilanîne
Li kozik û muderisê Mala Remo necadîne
Le Mala Remo maleke ber û mêrî ne
Tu mêrê me Mala Remo li ser hev du tunî ne
Ji berê de ji mala bavê min û te re maleke mêşinî ne

Mihemedo dibê: Lê lê Seyrê diya min bûyê
Xwiha minê ez zanim havîn e ji kula min û te re xweş havîn e
Le xelkê der û bênderê xwe hilanîne

Ez zanim Mala Remo maleke ber û mêrî ne
Le tu mêrê me Mala Remo li ser hev du tunî ne
Ji berê de ji mala bavê min û te re maleke mêşinî ne
De bala xwe bide Bişarê Çeto
Bi zabitan û qumandanan re li palê qesrê rûniştîne
Le çawa tan li ser tanê îro li kekê te dixîne
Li ser Kozika Kolanê li ser Emê Gozê de dayê hicûmçî ne
Le ji îro pê ve golikê gundan jî kekê te nahewinê,
xwehê rebenê hahîhîîîî

De heyla lê dayê, hey la lê dayê, hey la lê dayê
Lê dayê lê dayê lê dayê lê dayê
Sîsilê bi sê denga li palê qesrê dikir gazî
Dibê: Emîne de lê lê lê dayê
Bi qîr û qetrana Helebê, bi zaca Misêrbînê, bi teniya Besrayê
Şareka reşa Hamûdê li dora serê xwe û te pêçaye
Tu bala xwe bide bi Qaymeqamê Zoqê ve
Bi Qeymeqamê Kopê ve
Bi Qaymeqamê Elmedîna ve
Le Bişarê Çeto bi heft bavê Pencînaran ve
Bi çend kesê Çerkez û Bêzarê Deşta Mûşê ve
Bi Şêx Silê Şêxê Geliyê Zîlan ve
Bi Rema jorî ve bi Rema jêrîn ve
Bi Simê Ozman pismamê xayîn ve
ji siba Xwedê ve bi ser qesra kekê min rebenê lawo
ji xwe re hicûmçî ne

Le Gozê bi sê denga dikir gazî: Emo lo lawo de lêxe
Bila tirsa te tunebe ji eskerê dewletê kurê xelkê ye
Gava terqîn bikeve tivingê,
Xwîn bikeve erdê bira li bira nabe xweyi ye
Le bila tirsa we tunebe ji eskerê Eliyê Ûnis kewê çiyê ye
Le weka kewê ji xwe re bikeve deştê ye
Le bila tirsa we tunebe ji Emînê Ehmed lawê Perîxanê
Tê lihêf û dewşeka nazbalgîva talana ji xwe re dibe direvîne
Le bila tirsa we tunebe ji her sê zarê Çeto ye,
Yek jê Cemîl e, yek jê Bişar e, yek jê Gênco ye


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Bila tirsa we tunebe ji Mihemedê Derwêş bavê şemsedîn,
Kekê Meysê ye,
Hefadı3 û xweşmêr e kuştiyê di ber xelkê de

Emê Gozê bi sê denga dikir gazî:
Gozê lê dayê
Le tirsa min tunene ji eskerê dewletê kurê xelkê ye
Le tirsa min tunene ji eskerê Eliyê Ûnis kewê çiyê ye
Le tirsa min tune ji Emînê Ehmed lawê Perîxanê,
Tê terş û talana ji xwe re direvîne,
Le tirsa min tunene ji eskerê Bişarê Çeto babê Şebo
Le tirsa min heye ji wê tirsê Simê Ozman malikşewitî,
Pismamê xayîn e îro bi kozik û deverê me dizane

Elê hey la lê dayê
Bi hela hela nav tê danê, berê xulama dişeyine Hedîsê Zêwikê
Li ser Kozika Kolanê, berê sûstema danê kozika kolanê
Davên bi hev re tilî danê
Le heyfa min tê li wê heyfê,
Cinazê Emê Gozê, Hesenê Şêxo, Mihê Emer
Îro mane li Hedîsê Zêwikê dayê ji xwe re li Kozikê Kolanê
Hahîhîîî

Ji devê Xalê Birê (Birahîmê Newrozî)

Lê lê lê wayê lê lê wayê wey lê lê wayê
Meresê got: Sîsilê xwehê dilê min ma li ser Çepera Bacorê
Li ser qal û dewayê
Bişar dikire gazî: Emo lo lawo tu ji min re were rayê
Serê Şebabê xwe kim tu ji min re neyê rayê
Sibê van çaxa ezê odeka Baxemsê bikim kadîna kayê

Emo digo: Bişaro lo lawo min sond xwariye
Bi her sê navê qesemê li ser dinyayê
Ez bi kesî re nayême rayê îro sê roj e
Mine piyê xwe li qeydê da destê xwe di kelepçê da
Eger tu pirsiyara kilîta qeydê ji min dikî

Li odeka Baxemsê lawo wê di pencerê da

Şemsê Xanima jina Emo meşiya li ser kozikê
Digot: De hêde ribado de hêde
Min çend car gote di şerê Babê Şebo giran e
Bi te çênabe tu yê bi serê xwe mekî mudef'a belê re
Emo xeyîdî ling û milê xwe bi qeydê xist
Kilîda qeydê şande oda Şemsê Xanimê
nîv metro erd kola xiste binê erdê re

Goza diya wî jê re mêr e meşiya bi ser kozikê
Got: de lê re ribado de lê re
Dayîk bi qurbana çavê te yê belek e tû lê re
Tê şerekî ji me re bikemînî li ser Kozika Kolanê
Ku nav û dengê te ji me re bimîne ji dinê re

Diwazdeh pismamê Emo hebûn şeş ew bûn
Di şop û rêça wî de bûn
Heyfa min li girtin û kuştina egîdan û xweşmêran nayê
Li wê heyfê tê
Derbeka li Emê Gozikê dane simbilê sor ê sosinî
Xiriyane li ser lêvê de lawo
Hahîîî...

Ax de lê lê lê wayê lê lê lê wayê
Meresê digo. Sîsilê lê xwehê min dî mîla şibekê li mîlê da
Eskerê Bişaro Çeto, bi çar babê remî û Pencînariyan
Eliyê Ûnis Qewmê Çiyê ve
Elmedîna Midûrê Zoqê ve bi Çaçan û Çerkezê
Li beriyê siwariyan Belîsê ve bi qumandar û bi kûmsorên tirkan ve
Top ser topê kozik û meteresên mala bavê min û te girêda
Lê heyfa min çi nayê heyfa min li wê heyfê tê
Her çar egîtê mala bavê min û te rebenê
Mane çepa Eba Jorê Kaniya Sîmo
Kevirê Bûka xwehê rebenê di qeydê de

Min dî Goza diya Emo meşiya bi ser kozikê de

Got: De lêde ribado de lêde
Dayîk bi qurbana çavê te yê belek de tu lêde
Tê şerekî ji me re bikî mîna eshabê dewra berê
Heta em sax bin nav û dengê te ji min re bimîne dinê re
Diwazdeh pismamê emo hebûn şeş ew bûn
Di şopa rê de şeşê din kuştin bi ser cinazê Emê de
Heyfa min ji girtin û kuştina Egîdan û xweşmêran nayê
Li wê heyfê tê derbeka li Emê Gozikê dane
Simbêla sorê sosinî xiriyane bi ser lêvê de lawo
Hahîhîîî

Di dawiya wî şerî de ligel bi dehan kuştina leşkerên Roma Reş, Emê Gozê, Hesenê Şêxo, Mihê Emer ko piyên xwe bi qeydan û zincîran girêdabûn û Mihemêdê Derwêş mamê Mihemedê Ozman, têne kuştin.

## Ferhengoka zargotinê

1. Nijdevan: Şerker û şevger.
2. Siwarçak: Siwarê çê û jêhatî.
3. Elikan: Li Xerzan eşîreke mezin e. Ji bavên wekî; Remo, Dîbo, Sîno, Cindikan, Mala Ezê û hwd. pêk tên.
4. Pencînaran: Ev jî Eşîreke mezin li Herêma Xerzan e. Ji heft bavên wekî; Miradan, Musîkan, Weliyan, Ferxikan, Terxanan, Kejikan û Mala Şemdîn pêk tên.
5. Zoqê: Ev der jî îro gundekî Misircê (Kurtalan) ye. Bi tirkî, navê Yanarsu lê kirine. 60-70 sal berê dema Misirca îro tunebû, Zoq qeza ango navçe bû. Qeymeqamî û leşkerî li wir hebû. Ji ber ko Trêna Heyderpaşayê wekî rawestgeha dawîn hate Misirceyê, Misirce ango navçeya nû jî li ber îstasyona trênê hate avakirin.
6. Elmedîna: 50- 60 sal berê nehiye bû; qereqol û qeymeqamtî tê de hebû Elmedîn navê Elihê (Batman) yê din e.
7. Kopê: Navçeya Bûlanixê ya bi ser Mûşê. Çerkez û Bêzarê ko di kilamê de navên wan derbas dibe, ji Kopê ne.
8. Kolanê: Di navbera gundê Zêwikê û gundê Baxemsê de ye.
9. Zêwik: Gundekî Qûbînê ya Batmanê ye ko wekî gundê eşîra Elikan tê naskirin.
10. Baxêmsê: Gundê Elikan ko wekî paytext û wargeha eşîra Elikan tê binavkirin.
11. Sûstem: Cureyekî tivingê ye ko pênc fîşekan diavêje.
12. Bêşatêş: Cureyekî tivingê ko jê re »Bêşlî« jî tê gotin.
13. Hefad: Mêrxas

## 4. Fatihê heft gajaran û fermandara artêşa jinan: Gênc Xelîl û Edûlê

»... Di sala 1930-an de, êdî Kawîs Axa li ser daxwaza gelek kesan xwe digihîne Bexdayê. Li wê derê, çend kompaniyên (stûdyo-tomargeh) biyanî hebûn, ko stranên Kurdî, Erebî, Ermenî û hwd. tomar dikirin. Wekî kompaniyên Bizanfûn, Nayef, Neîm û hwd. Kawîs Axa serî li Kompaniya Neîm dide, lê berpirsiyarên kompanyayê ji wî re dibêjin: »Tu lal î!« Kawîs bi dilekî şikestî ji kompanyayê derdikeve, diçe çayxaneya Kurdan ko li nêzîkî wê derê bûye. Ji ber xerîbiyê destê xwe diavêje binê guhê xwe û lawika »Gênc Xelîl« bi dengekî bilind dixwîne. Yên li wê derê tev li dora wî kom dibin û bi dil û can li wî guhdarî dikin. Dengê wî digihê guhê berpirsiyarê kompanyayê. Berpirsiyar bi lez û bez tê cem Kawîs Axa û jê re dibêje: »Li me bibûre, em ji te ricayê dikin, ko tu yê careke din bi me re werî kompanyayê.« Li wê derê, berpirsiyarên kompanyayê peymanekê pê re girêdidin û yekem strana wî »Gênc Xelîl« li ser qewanan tê tomarkirin...«

Belê, wisa dibêje Kakşar C. Oremar, li nivîseke xwe ya ko di Kovara Hunerê de hatibû weşandin. Armanca min bi vê destpêka ko we xwend ew bû, ko beriya serpêhatî, qewimîn û kilama »Gênc Xelîl û Edûlê« balê bikişînim ser »Bilbilê Çiya û Zozanan, Kawîs Axa«yê ko yekem car bi vê kilamê nav daye û kiriye ko ev kilama çêjdar li seranserê welêt, li Rohilatê Navîn û li Qefqasyayê ko her qul û qewêra ko Kurd lê hebûna bê gotin û lê bê guhdarîkirin.

Xwendevanên hêja, ji ber ko me bi »Gênc Xelîl«a Kawîs Axa dest bi vê nivîsa xwe kir, naxwe kerem bikin werin em pêşî bala xwe bidinê ka Kawîs Axayê dengzêrîn bi sozên çawa ev kilam gotiye, ko pîlaqçêkerên Bexdayê li pey xwe gerandiye. Pişt re jî em dêhn û bala xwe bidine serpêhatî, qewimîn û kilama »fatihê heft bajaran«, Gênc Xelîl û keçmama wî Edûlê:


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

(Ji awaza Kawîs Axa)

... De lê lê de lê lê were lê were lê...
Ev ser dibê yar e, ji Xwedê dilê min gelekî ewan e
Ev ser dibê yar e, ji Xwedê dilê min gelekî ewan e
Gênc Xelîl kurmamê min li welatê xerîban e
Xurbetî gelekî nexweş e, wezê rabim bi nivîna raxim
Qet qetê ez berê xwe bidime pal e
Ez ê rabim, kemerê li pişta xwe bişkînim bawer be
Gênc Xelîl bikim malê bazênê xwe bişkînim bikem
Hûrdebizmar e, biskê xwe bibirrim bikime ser resma
Toq û bikim ser hefsar e, Gênc Xelîl bînim sîwar bikim
Li kêmêtekî tal e
Belê bila dilşa bi ji esmeliya de bête xarê meke kurmamê
Min meke belê nebêjin sîwarê vê kurê çendê bê kar û bar e
Nemayê nemayê nemayê...
De başo Gênc Xelîl kurmamê xwe nebînim dilo li dinyayê

De lê lê were lê lê were lê lê...
Gênc Xelîl Axa çavê xwe bilind kir û bi xerîbî digiriya
Nefes nefes qelûnê xwe
Ev ser dibê yar e, bi Xwedê rabim qelûnekê bo kurmamê xwe
Têkim qelûnek têxim şanê baskê Stenbolê modinek bikare mal e
Belê rexnê darê dar belûdînê bi mişarê birî
Bi mebret peritandî
Binim ser qelûna Gênc Xelîl kurmamê xwe danîm
Nemayê nemayê...
Belê dibê'n kurmamê min heft sal e
Ketiye ser destûrê Romiyan bi
Bû li me qelûn ji te re
Nemayê nemayê...
Derbas bû Gênc Xelîl kurmamê xwe nebînim li dinyayê
Biraziyê Paşayê Diyarbekirê:
Gênc Xelîl

Gênc Xelîl biraziyê Paşayê Diyarbekirê bû, li Diyarbekirê dima. Di dem û dewranekê de, Dewleta Osmanî niyet dike bi derdora xwe re bikeve

herbê. Padişahê dewletê êvarekê di xewna xwe de dibîne, ko fetha heft bajaran li ser milê xortekî çê dibe, ko navê wî xortî Gênc Xelîl e. Padişah serê sibehê radibe, gazî wezîr û şêwirmendên xwe dike, dibêje: »Hal û meselê xewna min ev e, de ka şiroveya xewna min bikin! Min di xewna xwe de dîtiye bi navê Gênc Xelîlê Diyarbekirî, di nava leşkerê min de ye û fetha heft bajaran li ser milê wî ye.«

Yek ji wezîrên padişêh berê xwe da padişêh û jê re got:

— Belê ezbenî! Bi navê Gênc Xelîl xortek heye ko li Diyarbekir rûdinê.

Padişah radibe wezîrê xwe dişîne Diyarbekirê. Dibêjin, »Mirov bi pirsê diçe Qudsê.« Wezîr pirs kir, pirsiyar kir, mala Gênc Xelîl dît. Da derê malê. Pîreke extiyar li devê dêrî paqijiya derdorê dikir. Wezîr silav lê kir û got:

— Pîrê! Ev der mala Gênc Xelîl e?

— Belê kurê min. Kerem bike derbasî malê bibe, ez gazî wî bikim.

Pîrê gazî Gênc Xelîl dike. Gênc Xelîl tê. Wezîr çav bi terfiyê wî dikeve, wî nas dike.

Gênc Xelîl hal û wextê wezîr dike. Pirsiyariya hatina Wezîrê dewletê dike:

— Ser çavan, ser seran hatî wezîrê min, te xêr e?

— Wele dewlet tedarika herbê dike, dikeve herbê. Di xewna xwe de, ditiye fetha heft bajaran li ser milê te dibe. Mezinê dewletê ez şandime pey te.

Gênc Xelîl ji wezîr re dibêje, wezîr lê vedigerîne:

— Tu ne wezîrê dewletê yî?

— Belê!

— Îro gelek tiştên dewletê ne di destê te de ne?

— Belê, di destê min de ne...

Gênc Xelîl didomîne:

— Naxwe, karekî min ketiye cem te. Heger tu pêk bînî, ezê bi te re werim ji bo herbê. Na heger tu daxwaza min pêk neyînî, wele serê min ji dewletê naêşe, ez nayêm.

Wezîr:

— Kerem bike, bêje!

Gênc Xelîl:

— Apê min paşayê vî bajarî ye. Qîzeke wê heye, navê wê Edûlê ye, dilê min li ser Edûlê heye, yê Edûlê jî li ser min heye. Lê, apê min qîza xwe nade min. Heger tu qîzapa min ji min re bixwazî, ezê bi te re werim û di



E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

artêşa dewletê de şer bikim.

Wezîr dibêje:

— Baş e Gênc Xelîl. Emê herin, barê xwe qam bikin!

Dibe êvar. Gênc Xelîl û wezîr didin dûv hev. Diçin dîwana Paşayê Diyarbekirê. Dibêjin, gava paşa çav bi wezîrê dewletê dikeve, tirseke giran lê peyda dibe. Difikire ko hebe-nebe şaşiyeke wî çê bûye, ko dewletê wezîrê xwe şandiye Diyarbekirê. Berê xwe dide wezîr, dibêje:

— Ya wezîr, tu ser çavê min hatî. Gelo xetayê min, gunehê min çi ye gelo, dewletê te ret kiriye tu hatî heta vê derê? Te ne xeberê da me. Me ne merasîmek ji bo xatirê te çê kir...

Wezîr hal û mesele ji paşa re dibêje, ko ew hatiye pey Gênc Xelîl û Gênc Xelîl jî, ev rê daye pêşiya wî, lew re jî ew hatiye cem wî ko qîza wî Edûlê ji Gênc Xelîl re bixwaze.

Yekser tirs û sawa ko li Paşayê Diyarbekirê peyda bûbû bi van gotinan ji ser wî radibe. Dibêje: »Ehlen we sehlen! Qîza min Edûlê û ne tiştekî din, bi qurbana Gênc Xelîl bibe.«

Paşa wê şevê radibe qîza xwe Edûlê bi xêlî dike, cilên wê yên xweşik lê dike. Gazî melayekî û du heb feqiyan dike. Bi qewl û Resûlê Xwedê Edûlê li Gênc Xelîl mahr dike. Dikeve pêşiya wan û tevî wezîr ew dibe mala Gênc Xelîl. Welhasil, dibe serê sibehê, Gênc Xelîl berê xwe dide wezîr û dibêje:

— Ezbenî! Tu rewşa min dibînî. Tu yê sê rojan ji min re misade bikî, ez ê tevdîra mala xwe bidime dîtin, pişt re emê herin...

Sê rojên wan diqede, Gênc Xelîl xatirê xwe ji pîra diya xwe û ji dotmama xwe Edûlê, ko jina wî ya sê rojan e, dixwaze û bi wezîr re berê xwe dide herbê. Di herbê de dibe serfermandarê leşkerê dewletê.

Di dawiya herbê de, heft bajaran fetih dikin. Herb betal dibe, her kes, çi leşker çi fermandar, berê xwe didin malên xwe. Di vê navberê de, êşeke giran li canê Gênc Xelîl peyda dibe. Li memleketê Şamê de dimîne, nikare dagere memleketê xwe. Dewletê jî, ji ber ko heft bajar fetih kiriye, terfiyek, ango nîşanek li milê wî daye.

Maweyeke dirêj derbas dibe herb qediyaye. Her kes dageriyaye malên xwe nava zarokên xwe, yan jî dadigerin. Rojekê çend qîz û pîrek diçin cem Edûlê, jê re pirsiyara nehatina Gênc Xelîl dikin. Edûlê jî ketiye nava derd û xeman. Dêhn û bala xwe didê, ko ji serê neqebê çend seferçî ko ji herbê dadigerin ber bi wan ve tên. Ji hevalên dora xwe re, ji wan qîz û jinên ko pirsiyara Gênc Xelîl dikin re dibêje: »Ka ez ji van seferçiyan

bipirsim gelo rewşa Gênc Xelîl çi ye?«

Belê, Edûlê diçe pêşiya seferçiyan û bi awayê kilamî ji wan re dibêje:

Seferçî ne dibêjin Edûlê korî nemayê li dinyayê
Ka bêje kuramê te bi çi terzî ye
Dibê: Kuramê min siwarê hespê boz î deqdeqî ye,
Qamçiyekî zîvîn e li destê wî ye
Fetha heft bajaran li ser milê wî ye
Seferçî ne dibêjin Edûlê korî nemayê li dinyayê
Betara çavê te rijiyayê, ew zilamê tu dibêjî
Heft bajaran fetih kiriye, dewletê nîşanekî li milê wî xistiye
Êşekî li can û bedenê wî peyda bûye
Maye li Hekê li Hekayê li Beytê li Beytûlahê
Qonaxa bîst û çar saetan li binê Şama Şerîf
ji wirvetir ve maye

Edûlê vedigere cem diya xwe. Ji diya xwe re weha dibêje:

Lê lê dayê rebenê
Minî xewnekî li xewa xwe diye
Dibê lawo bila xewna te yê xêr be
De xewna xwe ji dayika xwe re bêje
Dayika te ji te re tabîra xewnê bixîne

Dibê, dayê min dît hinek xan û manê spî bûn
Min dît du tayê spîndaran di hewşê de çikandibûn
Kanîkeka zelal a cemidî li binê van darê hanekê bûn
Du teyrê bazî li serê van darê hanekê bûn
Du marê reşî li darê lefandî bûn

Dayika Edûlê dibê, lawo bila xewna te yî xêr be
Xan û manê spî xan û manê mala bavê te bûn
Ew her du tayê spîndaran di hewşê de
Bejna te û kuramê te Gênc Xelîl bûn
Kanîkeka zelal a cemîdî li binê darê stêrên çavên te bûn
Ew her du teyrê bazî li serê darê
Qelbê te û kurapê te Gênc Xelîl bûn

Her du marê reşî li darê lefandî
Baqê keziyê te bi xwe bûn

Edûlê dikeve nava bajarê Diyarbekirê, çil qîzên di temenê de xwe berhev dike. Her yekê hespekî reş, rimeke reş û şûrekî reş ji wan re peyda dike. Edûlê dibe serfermandar û serkarê wan û terkeserê dinyayê dibin. Bajar bi bajar, qonax bi qonax diçin. Daxilî bajarê Şamê dibin. Di keviya bajêr de, Edûlê ferman dide leşkerên xwe. Konên xwe li wê derê vedidin. Dotira rojê Edûlê bi dizgîna hespê xwe digere û tax bi tax, kûçe bi kûçe li nava bajarê Şamê digere. Dem ber bi mexrebê ye. Zilamek li ber derê mala xwe çong daye, destmêj digire.

Edûlê, ko cil û bergên mêranî li xwe kiriye, silav li zilêm dike, zilam dibêje »eleykûmselam«.

Edûlê dibê:

— Apo tu mêvanan nahewînî?

— Lawo mêvan mêvanên Xwedê ne. Ser seran, ser çavan. Lê, wele ez newêrim te bihewînim!..

— Çima xêr e?

— Nexweşek di mala min de ye. Êşa wî pîs û giran e. Tu jî xortekî heyf î. Ez bala xwe didime te, tu zehf dişibî wî nexweşî. Şiklê we yek e. Êşa wî pîs e, ditirsim li te jî peyda bibe.

Edûlê li kalê extiyar vedigerîne:

— Apo, heger tu min bihewînî, êş li ba Xwedê zehf in. Ez li mala xwe bim jî, Xwedê Teala dikare wê êşê bide.

— De kerem bike peya bibe!

Edûlê ji hespê xwe peya dibe. Derbasî malê dibe. Rast e, destek cilê zilaman li xwe kiriye, bala xwe didê, ko Gênc Xelîl nexweş e, xayîs e, haya wî ji bayê felekê tuneye. Li ber serê wî rûdinê. Edûlê wî nas dike, lê Gênc Xelîl Edûlê nas nake. Bi hev re mijûl dibin:

— Pismam tu çawa yî?

— Tu sax bî, Xwedê ji te razî be. Tu ser çavan re hatî. Tu xelqê kû derê yî?

Edûlê zehf nêzîk nabêje, ko wî nas neke, dibêje:

— Ez xelqê Sêrtê me.

— Ehlen we sehlen pismam. Tu ser çavan, ser seran re hatî. Bêhna memleket ji te tê. Bêhna min bi te derket. Gelo li memleketê me çi heye, çi tuneye?

Pirs û pirsiyarên hev dikin. Gênc Xelîl ji Edûlê re dibêje:

— Tu nizanî serpêhatiyek, kilamek ji kilamên memleket ko tu ji min re bibêjî. Êşa min li min pir bûye, dibe ko bi çend gotinên te ez pariyekî xwe ji bîr bikim.

— Belê, kerem bike guhdarî bike, ezê ji te re kilamekê bibêjim.

Di vê derê de Edûlê li ser serê Gênc Xelîl disekine û mijûlahiyên ko wî bi seferçiyan kiribû û seferçiyan jî behsa êşa Gênc Xelîl jê re kiribûn dixwaze bi awayê kilamî bibêje, lê naxwaze di nava kilamê de behsa êşa Gênc Xelîl bike, ko Gênc Xelîl bi vê yekê xemgîn nebe.

De werin em guhê xwe bidine Edûlê, ka li ser Gênc Xelîl, li ber serê wî çi gotiye:

De werî lê lê werî lê lê werî lê lê nemayê
Edûlê dibê, seferçîno we kuramê min
 Gênc Xelîl nediye
Seferçî ne dibê'n, Edûlê korî nemayê li dinyayê
Ka bêje kuramê te bi çi terzî ye
Dibê: Kuramê min siwarê hespê boz î deqdeqî ye
Qamçiyekî zîvîn e di destê wî ye
Fetha heft bajaran li ser milê wî ye
Seferçî ne dibê'n, Edûlê korî nemayê li dinyayê
Betara çavê te rijiyayê, ew zilamê tu dibêjî
Heft bajaran fetih kiriye, dewletê nîşanekî
 li milê wî xistiye
Maye li Hekê li Hekayê li Beytê li Beytûllayê
Qonaxa bîst û çar saetan li binya Şama Şerîf
 wirdetir ve maye
Xwe daye li ser piyê dikanê dileyîze
Bi kaxizê bi îskambîlê ji xwe re dikişîne
 kaxizê ve oyinê
Maye ji bona bazinê destê domamê

Dema ko Edûlê wisa dibêje, Gênc Xelîl kesereke kûr dikişîne. Dibêje:

— Xwedê ji te razî, kê ev kilam ji te re gotiye?

— Nizanim kê gotiye. Ez ne dengbêj im, lê tiştê ko ez dizanim ji serê sibehê heta êvarê şivan û gavanên memleketê me vê kilamê dibêjin.

Gênc Xelîl dibêje:


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

— Pismam, Xwedê ji te razî be. Ez yê mirinê me. Ez ê bimirim. Ez ê vê nîşana xwe bidime te, heta kurê te jî sax be, wê ev nîşan te xweyî bike. Tu kilameke wekî vê kilamê ji min re bibêje...

Edûlê dibêje:

— Xwedê silametiya xêrê ji te re bişîne. Nîşana te jî, ji te re pîroz be. De ka guhê xwe bide min, dewama vê kilamê heye, ez ê ji te re bibêjim.

Edûlê destê xwe dibe ber guhê xwe û kilama ko dema xewn dibîne û diya wê jî şiroveya xewna wê jê re dike dibêje.

Dema ko vê kilamê jê re dibêje, serê Gênc Xelîl li ser balgîv dikeve, dilê wî jê diêşe, bê hiş dikeve. Edûlê li xwe dixe, digirî. Dibêje:

— Hew qas rê, cih û memleket ez hatim. Ez negihîştimê min xwe pê neda naskirin.

Edûlê li wê derê digirî û vê kilamê diavêje serî:

Were lê lê were lê lê were lê lê
Edûlê dibê, Gênc Xelîlo heyrana te me li dinyayê
 de rabe
Heval û hogirên me çûne malê
Rêwiyên me temamî çûne malê
Gênc Xelîlê kurapê min tenê
Xwe daye li ser piyê dikanê
Dileyîze bi kaxiz û bi îskambilê
Dikişîne kaxizê vê oyinê
Maye ji bona bazinê destê domamê
De rabe serê Gênc Xelîlê min
Serê qendan û bendan
Ez ê rabim serê kelek û dor hevsarê ciwanikê
Evdalê dilê xwe bigirim bigerînim
Li sûk û li çarçî û li mehelan
Ez îro bavêjime ser sûka nalbendan

Were lê lê were lê lê were lê lê
Edûlê dibê, Gênc Xelîlo qurbana te me
 li dinyayê de rabe
Heval û hogirên me çûne malê
Rêwiyên me temamî çûne malê

Gênc Xelîl kuramê min tenê
Xwe daye li ser piyê dikanê
Dileyîze bi kaxizê ve oyinê
Maye ji bona gaja gustîla domamê
Edûlê dibê Genc Xelîlo heyrana te me li dinyayê
Serê Gênc Xelîlê min
Serê qendan û bendan
Ez ê rabim serê kelek û dor hevsarê ciwanikê
Evdalê dilê xwe bigirim, bigerînim
Li sûk û li çarçî û li mehelan
Ez ê îro bavêjime li ser sûka zîvkeran

Edûlê dêhna xwe dide Gênc Xelîl, ko feyde nake, radibe destmêj digire, du rikat sunet dike. Destê xwe ji Xwedê re vedike. Zarezar bi Xwedê ve dike. Di wê qasê de, Gênc Xelîl çavê xwe vedike, hişê wî tê serê wî. Edûlê xwe pê dide naskirin. Dibê:

— Rabe ev der ne cihê me ye.

Edûlê tevî Gênc Xelîl radibe, tê cem leşkerên Edûlê, Edûlê dey li leşker dike. Gênc Xelîl bi rewşa ko dibîne xemgîn dibe. Dibêje:

— Edûlê, tu pîrek î, di nav hew qas leşkerî de çi karê te heye?

Edûlê dibêje:

— Temamê wan qîz in, wekî min in!

Qonax bi qonax dimeşin, ber bi memleketê xwe Diyarbekirê ve tên. Nêzîkî Diyarbekirê, li ber Çemê Şêxaniyê li gorî nexweşî û daxwaza Gênc Xelîl kon vedidin, ko bibe serê sibehê, qonaxa ko maye jî biqedînin û herin Diyarbekirê.

Edûlê û Gênc Xelîl dikevin çadira xwe. Hukmê nîvê şevê ye, Edûlê destê xwe di ser sîngê Gênc Xelîl re dibe, ko Gênc Xelîl xwêdaneke sar daye.

Belê, serê hazir û xwendevan û guhdaran xweş be, Genc Xelîl li wê derê teslîmî Xwedê dibe, ango diçe ber rehma Xaliqê Alemîn.

Edûlê li wê derê bi awayekî dilşewat kilamekê diavêje ser Gênc Xelîl.

Were lê lê were lê lê were lê lê
Edûlê dibê, Gênc Xelîlo heyrana te me li dinyayê
Ez ê bi Çemê Şêxaniyê diketim
wa bi dar e


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Şeveka ji hikmê nîvê şevan û pê de
Destê xwe li ser singê Gênc Xelîl
kurapê xwe digerînim
Lawo xweydaneka germ e yeka sar e
Edûlê dibê, Gênc Xelîlo
Heyrana te me li dinyayê
Çiya hemî dibêjin em çiya ne
Golikê nava garanê digerin
li çol û beyaran
Diçin ba cotyaran
Dibê'n, cotyarino van ga berdin
Me girêbidin
Em jî ga ne
Ji îro pê de çi qas sûtalekî
ji mala xwe rabe
Wê şal û şapikekî li xwe bike
Were di dîwana mala bavê min de rûnê
Wê bêje Edûlê korî nemayê
Em jî wekî kurapê te Gênc Xelîl axa ne

Belê, Edûlê piştî vê kilamê şûr dikişîne, xwe bi ser şûr de diavêje û dibêje: »Piştî kuramê xwe Gênc Xelîl ez jî nemînim li dinyayê!« û xwe dikuje. Cinazeyê Edûlê û Gênc Xelîl çardar dikin û çardarê wan dibin Diyarbekirê û binax dikin.

***

Werin vê gavê jî bêyî hîkayet û şiroveya wê, ji serî heta binî em guhên xwe bidine kilama ko bi du meqamî tê gotin:

Dema ko Edûlê diçe pêşiya seferçiyan:

De wera lê wera lê wera lê wera lê wera lê wera lê
Wera lê wera lê wera lê wera lê wera lê wera lê
Wera lê Edûlê nemayê
Lebelê Edûlê xwe berdaye pêşiya seferçiyan
Dibêje, lo lo seferçîno
Xwedê sefera we yê karê Îslamê qebûl bike
Hûn ê ji wê sefera dînê Îslamê dageriyan

Belê weyê kuramê min ê ezîz nedîtiye nemaê nemaê nemaê
Ez ê piştî Gênc Xelîl kuramê xwe nemînim
Dilo li dinyayê...

Belê, seferçî ne dibê'n: Edûlê korî nemaê li dinyayê
Ka bêje kuramê te bi çi terzî ye
Dibê, kuramê min siwarê ciwanîkekî çar salî
Çal î beş ê deqandî ye
Qamçiyekî zîvînî di destê de ye
Fetha heft bajaran li ser milê wî ye...

Seferçî ne dibê'n:
Edûlê korî nemaê li dinyayê
Ew zilamê tu dibêjî heft bajaran fetih kiriye
Dewletê nîşanekî li milê wî daye
Wele êşekî li canê û bedenê wî peyda bûye
Maye li Hekê li Hekayê li Beytê li Beytûllayê
Qonaxa bîst û çar saetan li binya Şama Şerîf
wirdetir ve mayê
Îro xwe daye li ser piyê vê dikanê
Maye ji bona bazinê destê domamê nemaê nemaê nemaê
Ez ê piştî Gênc Xelîl kuramê xwe nemînim
Dilo li dinyayê...

Belê Edûlê dibê, Gênc Xelîlo heyrana te me dilê min liyan e
Edûlê dibê, Gênc Xelîlo heyrana te me dilê min liyan e
Îro cewabeka nexêr hatiye dibê:
Pismamê te li welatê xerîb nexweş e
Nexweşekî wayê gelo dîsa pir bê hal e
Li welatê xerîb kesekî xûdanê xêra tunene
Xwe jê re bike balîv û berpal e
Ez ê rabim vê sibê zêrê serê xwe biqetînim
Ji ciwanîkê dilê xwe re bikim cotek nal e
Ez ê xizêma pozê xwe derxim
Ji ciwanîkê delalê dilê xwe re bikim gelo
hûrbizmar e
Ez ê serkezîkê xwe evdalê biqûsînim


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Ji ciwanîkê ji delalê dilê xwe re bikim
ser kelek û dor hevsar e
Maye li welatê xerîb bila xelqê nebêje:
Gelo çi siwarekî Kurd ê çendî bê kar û bar e
Nemaê nemaê nemaê nemaê nemaê
Ez ê piştî Gênc Xelîl kuramê xwe nemînim
dilo li dinyayê...
Diyaloga Edûlê û dayîka wê ya li ser
xewna ko dîtiye û şiroveya wê:

Belê dibê Edûlê qesta ba dayîka xwe dike, dibê:
Lê lê dayê rebenê
Min xewekî li xewa xwe de diye
Dibê: Lawo bêje bila xewa te yî xêr be
Dibê: Lê lê dayê rebenê min diye
Xan û banê tev spî bûn
Min dî du tayên spîndaran
Di hewşê de çikandî bûn
Wele kanîkeka zelal a cemidî
Li binê wan darên hanekê bûn
Du marên reşî li darê lefandî bûn
Du teyrê baz li serê wan darên hanekê bûn

Dibê: Lawo bila xewna teyî xêr be
Wele xan û banê spî
Xan û banê mala bavê te bûn
Her du tayê spîndaran di hewşê de
Bejna te û kuramê te Gênc Xelîl bûn
Le kanîka zelal a cemidî li binê darê
Stêrên çavê te bûn
Ew her du marên reş ê li darê lefandî
Baqê keziyê te bi xwe bûn
Belê ew her du teyrê bazî li serê darê
Le qelbê te û kuramê te Gênc Xelîl bûn
Nemaê nemaê nemaê nemaê nemaê
Ez ê piştî Gênc Xelîl kuramê xwe nemînim
dilo li dinyayê

Ev kilama jêrîn ew kilam e, ko dema Edûlê li Şamê, li ser Gênc Xelîlê ko nexweş û xayîs gotiye. Dema ko Edûlê çûbû pêşiya seferçiyên ko ji herbê dageriyabûn jî, ev kilam gotibû. Lê, vê carê behsa nexweşiya li Gênc Xelîl peydabûyî nake, da ko pê xemgîn nebe û bi halê xwe neêşe. Ji ber ko Edûlê bi cil û bergên mêraniyê ye, Gênc Xelîl wê nas nake. Ji Gênc Xelîl kirî ko Edûlê xortekî dengbêj e:

De werî lê lê werî lê lê werî lê lê werî lê lê werî lê lê
Werî lê lê werî lê lê werî lê lê werî lê lê werî lê lê nemaê
Belê Edûlê xwe berdaye pêşiya seferçiyan
Dibêje, lo lo seferçîno
Xwedê sefera we yê karê Îslamê qebûl bike
Hûnê ji wê sefera dînê Îslamê dageriyan
Weyê kuramê min ê ezîz nedîtiye nemaê nemaê nemaê
Ez ê piştî Gênc Xelîl kuramê xwe nemînim
dilo li dinyayê...

Belê seferçî ne dibê'n:
De lê lê Edûlê korî nemaê li dinyayê
Ka bêje kuramê te bi çi terzî ye
Dibê: Kuramê min siwarê ciwanîkekî çar salî
Çal î beş ê deqandî ye
Qamçiyekî zîvînî di destê de ye
Wele fetha heft bajaran li ser milê wî ye
Nemaê nemaê nemaê nemaê nemaê
Ez ê piştî Gênc Xelîl kuramê xwe nemînim
dilo li dinyayê...

Belê seferçî ne dibê'n:
De lê lê Edûlê korî nemaê li dinyayê
Ew zilamê tu dibêjî heft bajaran fetih kiriye
Dewletê nîşanekî li milê wî daye
Maye li Hekê li Hekayê li Beytê li Beytûllayê
Qonaxa bîst û çar saetan li binya Şama Şerîf
wirdetir ve mayê
Le xwe daye li ser piyê vê dikanê
Maye ji bona bazinê destê domamê nemaê nemaê nemaê


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Ez ê piştî Gênc Xelîl kuramê xwe nemînim
dilo li dinyayê...

Piştî vê kilamê, Gênc Xelîl bi ser hişê xwe ve tê û ji Edûlêya ko di şiklê mêran de ye berdewama vê kilamê dixwaze. Edûlê jî, wekî berdewama vê kilamê qisedana ji bo xewna ko dîtîbû û ji dayîka xwe xwestibû ko şiroveya wê xewnê bike, ko me li jorê dabû, li ber serê Gênc Xelîl dibêje. Hewce nake, ko em careke din vê qisedanê bidin. De ka em binêrin pişt re Edûlê ji delalê dilê xwe re çi gotiye:

De werî lê lê werî lê lê werî lê lê werî lê lê werî lê lê
Werî lê lê werî lê lê werî lê lê werî lê lê werî lê lê nemaê
Edûlê dibê: Gênc Xelîlo heyrana te me li dinyayê
Serê Gênc Xelîlê min serê qendan û bendan
Ez ê rabim ser kelek û dor hevsarê ciwanîkê delalê dilê xwe
Bigirim bigerim li sûk û çarçî û gelo li mehelan
Ez ê îro bavêjim li ser sûka nalbendan
Nemaê nemaê nemaê nemaê nemaê nemaê nemaê
Ez ê piştî Gênc Xelîl kuramê xwe nemînim
dilo li dinyayê...

Belê Edûlê dibê:
Gênc Xelîlo, heyrana te me li dinyayê
De rabe hevalên me çûne malê
Gelo rêwiyên me temamî çûne malê
Gênc Xelîlê kuramê min rebenê
Serê xwe daye li ser piyê vê dikanê
Wele maye ji bona bazinê destê domamê
Nemaê nemaê nemaê nemaê nemaê nemaê nemaê
Ez ê piştî Gênc Xelîl kuramê xwe nemînim
dilo li dinyayê...

Kilama ko dema Gênc Xelîl ji ber nexweşiya xedar, li binê konê ko nêzîkî Diyarbekirê, li mintiqeya Çemê Şêxaniyê vedane dimire ji aliyê Edûlê ve tê gotin. Piştî vê kilamê jixwe Edûlê jî li ser cesedê sar ê Gênc Xelîl xwe diavêje ser şûr û xwe dikuje:

De werî lê lê werî lê lê werî lê lê werî lê lê werî lê lê

Werî lê lê werî lê lê werî lê lê werî lê lê werî lê lê nemaê
Edûlê korî nemayê li dinyayê
Sibe ye ezê bi Çemê Şêxaniyê diketim
Çemeka wa bi dar e
Ez ê şeveka ji hikmê nîvê şevan û pê de
Destê xwe li ser singê
Gênc Xelîl kuramê xwe bigerînim
Gelo wele xweydaneka germ e yeka sar e
Nemaê nemaê nemaê nemaê nemaê nemaê nemaê
Ez ê piştî Gênc Xelîl kuramê xwe nemînim
dilo li dinyayê...

Belê Edûlê korî nemayê dibê:
Çiya hemî dibêjin em çiya ne
Golikê nava garanê digerin li çol û li beyaran
Diçin ba cotyaran dibê'n:
Cotyarîno van gayan berdin
Me girêbidin em jî ga ne
Ji îro pê de çi qas sûtalekî ji mala xwe rabe
Wê şal û şapikekî li xwe bike
Wê were odeka mala bavê min de rûnê û
Bêje: Edûlê em jî weka Gênc Xelîlê
kuramê te axa ne
Nemaê nemaê nemaê nemaê nemaê nemaê nemaê
Ez ê piştî Gênc Xelîl kuramê xwe nemînim
dilo li dinyayê...

## Çavkanî:

*Agahiyên der barê Kawîs Axa de, ji Kovara Hunerê ya ko weşana Akademiya Çand û Hunera Kurdî ya li Elmanyayê. Hejmar 1, nivîsa bi navê Bilbilê Çiya û Zozanên Welêt: Kawîs Axa ya Kakşar C. Oremar.

*Serpêhatî, qewimîn û hîkayeta kilamê, ji devê çend rîspiyên Herêma Xerzan û Botan.

*Kilama qewimînê ya destpêkê ji awaza Kawîs Axa, ko di kaseta Lawikê Meyê de gotiye.

*Kilama dûvedirêj a ko me li dawiya mesele û serpêhatiyê daye, ji devê Dengbêj Salihê Qûbînê hate wergirtin.


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

## 5. Ji birakujiya nava eşîran nimûneyeke sosret: Emînê Perîxanê-Evdilê Birahîm

Yek ji »Derdê bê derman« û malkambaxiya eşîrên welatê me, di dem û dewrana xwe de, birakujiya nav wan bi xwe bûye. Gelek caran êdî wisa bûye ko mêrkujî û qetilxwîniya nav eşîran ji merhaleya kuştinê derketiye û ketiye merhaleya qirkirin û qelandina mêran. Di dîroka me kurdan de, mirov dikare behsa bi sedan qewmînên bi vî rengî bike ko, di her qewmînê de, di neqeba çend saetan de bi dehan zilamên çê û mêrxas hatine kuştin; zarokên wan sêwî, jinên wan bî mane. Gelek xortên wekî »Gêncoyê Çeto« ko hêj bi hineya zavatiyê di destan de bûye, bûne qurbanên karesatên bi vî rengî. Gelek caran êdî wisa bûye ko, mêrkujî cihê xwe ji birakujiyê re terxan kiriye. Lewma jî, me di vê hejmarê de xwest ko mijara nivîsara me, li ser vê yekê be. Ango, me xwest ko vê carê em ji we re, behsa qewmîn û serpêhatiya xiyaneta Emînê Perîxanê, ko bi dewleta roma reş re bûye yek û bûye sebebê kuştina birayê xwe Evdilê Birahîm.

Belê... Wekî ko ji vê agahdariyê jî tê fêhmkirin, Evdile û Ehmed ji heft lawên Perîxanê dudu ne. Dibe ko hûn bibêjin, ma qey Emîn û Evdile ne kurê bavekî ne ko navê yekî ji wan Emînê Ehmed e, navê yê den Evdilê Birahîm e? Rast e; Emîn û Evdile ji aliyê dê ve birayê hev in û her du jî kurê Perîxanê ne. Lê babê wan ne yek e. Navê babê Emîn Ehmed e, lê navê babê Evdile Birahîm e. Lewre jî diyar dibe ko, piştî ko mêrê Perîxanê rehmet kiriye, careke din zewiciye. Her çiqas Emîn û Evdile, carinan bi navê babê xwe têne naskirin jî, ji ber şêrejinî û jêhatîbûna Perîxanê, bi giranî bi navê diya xwe Perîxanê hatine naskirin.

### Mêrxasek û xayînek

Emînê Perîxanê, di nav eşîra xwe Remîyan (Reman)* de, daw û doza mezinahiya eşîrê dikir. Lê li hêla din, ji ber ko Evdile li der û dora xwe zêde dihate naskirin, xelqê zehftir xwe li Evdile digirt. Tim û daîm ji bo wî dihate gotin ko, mirovekî hêja, mêrxas û li dijî zilmê radibû. Ji ber vê

yekê jî, çavên Emîn bar nedikir ko birayê wî jê zehftir bê hezkirin û bi çavê mezinahiyê lê bê nihêrtin. Emîn êdî hew îdare dike û radibe li cem Erkan-î Herba dewletê giliya birayê xwe Evdile dike û tevî birayê xwe, yanzdeh kesî di gundê Barislê* dide kuştin. Ji xwe ji berê de, Emîn bi dewletê re tevdigere û wekî ajanê dewletê kar û xebat dike. Bi dehan car leşker dibe ser gundên Reşkotan* û Sînikan* û dibe şirîkê şewitandin û wêrankirina bi sedan malên herêmê.

## Evdilê Birahîm, Samîr Begê babê Turkeş dikuje

Berî ko em qewmîna vê meseleyê bi awayeke berfireh, ligel kilama wê pêşkêşî dêhn û bala we bikin, em dixwazin behsa serhildana Evdilê Birahîm ango Evdilê Perîxanê ko li dijî Fermandarê Roma Reş Samîr Begê pêk anîbû û Samîr Begê kuştibû, bikin.

Samîr Begê Yuzbaşî, ko tê gotin babê Alparslan TÜrkeş bi xwe bûye, di dîroka serhildanên welêt de, xwedî roleke girîng e. Di gelek serhildanên gelê kurd de, wekî fermandarekî artêşê cih girtiye û li gorî gotinên goyendeyan ko heta îro hatine, bi sedan gundên serhildêrên kurd şewitandiye, mal û milkên wan mîrat kiriye û bûye sebep ko kurd li ser xaka xwe fermalû* bibin û derbasî binxetê û rojhilatê welêt bibin. Her wisa tê gotin ko, di Serhildana Geliyê Zîlan de, zarokên ko hêj di zikê diya xwe de bûne, kuştiye. Di kilameke dengbêjan de tê gotin ko, Samîr Begê wisa gotiye:

»...Ezê bikim ko duwazdeh gundê Geliyê Zîlan
Li hêviya kevneke jin bimîne...«

Ji van rêzikan jî diyar dibe ko Samîr Begê, hewqas zalim bûye ko li ser gelê kurd hewqas kafirstanî kiriye.

Piştî ko ji ser eşîrên Geliyê Zîlan, Samîr Begê berê xwe dide Herêma Xerzan, dorhêla Reman û Reşkotan ko eşîra Mala Perîxanê jî li wê derê ne. Wê çaxê çiqas gundên wê dorhêlê hebûne, ji hêla Samîr Begê ve têne şewitandin û wêrankirin. Her wiha eşîra mala Perîxanê li gel çend eşîrên dorhêlê, ji ber êrîşa Samîr Begê direvin û derbasî binxetê dibin ko niha jî çend malên wan li binxetê binecih in.

Li gorî gotinên çend kesên herêmê ko çend sal berê, min ji wan pirsîbû, dewşek û lihêfên ko gundiyan ji ber şewitandinê parastibûn û di şikeftan de veşartibûn jî, ji aliyê leşkerên Samîr Begê ve hatibûn şewitandin.


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Pişt re Evdile, dayîka xwe Hacî Perîxanê li binxetê dihêle û dadigere Herêma Xerzan, di Şêpê Reman* de -ku geliyeke asê ye- diçe pêşiya leşker û Samîr Begê li wê derê dikuje. Serê wî jê dike, cendekê wî diavêje çem û radije serê Samîr Begê, bi xwe re dibe binxetê, davêje ber diya xwe Perîxanê û jê re dibêje:

»...Ha! Min ji te re serê Samîr Begê,
Ji dêvla lihêf û dewşekên te, diyarî anî...«

Kilama kuştina Samîr Begê ji hêla Evdilê Perîxanê ve, di kilam û gotinên dengbêjên Xerzan û Serhedê de wisa tê gotin:

Axao de şer e
Maqûlo de şer e
Şerê Evdilê Birahîm û Samîr Begê
Dengê tivingê Samîr Begê û Evdilê Birahîm
Ketine Şîpê Reman ji xwe re li hev digere
Evdilê Birahîm bi sê sond xwarî li dinê ye
Dibê: Ezê îro serê Samîr Begê
Jê bikim bi qamê ye
Cinazê wî bavêjim golê ye
Serê wî bidim darê rimê
Derbas bikim binxetê ye
Ezê deynim ber çoka Hacî Perîxanê
Ezê bêjim: Dayê ji te heyfa
Lihêf û dewşekê mantên
Malê şikeftê ye

Kerem bikin vê gavê em dîsa vegerin ser qewmîna xwe ya destpêkê, bê ka çawa Evdilê Perîxanê tê girtin û kuştin û di dawiya vê qewmînê de çi tê serê Emînê Perîxanê ko bûye milîsê dewletê û ji kuştina 11 kesî re bûye sebeb.

Ji xwe me di destpêkê de gotibû ko, ji ber çavnebariyê Emînê Perîxanê, giliya birayê xwe Evdile dike. Ji ber ko Samîr Begê ji hêla Evdilê Perîxanê ve hatiye kuştin, di dosye û qeydên dewletê de navê wî derbas dibe. Lê, ji dewletê kirî, Evdile hê jî li binxetê firar û qaçax e. Di rastiya xwe de, piştî kuştina Samîr Begê bi demekê, ew dîsa ji binxetê vedigerin gundê xwe.

**Serê Evdile jê dikin û dibin Diyarbekirê**

Li ser giliya Emînê Perîxanê, leşkerên Romê bi ser gundê Barislê de digirin û di Qesra Barislê de dest datînin ser Evdile. Beriya ko leşker bikeve hundir, Evdile ji diya xwe Perîxanê dixwaze ko, savarekê çêke û demançeya wî bixe nava savarê. ko ev yek pêk were wê li xwe biqewimîne û birayê xwe Emîn û tevahiya leşkerên pê re bikuje. Esker dikeve hûndir, Evdile teklîfa xwarinekê li wan dike, Hacî Perîxanê savarekê tîne datîne ber wan. Her çiqas, Evdile bi kevçiya xwe savarê teklîhev jî dike, nexêr! mîrata demançê ne tê de ye. Perîxanê, li nava derî sekiniye, lê dinêre, Perîxanê rûyê xwe tirş dike, tiliya xwe nîşan dide û çawa ko bibêje:

»..Lawo tu yekî tenê yî
Ez nikarim gundekî bişewitînim...«

Radibin wê rojê, Evdile bi tevî 12 mêrxasên wî yên tivingê digirin û milê tevan bi hev re girê didin. Ji nav wan 12 kesan, keçikek qesta yekî ji wan dike û zilamekî qepaçe dike. Fermandar dibêje:

»Vê keçikê çima xwe avêt stûyê zilêm?«
Lê dibersivînin:
»Ev keçik, keça vî zilamê ye!«

Ji ber vê yekê, leşker zilam ji nav wan 12 mirovan derdixe û tevî Evdile, 11 kesên pê re dikujin, serê wan jê dikin û bi xwe re dibin Diyarbekirê.

»Kero! Ez şîv im, tu taştê yî!..«

Wextê ko leşker Evdile û mêrxasên wî dikuje û serê wan jê dike, Emînê birayê Evdile jî li kuştina birayê xwe temaşe dikir. Li gorî gotinan Evdile, hewçend mirovekî bedewî, kejî delal bû ko, mirov dil nedikir lê binêre. Di vê neqebê de, ev diyaloga hanê di navbera fermandar û Emînê Perîxanê de derbas dibe:

— Emîn Ev zilam çiyê te ye?
— Birayê min e.
— Emîn, heger min bizanibûya tûyê emrekî (temen) dirêj bikî, minê te vê gavê li vê derê bikuşta! Lê ez dinêrim ko tu zêde emr nakî, ji xwe tu ne hêjayî guleyekî jî...


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Ji xwe beriya ko Evdile bê kuştin, berê xwe dabû Emînê birayê xwe û wisa jê re gotibû:

— Kero! Ez şîv im, tu taştê yî!..

Piştî kuştina Evdileyê kurê xwe, diya wî Perîxanê radibe li ser vê kuştina bi şewat û xiyaneta malmîrati ya kurê xwe yê din Emîn, vê kilamê dibêje ko me ji wersiyonên cihê û ji devê Dengbêjên bi nav û deng Zahiro, Salihê Qûbînê* û Teyîboyê Misircî girtiye, dibêje. Kerem bikin em niha jî dêhn û bala xwe bidin qêrîna Hacî Perîxanê ko me ji devê her sê dengbêjên navborî girtine...

Perîxanê dibê:
Wey li minê wey li minê wey axao
Kula li ser kula derda li ser derdao
De rabe kuştiyo bê heyf mao
Kula Emînê Ehmed birayê xayîn
Di dil de mao

Perîxanê dibê:
Evdile ter e bab û bira bi min ter e
Min ji te re nego gava tu coyî xopana Elihayê
Çend peyayê kezebşewitî bibe bi xwe re
Tu nizanî Emînê Ehmed xayîn e
Bi Qereqola Elihayê li serê Samîr Begê
Li ewraqê kevn û nû tev digere

Perîxanê dibê:
Evdile lawo esker rabû
Ji xopana Girîdaxê* bi giranî
Min dî Emînê Ehmed derketî
Ji Qereqola Elihayê
Bi sê tîpa bi xwe re esker anî
Hate Barisla Evdilê Birahîm
Bavê Ehmed beranê kejê zerî
Bi sê ciya çadir kuta
Ji xwe re êwir danî

Wey li minê wey li minê wey axao

De rabe kuştiyo bê heyf mao
Kula li ser kula derdê li ser derdawo
Kula Emînê Ehmed birayê xayîn
Roja Bênderê Barislê di dil de mao

Perîxanê dibê:
Hesîne lawo
Esker rabû ji xopana Girîdaxê
Bi serejêr e
Min dî Emînê Ehmed derketî
Ji Qereqola Elihayê
Bi sê tîpa esker pê re
Heyfa min li kuştina Evdilê Birahîm
Babê Ehmed beranî kejê zêrî nayê
Heyfa min tê li wê heyfê
Min dî bi qeflê xulaman girtin
Laşê vî xweşmêrî kişandin bi erdê re
Ji devê Evdilê birahîm
Bavê Ehmed derxistin cotek diranê zêr e
Serê Evdilê Birahîm jê kirin
Birine şarê Diyarbekir
Bi xwe re birin bajêr e

Perîxanê dibê:
Hesîne lawo roja me derketî
Ji alî Gêdûkê*
Here bîne cilê zavê derxe xemla bûkê
Heyfa min li kuştina Evdilê Birahîm
Bavê Ehmed nayê
Min dî qeflê xulaman girtin
Laşê vî xweşmêrî
Danîne nîşana tometîkê
Wey li minê wey li minê wey axao
De rabe kuştiyo bê heyf mao
Kula li ser kula derdê li ser derdawo
Kula Emînê Ehmed birayê xayîn
Roja Bênderê Barislê di dil de mao


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

**Gur têjikê xwe dixwe; Roma reş Emîn jî dikuje**

Piştî kuştina Evdile û şerkerên wî, Qereqola Qûbînê (Beşîrî) şand pey Emîn. Jê re gotin ko waliyê Sêrtê wî xwestiye. Wê çaxê Zoqê* (Yanarsu) navçe bû, qaymeqamî û qereqola leşkerî li wîr bû. Misirc (Kurtalan) ji çend malan pêk dihat.

Emîn hilgirtin anîn Qûbînê. Berî ko Emîn bi leşker re derkeve û here Qûbînê, ji siwarî û çekdarên xwe wisa dibêje:

— Li hafa Çiyayê Qîre* amade bin, gava tiştekî nexweş qewimî an jî gava destê min kelepçe kirin û ji nav leşker derxistin, li ber Pira Awîskê* bikevin pêşiya leşker û min ji destê wan xilas bikin.

Li Qereqola Qûbînê leşker dest datînin ser Emîn û wî hew berdidin. Xwedêgiravî jê re gotine ko walî gazî wî kiriye. Emîn, êdî pê derdixe ko rewşa wî xirab e. Berê xwe dide fermandarê qereqolê û jê re wisa dibêje:

— Camêr! tu bizanibî tiştekî xirab ji min re heye, min berde ez birevim te çiqas zêr, mal û milk divê ezê bidime te. Pişt re bêje Emîn reviyaye.

Fermandar lê vedigerîne:

»Tiştekî xirab nîne. Walî te xwestiye, îfadeyeka te heye...

Di vê navberê de, dewletê jî li gorî xwe tevdîra xwe girtiye. Xeber ji qereqolê re dişînin û emir didin qereqolê:

— Divê Emîn neqihêje Qereqola Zoqê. ko bigêje Zoqê, bi peran û bi zêran be jî wê xwe bide berdan.

Ji ber vê yekê jî, di Qereqola Qûbînê de destek cilê leşkeriyê li Emîn dikin wî kelepçe dikin û li hespekî siwar dikin, wî dixin nava siwariyan û wî ji nava Qereqola Qûbînê derdixin. Peya û siwariyên Emîn, her çiqas li serê Qîre dêhna xwe didinê ko kesekî sivîl û destkelepçekirî ji qereqolê dernakeve. Ji wan kirî ko Emîn hê jî di qereqolê de ye. Heta pê dihesin ko 'Hasil ji mûsilê derbas bûye'.

Wê rojê leşkerên roma reş Emîn tîne li binê Cimzerqê,* dora Xirabajêr* ser Kaniya Girdeşêrê* û dikuje. Ji bo ko kuştinê ji stûyê xwe derxin, bi vê yekê jî namînin dikin ko Sikriyê kurê wî jî mehkum bibe. Ji ber ko leşker piştî Emînê Perîxanê dikuje, xeberê ji derdorê re belav dike û wisa dibêje:

— Gava leşkerên me, Emînê Perîxanê dibe hizûra walî, kurê Emîn Şikrî tê pêşiya me hu bi leşkerên me re musadere (li dij derketin) dike, gule diteqîne û babê xwe jî di vê navberê de dikuje...

Bi van gotinên romê, Şikriyê kurê Emîn, ji bo ko nekeve dest dibe mehkum û derbasî binxetê dibe.

**Derbarê tarîxa qewmînê de ji devê du kesî du malûmat:**

Gava ko min dest bi lêkolîna vê qewmîna bi nav û nîşan kir, sala 1994 bû û ez li herêma Xerzan, li bajarê Batmanê (Elihê) û Misircê (Kurtalan) digeriyam û min bi çend kesên ji Eşîra Remiyan re, têkilî danîbûn. Gelek agahiyên hêja ko dê di rojên pêş de jî bi kêrî lêkolînên wisa bên, di çend civatên wê çaxê de min bi dest xistibûn.

Demek berê, dîsa me guhên xwe da du kesên ji herêmê ko emê niha cih bidin gotinên ko me ji devê wan girtine. Yek ji wan kesan, ji eşîra Reman bi navê Salih Özdemir e, ko niha Cigirê Sekreterê Giştî yê HADEP'ê ye; yê din jî, Eliyê Evdirehman (Elî Pekedîs) e, ko ji Babosiyê ji gundê Girê Hemdo ji Mala Emîno ye.

Kerem bikin em guhên xwe bidin Salih Özdemir û Eliyê Evdirehman, ka ji bo vê qewmînê û tarîxa ko bûyer qewimiye, çi gotine.

Salih Özdemîr dibêje:

»Gava ko Emînê Ehmed ji hêla dewleta Roma Reş ve, li ber li binê Cimzerqê, dora Xirabajêr ser Kaniya Girdeşêrê tê kuştin, wekî we jî got, Şikriyê kurê wî jî bi fen û fûtê dewletê, bi mabesta ko hatiye pêşiya leşker û babê xwe kuştiye, hatibû mehkumkirin. Lê ez dixwazim bibêjim ko, ne bi tenê Şikrî, di heman bûyerê de, bapîrê min Xelîl jî (Xelîlê Mihemed) ko ew û Şikrî kurmamê hev in, di wê qewmînê de dibin mehkumê dewletê, direvin û diçin binxetê, xwe dispêrin Mala Haco. Tarîxa kuştina Emînê Perîxanê ji hêla dewletê ve 1933'ye.Du sal beriya kuştina Emîn, yanî di sala 1931'î de, Evdilê Birahîm, di Qesra Barislê de, tevî 11 xweşmêrên xwe yên tivingê, ji hhela dewletê ve tê kuştin. Kuştina Samîr Begê ji hêla Evdilê Birahîm ve ko Yuzbaşiyê dewletê bûye rast e û ev serhildan jî di navbera salên 1928-1929-an de qewimiye.

Eliyê Evdirehman (Elî Pekedîs) dibêje:

»Ez di sala 1927-an de hatime dinyayê. Ango ez îro 73 salî me. Gava ko fermana mala Perîxanê rabû û derbasî binxetê bûn, ez deh 7-8 salî bûme. Di 21 saliya xwe de ez çûme eskeriyê. Di rojên ko ez çûme eskeriyê, ew ji binxetê dîsa dageriyan Xerzan ser mal hu milkên xwe rûniştin.« Xwendevanên hêja; ji van malûmatên Eliyê Evdirehman diyar dibe ko, li dora sala 1935-an mala Perîxanê fermalû bûne û reviyane binxetê. Dîsa li gorî malûmatên wî, ko çûyîna leşkeriya wî rastî vegera mala Perîxanê ji


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

binxetê dibe, derdikeve holê ko di sala 1948-an de mala Perîxanê ji binxetê dageriyane Xerzan.

**Der heqê Eşîra Reman û Mala Perîxanê de çend agahî:**

Li gorî çend rihspiyên herêmê, tê gotin ko pêşiyê Remiyan ango mala Perîxanê, ji mala Hacî Evdilmenafê Herêma Botan tê. Eşîra Reman, bi taybetî li gundên Qûbînê û Batmanê ko heta sînorên Eskîfê diçin, belav bûne. Remî, bi taybetî ji çend eşîrên giran ên Herêma Xerzan bi xwe ne. Tê diyarkirin ko, Herêma Reman, ji ava Eskîfê dest pê dike û li Deşta Bişêriyê diqede. Em dikarin çend gundên Remiyan ko mîrateyên wan ji berê de li wir hebûye û niha jî li wir bi cih û war in, wisa rêz bike: Barislê, meymûniyê, Serê Kaniyê, Şêpê Reman, Keverzo, Girêsîra, Sêncê, Zorava, Koxika, Ermiyê, Receba, Tilmis û hwd.

Her çiqas, di dîrokê de gelek şexsiyet û malbatên ji Eşîra Reman derbeyên giran li têkoşîna gelê kurd dabin jî, ji nav wan gelek babik ango malên ko bi welatparêziya xwe nav dabin, hene.

Taybetmendiyeke balkêş a vê eşîrê jî ew e ko, ji berê de, girêdaneke xurt di nava wan de peyda nebûye. Her wekî demên berê, niha jî her yek ji van babikên eşîrê, li gorî hêz û qeweta xwe, girêdana xwe bi derdorên siyasî, kirine. Wekî mînak, îro Faris Özdemîr parlamenterê DYP'ê yê Batmanê ye. Lê kurmamê wî Salih Özdemîr, di nav siyaseta gelê kurd de cihê xwe girtiye û Cigirê Sekreterê Giştî yê HADEP'ê ye.

Li hêla din, bi awayeke eşkere tê zanîn ko Remî di dîroka Batmanê de û bi rêvebirina bajêr de, bi başî û nebaşiya xwe roleke girîng lîstine. Bo nîmûne, di sala 1955-an de Seîd Remanlî û di sala 1968-an de kurê wî Mustafa Remanlî, wekî serokbelediyeyê Batmanê hatine ser kar.

Herwekî me li jorê jî got, bêaqûbetîbûn û hevnegirêdan, yek ji nîşaneyên Mala Remiyan bûye. Mînaka herî balkêş jî em dikarin ji zarokên Perîxanê bidin: Heft kurên Perîxanê yên bi navê Emîn, Evdile, Misto, Seîd, Brahîm û Emer bi kuştinê çûne. Wekî ko di vê nivîsarê de jî eşkere dibe, Evdile ji hêla Emîn ve; Emer jî ji hêla Misto ve tê kuştin. Kurên Perîxanê yên din jî, di qewmînên cur bi cur de têne kuştin.

## Ferhengok

Awîskê: Gundekî bi ser Qûbînê ve ye. Li ber pira di navbera Elihê û Qûbînê de ye.

Barislê: Gundekî bi ser Qûbînê ve ye.

Cimzerqê: Gundekî li Misircê (Kurtalan) ye. Di navbera riya Elihê û Misircê de ye.

Fermalû: Nefîbûn, bi darê zorê koçberkirin.
Gêdûkê: Gundekî Ezîdiyan e ko bi ser Qûbînê ve ye.
Girîdax: Çiyayê ko li kêleka Sîpanê Xelatê dikeve.
Kaniya Girdeşêr: Nêzîkê gundê Kanîqulê ye û dikeve navbeyna Gundikê Dono, Cimzerqê û Telîba.
Qîre: Bilindahiya di navbera Qûbînê û Elihê de ye. Jê tevahiya Elihê xûya dibe. Şerê Filîtê Qûto û Mamê Elê Etmankî, li wir qewimiye.
Qûbînê: Navçeyeke Batmanê, navê wê ya tirkî Beşîrî ye
Reman (Remî): Eşîreke mezin e ko li Deşta Bişêriyê dikeve.
Reşkotan: Herêmeke li Xerzan ko dikeve navbera Çemê Bişêriyê û Batmanê, her wisa eşîrên derdorê jî bi vê navê têne naskirin.
Sînikan: Navê eşîr û herêmeke ko dikeve pişta bilindahiya Qîre.
Şêpê Reman: Gireke di navbera Eskîfê û Elihê (Batmanê) de ye.
Xirabajar: Bajareke kevnare û ji alî olî ve pîroz e, ko ji siyasûna (îstasyon) Bişêriyê dest pê dike, gundên dorhêlê çeper dike û heta gundên Şêx Unis, Telîba û Hishisê diçe. Niha jî bermahiyên vê bajarê kifş in.
Zoqê: Gundekî girêdahiyê Misircê ye. Berî ko Misirc bibe navçe, Zoq navçe bû. Qaymeqamî û qereqola leşkerî lê hebû. Dewleta tirk navê »Yanarsu« lê kiriye.


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

## 6. Li Çiyayê Qîre, Delana Paşo şerê reşkotiyan û etmankiyan: Şerê Filîtê Quto û Mamê Elê Etmankî

Li welatê me, nexasim li bakur û rojhilatê welêt; kêm qewmîn, serpêhatî û şer hene ko ji hêla tevahiya dengbêj, goyende û goranîbêjan ve neyên gotin. Her wekî kilam û qewmîna 'Mem û Zîn', 'Mîrzikê Zaza', 'Cembelî û Binefşa Narîn', 'Gênc Xelîl û Edûlê', 'Emê Gozê', 'Dêra Axtermanê û Metran Îsa', 'Keremê Qolaxasî', 'Ferzendeyê Bavê Elfesya', 'Bişarê Çeto' û hwd. qewmîn û serpêhatiyeke karesatî heye ko, bi salan e di devê dengbêjan de bûye benîşt; negotiye ev der Serhed e, ev der Xerzan û Botan e, ev der Qefqasya û Rojhilat e û heta îro hatiye. Belê navê vê şer û qewmînê »Şerê Filîtê Quto û Mamê Elê Etmankî« ye ko bi navê »Şerê Qîre« jî tê binavkirin.

Di vê qewmîn û kilama me ya bi nav û deng de, emê bi awayeke berfireh û sosyolojîk; ligel pêkhatin û çêbûna wê, danasîna her du eşîrên şerker û her du ciwamêran, cih bidin sê guhertoyên (wersiyon) kilamê, ko li Serhed, Xerzan û di nav kurdên Qefqasyayê de tê gotin. Divê wekî çavkanî bidim zanîn ko, me kilama ko li Serhedê tê gotin, ji devê Cahîdê Dengbêj, a ko li Xerzan tê gotin ji devê Dengbêj Salihê Qubînê û wersiyona Qefqasyayê jî, ji devê dengbêjê bi nav û deng Gerapêtê Xaço wergirtin.

Gerapêtê Xaço, ermenekî ji Herêma Xerzan, aliyê Reşkotan, gundê Bileydera Qubînê ye û ji kurê Filîtê Quto, Hesenê Filît re bi salên dirêj dengbêjiyê kiriye. Di dîwan û civatên wî de, di sergoşeyê de rûniştiye. Behsa wan salan dengbêjê me yê navdar di hevpeyvîna ko rojnamevan Mehmet Aktaş pê re kiribû de wiha dibêje: »Wê demê hemû axa û begên kurdan xwediyên hinek filehan bûn. Ew fileh wekî eşîra wan bûn. Di fermanê de, Filîtê Qûto xwedî li filehên xwe derket û xwîna filehekî jî nerijand. Lê, ew dijminê bazarganan bû diçû pêşiya karwanan. Bi siwariyên xwe re li pey talanan digeriya.« Piştî van malûmatan, niha jî kerem bikin em berê xwe bidin pêkhatina vê qewimîna me ya bi nav û nîşan:

## Etmankî li reşkotan konan vedidin

Mamê Emê, ji Geliyê Belîsê ji eşîra Etmankan e. Eşîra Etmankan, eşîreke berfireh e. Li seranserê metrepolên Tirkiyeyê û li Anatoliya Navîn belav bûne. Mamê Emê, serek û rihspiyê eşîrê ye. Hatina wî ya bi karwan re jî, ji ser xatirê ko şêwr û mişêwiran bikin, bi xwe ye. Her dem bi karwanê xwe re tevdigere. Temen ango emrê wî li gorî sala qewmînê, li dora 70-80 sal e.

Eşîra Etmankiyan her wekî îro, berê jî ne xwedî erdên çandiniyê bûn. Ji ber vê yekê jî, her gav bi karwanî ji Deşta dorhêla Bayîkan (Xana Hewêl) û ji Deşta Belîsê xwê bi barên xwê dihatin Deşta Xerzan, bi riya taqas û danûstandinê xwêya xwe bi genim, ce, nîsk û nok ango bi dexl, diguhertin. Lê sala qewmînê, ji ber sedema ko nangiranî li Xerzan jî çêdibe, Eşîra Etmankiyan, ji ber bêmecaliyê berê xwe didin herêma Diyarbekirê. Lê wekî tê zanîn, kesên ji Geliyê Belîsê tên ko biçin Diyarbekirê, divê di ser Xerzan û Reşkotan de derbas bibin. Etmankî jî wisa dikin. Barê wan xwê ye û ligel ga û gamêşan pêncî û pênc mirov bargiran in. Ji ber ko ji rêyeke dûr hatine, westiyane. Dixwazin, li Herêma Reşkotan konê xwe vedin, wê şevê li wir bimînin, bêhna xwe berdin û dotira rojê ber bi oxira xwe ve bimeşin. Ji niha û pê ve kerem bikin em guhên xwe bidin M. Salih Yorulmaz (Salihê Hemê) ko ji gundê Eyndarê ya Misircê ye û di warê qewmînê de xwedî malûmatên hêja ne: »Etmankî tevî barê xwe yê giran, li dorhêla Reşkotan; Kaniya Badareşê, Guhara Devan ko wekî Kanîgulanê jî tê naskirin, konê xwe vedidin. Ev der di Kevanê Qîre de li ser riya Tapiyê ye. Wê gavê Eşîra Reşkotan jî koçer bûn û di konan de diman. Lewre jî konên Reşkotiyan ji konê ko Etmankiyan danîbûn, baş xwiya dikirin. Mamê Elê, gazî biraziyê xwe Elî dike û jê dixwaze ko divê ew pê re were nav konên Reşkotan ko dew an jî aveke cemidî vexwin û hinek bêhna xwe berdin. Radibin wisa dikin. Dema ko Mamê Elê û Elî têne binê konên Reşkotiyan, bi navê Şîrînê ko keça Kespêrê File ye, çav bi Elî dikeve û aşiqî bejn û bala Elî dibe. Şîrînê ya ko bi hiznê dinyayê zehf bedew û xweşik bûye, radibe tê bi dêzgîna hespê Elî digire. Ev yek dibe sebeb ko Mamê Elê zêde zêde biqehire. Çawa keçikek rabe, ji dêvla mêrxasekî ko bi temenê xwe ji biraziyê xwe pir meztir be, bi dêzgîna hespê biraziyê wî bigire. Heta mezin hebin, nehatiye dîtin ko bi dêzgîna hespê biçûkan bê girtin. Ev yek di nav eşîrên Xerzan de gelekî eyb û şerm e. Ji ber ko Mamê Elê aciz dibe bi biraziyê xwe Elî û Şêrînê re dike qareqar. Di vê navberê de Filîtê Quto, ko mêrxas û serekê Eşîra Reşkotan


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

e, li banê Qesrê raza ye û yek jî li ser Filît baweşînê dike. Ji ber xirecir û qareqara Mamê Emê, Filîtê Quto ji xew şiyar dibe, xwe berjêrî qesrê dike û qesta van her du ciwamêrên xerîb dike. Di vê navberê de Reşkotiyek ber bi wan ve tê û ji Mamê Elê Etmankî re wisa dibêje:

— Xwedê ji we razî be, dengê xwe zêde bilind nekin. Filît niha li jor raza ye. Hun xerîb in, ne ji van deran in, Filîtê Quto ji xew şiyar bibe wê aciz bibe û wê nexweşî çêbe!

Mamê Elê lê vedigerîne:

— Camêr! Tirsa min ji kesî tune ne, ez nehatime min talanê babê kesî nebiriye. Em karwan in, di riya xwe de derbas dibin. Hewcedariya me bi tasek ava cemidî li vir heye, emê vexwin û herin.

Ji ber xirecir û qareqara Mamê Emê, Filîtê Quto ji xew şiyar dibe, xwe berjêrî qesrê dike û qesta van her du ciwamêrên xerîb dike. Ew û Mamê Elê zirtan li hev dikin, başebaş ji hev re dibêjin. Mamê Elê ji Filîtê Quto re wisa dibêje:

— Lawo Filîto! Gava em ji riya xwe dageriyan, tu mêrekî çê yî were pêşiya min...!

Piştî van gotinan, Mamê Elê û Elî diçin ser konên xwe, serê sibê jî tevî karwanên xwe berê xwe didin Diyarbekirê...«

Filîtê Quto diçe pêşiya Karwanê
Dike doza Bazinbeleka milê Elê

Belê... Piştî ko karwanê Etmankiyan, danûstandinên xwe yên li Diyarbekirê diqedînin, barên xwe yên xwê, bi dexil re diguherînin. Berî ko karwan dagere, Eliyê biraziyê Mamê li nava Diyarbekirê digere. Berê wî dikeve 'Sûka Şewitî'. Li Sûka Şewitî çav bi tivingeke şeşxane ko bazineke zîvîn lê pêçahî ye, dikeve. Ji bo kirînê, pênç çerxî be jî di berîka Elî de nîne. Elî radibe doz li mamê xwe Mamê dike ko vê 'Bazinbelekê' jê re bikire. Mamê Elê, ji ber vê daxwaza Elî tinazê xwe pê dike û wisa jê re dibêje:

— Lawo, ez vê tivingê ji te re bistînim, sibê hinek mêrxas werin pêşiya te, ji te bistînin emê bihetikin.

Elî hêrs dibe, li mamê xwe dizivirîne:

— Mamo, bi navê Xwedê heger tu vê Bazinbelekê ji min re nestînî, ezê li nava Sûka Şewitî hemaliyê bikim, heta ez vê tivingê nestînim û nêxim milê xwe ez nayêm nava Etmankiyan.

Mamê dêhna xwe didê ko wê Elî newe, radibe tivingê ji Elî re dikire.

Karwan ber bi Xerzan ve dadigere. Wexta ko tên dikevin nav axa Reşkotan Kevanê Qîre, li wan dibe şev. Lewre jî li Gundê Bileyderê ya Qubînê dîsa konên xwe datînin, serê sibê jî dikevin rê. Di vê navberê de Filîtê Quto tê pêşiya wan. Li wê derê Filîtê Quto tê daw û doza xerac û baca rê ji Etmankiyan dixwaze. Mamê Elê dibêje:

— Filît lawo! ji xwe re hêstirek ji serî, yekî ji navê û yekî jî ji paşiyê ji xwe re bigire û wekî xerac û baca rê bibê.

Lê çavê Filît li Bazinbeleka milê Elî ye. Dixwaze ko ew tivinga Bazinbelekê bidine wî. Her çiqas pê re zarezar û hêvî dikin jî ne fêde ye. Mamê Elê dîsa berê xwe dide Filîtê Quto û wisa jê re dibêje:

— Filîtê Quto, te li ko seh kiriye ko eşîran tivinga milê xwe, wekî bac û xeraca rê dane xelqê. Qey tu nizanî tiving namûs e. Te mêr kuştibe emê bidine te xwîna mêrê, te jin revandibe emê bidine te qelenê jinê. Tu ji karwanê kîjan hêstirî bibî, tu serbestî. Lê heger tu tivinga min dixwazî, encax ew tiving bibe qelenê dayîka te Şemê...

Piştî van gotinan, Mamê Emê tivinga bi navê Bazinbelekê radije destê xwe û bi guleyekê Filîtê Quto ji ser hespê tera dike xwarê û Filît dikuje. Piştî kuştina Filîtê Quto, Eşîra Reşkotan berê xwe didin Etmankiyan û heta berê êvarê guleyên barûdan li wan direşînin.

Di vê navberê de, eşîra Pencînaran bi dengê tivinga ve derdikeve serê Çiyayê Kolik mintîqa Şêxevinda û destekî tiving davêjin ji bo ko hîn bibin bê ka ev dengê tivingên ko tên ji bo çi ye. Ji Etmankan kirî Pencînarî jî, ko eşîra Cemîlê Çeto bi xwe ye, hatiye hawara Reşkotiyan. Ji ber vê yekê jî ligel ko fersend û mecala rev û xilasbûna Etmankiyan hebûye jî, ji ber ko gotine ewên li serê Çiyayê Kolik jî Reşkotî ne, êdî di cihê xwe de mane û li ber xwe dane. Ji xwe berî ko xwe xilas bikin û birevin, ji Mala Cemîl Paşa Gêncoyê Paşo ko biraziyê mîr jî jê re dibêjin û li gundê Delanê (Delana Paşo) dimîne, bi awayekî bêbextî ji Etmankiyan re dibêje: »Werin xwe li min bigirin, ezê ji bo we navbeynkariyê bikim û we û Reşkotiyan li hev bînim...« ji ber vê gotinê, Etmankî êdî narevin, heta ko hawara Reşkotan bi ser wan ve tê.

Belê... Wê rojê, li Kevana Qîre li Delana Paşo, serekê eşîrê Mamê Emê jî di nav de, Eşîra Reşkotiyan wekî heyfa Filîtê Quto, 52 kesê ji Eşîra Etmankiyan dikujin. Tê saloxdayîn ko karwan ji 55 kesî pêk dihat û bi tenê 3 kes ji wan filitîne ko xwe di bin laşê hêstir û baran de veşartine. Ev her sê kesên nîvmirî ko bi zorê canê xwe xilas dikin, bi şev nîvê şevê xwe

berdidin Çemê Bişêriyê, ber bi çem ve berê xwe didin bakur û li hindava Xirabajêr, ji mintîqeya Reşkotan dikevin mintîqeya Xerzan. Piştre bi darê zorê xwe digihînin Bayîkan (Xana Hewêl) nava eşîrê. Şakir Epozdemîr, di nivîsarekî xwe de diyar dike ko navê wan sê kesên ko ji Şerê Qîre sax Filitîne ev in: Ji Mala Xizê Resûlê Şênî, ji Mala Seydê Silêmanê Têlo û Ji Mala Emê Resûlê Belik.

Dîsa li gorî ko min ji devê kalekî 82 salî hîn kir, mehîna Mamê jî sax filitiye û bi tena serê xwe daye rê û ji qada Şer heta dorhêla Bayîkan, nava eşîrê hatiye û kiriye ko eşîr bi qewmînê bihese û bikeve rê ber bi Reşkotan ve were. Her wiha li gorî wî kalemêrî; dema ko Etmankî ji bo heyfê dikevin rê, Eşîra Babosiyan jî ji bo piştgiriyê bi wan re tên û dema ko Etmankî dikevin mintîqeya Xerzan, Eşîra Pencînaran tê pêşiya wan û nahêlin ko Etmankî û Babosî derbas bibin û ji wan re wisa dibêjin: »Heger hhun herin, Reşkotî tevdîra xwe standine, yekî ji we jî sax nahêlin...« ji ber vê yekê jî, Etmankî û Babosî dadigerin ser eşîrên xwe.

Xwendevanên hêja berî ko em derbasî beşa wersiyonên kilama Filîtê Quto û Mamê Emê Etmankî ko me wekî wersiyonên Xerzan, Serhed û Qefqasyayê binavkirine û hinek behsa Eşîra Reşkotan û Etmankan bikin, kerem bikin derbarê qewmînê de em guhê xwe bidin beşek ji nivîsara Zeynelabîdîn Zinar: »Filîtê Quto, axayê Eşîra Reşkotan bû. Li Badareşê, di qotarê Kevanê Qîre de rûdinişt. Di wê demê de eşîreta Etmanî malê Hikûmeta Osmanî bi heqê xwe ji Diyarbekirê dibira Serhedê. Çaxê karwan tê di nava axa Reşkotan de derbas dibe, Filîtê Quto bi serê xwe li biniya Pozê Kanîgulanê rêya wan dibire û ji wan baca rê dixwaze. Lê Mamê Elê Etmankî jî axayê eşîra xwe bû. Mirovekî pir ji xwe razî bû. Her wiha mêrxasekî bi nav û deng bû jî. Ew, dana bacê pir li xwe zor tîne û berikekê davê Filîtê Quto, wî dikuje. Piştî kuştina Filît, eşîra Reşkotan li karwanê Etmankiyan tên hev û yek ji wan sax nahêlin...« (Pirtûka Xwençe 4 rûpel 20-26)

Eşîra reşkotan;
Xesasiyeta neviyê wî Hecî Ehmed Karabulut!

Reşkotan, hem navê eşîreke mezin e li Deşta Xerzan, hem jî navê mintiqeyeke berfireh bi xwe ye. Sînorên herêma Reşkotan, ji ava Bişêriyê dest pê dike û heta Pira Malabadê ko nêzîkî Farqînê (Silîvan) ye, diçe. Her wiha ji hêlekî ve jî navçeya Hezoyê (Kozluk) wekî sînorê herêma Reşkotan

e. Îro Hacî Ehmed Karabulut ko ji partiyeke kevneperest Serokê Belediyeya Qubînê (Beşîrî), û serokatiya vê eşîrê jî dike. Hacî Ehmed Karabulut, kurê Hacî Elî ye, Hacî Elî kurê Mistê ye û Mistê jî kurê Quto ye ango Hacî Ehmed neviyê Filîtê Quto ye. Li ser vê qewmînê ez pê re ketim têkiliyê û min jê xwest ko ew behsa bapîrê xwe û sala çêbûna qewmînê ji me re bike. Lê wî bi tenê diyar kir ko, ev qewmîn beriya 120 sal berê qewimiye û wisa domand: »Lo heyra tu yê çi bikî ji Filîtê Quto? Ew bapîrê min bi xwe ye, lê dev ji van karan berdin...«

Wekî me di destpêkê de jî got; Herêma Reşkotan herêmeke berfireh e. Em dikarin gundên Reşkotiyan wisa rêz bikin: Hiznamîrê (Paytexta wan e), Tapiyê, Bolindê, Kurdikê, Hicrê, Delana Paşo, Texeriyê, Kelokê, Mezrikê, Bolindê Dirbêsa, Zivingê, Kêzikê, Newala, Nazdarê, Qorixê, Bîmêrê, Herfasê, Xîlika, Şerbetkoy, Reşikê, Licika Hacî Şemşedîn, Licika Xasik, Kêrikê, Mêrîna, Birûka, Mergerîcalê, Kanîkê, Malê Gir û Şabê. Wekî gotina dawî ya derbarê vê herêmê de, em dikarin bibêjin ko ji berê de li vê herêmê file, êzîdî û misilman bi hev re jiyana xwe domandine û hê jî herêm wekî herêma êzidiyan tê binavkirin.

## Eşîra etmankan

Eşîra Etmankan, li welêt yek ji eşîrên herî mezin e û li seranserê Tirkiyeyê belav bûne. Dîrokzanê kurd Mihemed Emîn Zekî di »Tarîxa Kurdistanê« diyar dike ko Etmankî, li dorhêla Belîsê, Enqereyê û Derbendê bi cih û war bûne û ji 5000 malan pêk tên. Tê diyarkirin ko Etmankî, wekî paytext ji xwe re gundê Qesrê ko li Geliya Belîsê ye, dibînin. Sînorê vê eşîrê ji »Narlîdereya« Belîsê dest pê dike û heta Misircê (Kurtalan) ya Sêrtê diçe. Heman eşîr ji heft bavikan pêk tê û navê wan ev in: Mala Dûmê, Mala Xizê, Mala Emê, Mala Badir, Mala Sersem, Mala Şeref, Mala Seydê û Mala Daho. Etmankî îro li seranserê Tirkiye û Kurdistanê belav bûne. Gelekên ji wan îro li Stenbol, Îzmîr, Bursa û Mêrsînê dimînin. Li welêt jî li Batmanê, Belîsê, Misircê û li Bayîkan (Xana Hewêl) binecî ne.

Belê me zêde dirêj kir, niha jî kerem bikin em bi hev re dêhn û bala xwe bidin, sê wersiyonên vê kilamê ko me li jorê navên wan dabûn:

Filîtê Quto (wersiyona Xerzan-Ji devê Salihê Qubînê)

Hey lo hey lo hey lo hey lo hey lo hey lo


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Hey lo hey lo hey lo hey lo hey lo hey lo

Şemê dibê:
Filîto lawo dilê min dibê ye
berxê min sed carî dilê min dibê ye
Min ji te re nego
neçe pêşiya karwanê Mamê Emê ye
lawo vêga çavê jin û zarê wan li rê ne
ew jî weka te mêrkuj in
lawo karwanî şelê ne
Dibê dilê min dibê ye
sed carî dilê min dibê ye
Filîtê Quto bavê Hesen cewrê Şeme
xwe daye ser taxê ye
îro ji Mamê Emê Etmankî dixwaze
qedar û baca rê ye

Mamê bi sê denga banî dike dibê Elî
gazî Filît dike dibê: Lawo
eger te jin revandibe
were ezê bidime te qalanê jinê ye
eger te mêr kuştibe
bidime te xwîna mêrê ye
eger ehtaciya te bi malê dinyayê heye
were rûnê bi erf û adetê dinê ye
tu cara îcar nebûye rikê Etmankî ye
nedaye baca rê ye

Filîtê Quto bi sê denga
Li Mamê Elê Etmankî dikir gazî:
Dilê min dibê ye sed carî dilê min dibê ye
îro tê bidî min qedar û baca rê ye

Mamê dîsa gazî Elê dike:
Elî rabe lezke bilezîne
hêstira sor a pêşiyê hêstira boz a paşiyê
bi barê wê ve ji Filîtê Quto ra bîne

Lawo me şixûl ji vê bela hanê tunîne
Hewara Etmankan dûr e dereng e
îro bi degmê xwe bi me dibîne

Mamê dîsa gazî Filît dike dibê:
Were hêstira sor a pêşiyê
Hêstira boz a paşiyê bi barê wê ve
bibe qedara te ye
lê tu cara îcar nebûye rikê Etmankî ye
nedaye baca rê ye

Hey lo hey lo hey lo hey lo hey lo hey lo
Hey lo hey lo hey lo hey lo hey lo hey lo
Filîtê Quto bi sê denga
li Mamê Emê Etmankê dikir gazî
Dibê: hêstira sor a pêşiyê hêstira boz a paşiyê
Barê wê qadara min e
Bazinzera milê xwe tê deynî baca rê ye

Mamê dibê Filîto lawo xeberê te ye
hêstira sor a pêşiyê hêstira boz a paşiyê
barê wê bive xwîna te ye
kalekî bavê min heye li malê ye
her roj serê siba radibe
simbêlê xwê yê sorê sor sosinî
dişo bi sabûnê ji kefa hinê ye
çavê kalê bavê min hêja li zewacê ye
Bazinzîva milê min
qelanê heft qîza ye heft bûka ye
Heydeyne erdê baca rê ye
were bazinzîva milê min bibe
qelanê dayika xwe Şemê ye

Mamê dibê Emê bab û bira bi min Emê
bavê min bûyino goreşa degerînin
bara biqûlibin bikin kozik xwe bidine berê
hûnê mîratê kurm û kurmanca dagirin


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

barûdê bi terha bi derhema berdin serê
nîşanê bigirin siwarê pêşî
siwarê serbixelî
jê re dibêjin Filîtê Quto cewrê Şemê
qey lawo nayê bîra we
cara min digo xwezîka serê min û
Felîtê Quto bavê Hesen cewrê Şemê
li kevanê Qîrê li hev de derê
ezê îro şerekî li Kevanê Qîre daxim
bikim wekî roja şerê Eshabiyan
dewra berê

Hey lo hey lo hey lo hey lo hey lo hey lo
Hey lo hey lo hey lo hey lo hey lo hey lo

Şemê digo: Felîto lawo banî Qîre li vî banî
min ji te re nego neçe pêşiya karwanê
Mamê Emê bavê Meyro lawo vî karwanî
ew jî weke te mêrkuj in lawo karwanî şelê nin
çûne Diyarbekir ji xwe re genimê sor e
Vêga çavê jin û zarokên wan li rê ne

Şemê digo: Felîto lawo
karwan rabû ji Bilêyderê
şewq û şemala xwe da
bejn û bala Felîtê Quto bavê Hesen
rextê qatiya lawo qevda vê xencerê
carê min ne digo were
li Tapiyê rûnê
di nava xulam û xizmetkaran de
belkî qasekî behna Şemika diya te bi te derê

Şemê dibê: Felîto lawo
banê Qîre ore or e
ji xerî mala xweziyê Xwedê re
çaxê li Mamê Emê Etmankî
li wir pêsîr tengî tê de derketa

serê birek xortê Etmankan
Sernijdevan Derweşê Por e

Hey lo hey lo hey lo hey lo hey lo hey lo
Hey lo hey lo hey lo hey lo hey lo hey lo

Mamê dibê: Fîlîto lawo
banê Qîre bi simaq e
ezê bikim teyr û tolê çewrê
li ser cinazê kurê bava
ji xwere îro bikin waq e waq e
Şemê digo: Filîto lawo
Ji Delana Paşo heya mîrata Tapiyê
birêne çend neqeb e
tivinga li ser destê Mamê Emê bavê Meyro
bi kewkeb e lawo bazinzer e
carê min nedigo xwe nede ser kozika
Mamê Emê bavê Meyro
Lawo qetil û xwîn e tev xezeb e

Filîtê Quto (wersiyona Serhedê-Ji devê Cahîdê Dengbêj)

Hey lo hey lo hey lo
hey lo hey lo hey lo

Lo lo Filîto lo lawo rabe
îro karvanî berxê min Karvanî êvar e lawo
karvanê me bar kir bi royê re qet dananîn
Kevanê Qîre kaniya mîrê Pira Batmanê vegeriya
Xwe ser paşiyê danî
Filîto lo lawo li dinyayê hewqas geriyam
Tu çiqas xortekî ehmeqê nezanî
Lawo bi çi aqilî tu hatiyî pêşiya vî karwanî
Te serê bacê çi zû berda ser erwanî
Cara vî carî gava tu ji ber devê Bazinbeleka
Van egîtan û xweşmêran xilas bibî
Lo lo Filîto lawo


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

bila wê gavê dayîka te yê Şemê bibêje
berxê teze minê çoka xwe danî te aniye berxêêêê

Hey loooo
Lawo rabe dilê min dibêye
sed carî dilê min dibêye
Filîtê Quto go: Şemê lê dayê Xwedê dizane
karwanekî jor de hatî ajotî benda rê ye
Ez rabim herime pêşiya vî karwanî
jê bistînim bac û xeraca serê rê ye
Şemê lê dayê nizanim îro tu ji min re çi dibêjî dayêê

Şemê go: Filîto lawo
Mekê ko heye mala Xwedê ye
Ew karwanê hanê karwanê Emê Mamê Ginê ye
Min ji berê de seh kiriye
hetanî extermê xwe
mêrê xwe nede kuştinê
lawo malê xwe li xelkê belav nake
nake bac û xeraca serê rê ye

Filîtê Quto go: Şemê lê dayê
rabe ji boyî vê gotina teyê hanê
ev bi sê telaqê fitûye
ku jin diçe mala bavê ye
ez rabim herime pêşiya vî karvanî
jê bistînim Bazinbeleka milê wî
ku navê wî bûkê ye
lê lê dayê yan cinazê min li meydanê dikeve
Yan ezê bistînim Bazinbeleka milê Emê
ku navê wî bûkê ye
berxêêê bê wêêêêîîî

Şemê go: Filîto lo lawo bes e
ji êvar da min hêvî kir
çiqas min bi te da hêvî kir
min dî Filîtê min ê Quto rabû

bazbend girê da hemayîl ji bîr kir
berê xwe dabû Pozê Qîrê kevanê
li Delana Paşo li Pira Batmanê
Xwedê dizane qesta Emê
Beranê kejê qemerê serbirêşî kir

Filît çû pêşiya Emê go: Emê lawo
Dilê min dibê ye sed carî dilê min dibê ye
Lawo ez hatime pêşiya we ji we distînim
Bac û xeraca serê rê ye

Emê go: Filîto lawo
Hestirekî ji qola dawiyê
yekî ji qola ortê
Yekî ji qola paşiyê
bigire ji xwe re bike
lawo bac û xeraca serê rê ye
Ergê tu ji malê dinyayê feqîrî lawo
Bajo bajara hevraz ji zariyê xwe re
Bike xerc û mesrefa malê ye

Filîtê Quto go: Emê lawo
her sê hêstir ji xwe malê min in
Çavê min li tivinga milê apê te ye Mamê ye
Ku navê wî bûkê ye

Emê go: Filîto lawo ji Xwedê bitirse
kesî hê salixa me neda
xelkê li dinyayê ji me standiye
bac û xeraca serê rê ye
Sibê lawo Bazinbeleka milê xwe bidime te
daketime milê Reşkotiya
xelk wê ji min re nebêje:
'Kanî Bazinbeleka milê te?'
Lawo ezê çi bidim cewaba
qîz û bûkên êlê ye berxêm


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Emê dibê: Filîto lawo
go bila di destê min da dimîne
ezê bibêm lawo
karwanê me çû Serhedê
min li wê derê apê xwe yê Mamê zewicandiye lawo
min Bazinbelekê da ser qelenê diya Filîtê Quto
bê ko navê wê Şemê ye berxêêêêê
bê wêêêê
ax hey lo hey lo hey lo hey lo
oo lo Filîto lo lawo pêşî da te qet nego
karwanî le lawo kesî re ye

Hey loooo
Emê ji wê derê vegeriya
cem apê xwe yê Elî
Go apo dilê min dibê ye
sed carî dilê min dibê ye
apo sêwiyê şemê hatiye pêşiya me
ji me distîne bac û xeraca serê rê ye
min jê re pêşkêşa wî daniye
meya Xeco hêstira navê wê Hedo ye
Ewî ji min re gotiye çavê min
li tivinga milê apê te Mamê ye
Ku navê wî bûkê ye apo
Ez hatime tu ji biraziyê xwe re
çi dibêjî apo

Elî dibê: de lo lo
De lo lo de lo lo de lo lo

Elî dibê: Emê lawo
hêvî û gumana min heye ji Rebê Alemê
belgî apê te yê kalê xêrê
ji serê te nebîne
Gava ko apê te yê kalê
van xeberan û galegalan seh kiriye
şeş sed û şêşt û şeş damarê mêraniyê

ji nava pişta apê te rabûne
fûrtê serê apê te rabûne mînanî şûjinan
Lawo tu rabe lez ke bilezîne lawo
xwe bi ser barê hêstira dawiyê bigîne
Bazinbelekê bi tevî gule barûda
ji apê xwe re bîne
Eva ne tewelî çêkirina nava
qîz û bûkên êlê nîne
eva milhejandina li nava êlê nîne lawo
ev li Kûrana Reşkotan
lawo Xwedê dizane qey tu nizanî
Şerê Filîtê Qutoyê delûdîn e

Rabe lawo lez ke bilezîne
tu Bazinbelekê tevî gule barûdan
ji apê xwe yê kalê re bîne
Apê te yê kal nizanibû lawo
li sonya emrê xwe de li Pozê Qîre Kevanê
orta meydanê mêra bikuje
lawo bike oxlemeye berxêêêêê
bê wêêheêhe
Ax hey lo hey lo hey lo hey lo
Hey lo hey lo hey lo hey lo
lo lo Filîto lo lawo te qet nego
karwanî le lê lawo kesî re ye

Filîtê Quto (wersiyona kurdên Qefqasyayê-Ji devê Gerapêtê Xaço)

Hey lo hey lo hey lo hey lo hey
Heylo heylo heylo heylo Şem rebenê...

Şemê digo: Filîto lawo
li maltîka malê xwe yo
daniyê Kaniya Badereşê
lawo ser avêyo Şemê rebenê
Dibê: Filîtê Quto gelo digere
dîsa li xirabiyê Şemê rebenê
Şemê digo: Filîto lawo


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

dilê minê wê dil dibêyo
ne min go: neçe pêşiya van terş û talanan
De terş û talişî gune ne
çavê jin û zarokê wana
li rê ne lo Şemê rebenê

Heylo hey lo hey lo hey lo...
Şemê digo: Filîto min go:
Lawo karwan hato ji Bilêderê
Mamê Elî Etmankî
bi sê denga dikir gazî
Li xulam û xizmetkara digo:
bavê kî no hûnê bara bi qelêbin
bikevine berê min ê rojekê
Dua dikir serê min û Filîtê Quto kurê Şemê
Li parava Qîre dîsa li vê derê Şemê rebenê
Li parava Qîre dîsa li vê derê Şemê rebenê

Şemê digo: Filîto lawo
min go ji Pozê Qîre
heta Delana Paşo çend neqeb e
dibê mertela bavê Hesen lawo gelo
sorî gulkî bi kokeve
Herçî şerî bavê Hesen tê de ye daîm
Qetil xwîn e bi xezeb e lê Şemê rebenê
Qetil xwîn e bi xezeb e lê Şemê rebenê

Filîtê Quto bi sê denga dikir gazî
li Mamê Elî Etmankî
Digo: lawo hêstira pêşîn
hêstira paşîn deyne baca rêyo
xulam û xizmetkara digot:
gelo gelî xulaman
hûnê hêstira pêşîn hêstira paşîn
bidine Filîtê Quto
Bila bibe qelenê diya xwe ye wî Şemikê
Lê Şemê rebenê

Şemê digo: Filîto lawo
roja me derketî wî ji alê Torê
Şewq û şemala xwe da pozê Seydim Qasim
Tapiya bir û mertela bavê Hesen gurkê donê
Ji xêra mala Xwedê ra gavê bavê Hesenî
Talek û pêşîr tenî
Bira tê biketa çend peyayê mala Hesen Korê
Şemê rebenê.

Şemê digo: Filîto lawo
karwan temam dibê wê karwanî ne
bira ji Mamê Elî Etmankî
pêştir karwan û bazirgana
li welat û şaristana negerîne
Îro derbekê dayê bejn û bala Filîtê Quto
Li bavê Hesenî Tal e û koka mêra ji
Mala wana ditepîne lê Şemê rebenê

## Ferhengok

Şeşxane: Cureyekî tivingên ko berê dihatin bikaranîn. Gule û barûd ji jorê de dixistin devê tivingê û diteqandin. Navekî wê yê din jî, bêrdange ye.

Bazinzer-Bazinbelek: Navekî taybet ê tivingê ko ji ber bazina wê ev nav lê kirine.

Çê: Baş, çak, hêja.

Çerxî: Cureyek ji pereyên kevin.

Qîre: Bilindahiya ko di navbera Batmanê û Qubînê de ye.

Bilêyder: Gundekî Qubînê (Bişêriyê)

Kaniya Badareşê: Li hemberî Batmanê dikeve. Beşek ji xaka Reşkotan e.

Guhara Devan: Navekî wî yê din Kanîgulanê ye.

Tapiyê: Gundekî Qubînê ye. Di binê Çiyayê Qîre de dimîne.

Delanê: Bi navê Delana Paşo jî tê binavkirin.

Bac: Navê cirmê yê din e. Bi tirkî, vergî.

Kalemêr: Zilam û mêrê ko zêde jiyaye. Kesê temendirêj.

Qedar: Heqê rê, erdiye. Bi tirkî, ayakbasti parasi.

Kurmancî: Navekî din ê tivinga şeşxane ye.

Nişdevan: Mehkûm, mêrê jêhatî, kesê çalak carna ji bo eşqiya tê gotin.

Sernişdevan: Kesê ko serekiya nişdevanan dike.

Kewkeb: Milavêtina sîlehan, girêdana sîlehan.

Bazbend: Hemayîl, nivişt.
Hemayîl: Nivişt, bazbend.
Galegal: Mijûlahî, axaftin, xeberdan.
Pencinarî: Kesên ji Eşîra Pencinaran re tê gotin. Ev eşîr wekî Eşîra Mala Bişar û Cemîlê Çeto tê binavkirin, ko ji heft bavan pêk tê.
Bayîkan: (Xana Hawêl) Berê li ser Bilîsê bû. Niha navçeyeke Sêrtê ye.
Misircê: (Qurtelan) Navçeyeke Sêrtê, navenda Herêma Xerzan.
Qubînê: Navenda Bişeriyê. Navçeyeke Batmanê.
Babosî: Navê herêm û eşîrekê ye. Ji Zoqeydê dest pê dike, gundên Comaniyê, Kevirê Hemo, Gazê, Girê hemdo, Bahemsa Jorî û Bahemsa Xwarê û çend gundên din di nava xwe de dihewîne.
Karwanîşelê: Kesên ko diçin pêşiya karwanan û karwanan dişêlînin.
Goyende: Gotinbêj, yê/ya ko dibêje, radigihîne.
Goranîbêj: DengbêjKaresat: Trajedî, malkambaxî
Nangiranî: Xela, qulixayî.
Şêwir û mişêwirkirin: Guftûgokirin û biryargirtin.
Rîspî: Kalên zana û dinyadîtî yên ko di çareserkirina pirs û keleman de bi wan tê şêwirîn.
Başebaş ji hev re gotin: Hevdu serwext kirin.
Zirt li hev kirin: Gef li hev xwarin
Şêxevinda: Li hemberî Qubînê, Gundê Delana Paşo dikeve.
Çiyayê Kolik: Gava ko mirov ji Ava Bişêriyê derbas dibi, ev çiya dest pê dike. Heta Geliyê Kûşanê diçe. Ji quble ve gundên wekî Ridwanê, Xanikê, Wazdê, Dusadekê, Warê Hacî Reşo û Memika; ji aliyê zozanan ve jî, gundên wekî Şêx Ûnis, Zixur, Cimzerqê Warê Sîmê û Zengayê Mamo li dora vî çiyayî hene.

## 7. Şerê Mala Eliyê Ûnis qewmê çiyê: Şerê Newala Qeremûsê

Bê guman, di dîrokê de, ligel ko bi sedan xiyanet û malkambaxiyên nava me kurdan hebûne, wisa jî cengawerî û mêrxasiyên me hebûne, ko li seranserê cîhanê ji dîrokzan û lêkolîneran re bûne mijar. Ev qewimîna ko em ê niha ji we re behs bikin, ko kilama wê ji hêla gelek dengbêjên me ve hatiye gotin, yek ji wan nimûneyên cengawerî û wêrekiyê ye, ko ew jî raberî xiyanet û malkambaxiyê bûye. Belê, navê vê qehremaniya ko li dijî Roma Reş pêk hatiye Şerê Newala Qeremûsê ye, ko wekî beşek ji serhildanên Mala Eliyê Ûnis li nava welatê me deng daye.

Divê bidim zanîn ko, Qeremûsê him navê gund e û him jî navê newalekê bi xwe ye. Gundê Qeremûsê îro li ser Farqîna (Silîvan) Amedê ye. Piştî vê malûmatê, niha jî em hêdî hêdî xwe bi qewimîna şer de berdin. Çawa, çi çaxê, bi çi awayî, ji hêla kê ve pêk hatiye û çawa bi dawî bûye? Pişt re jî em ê bi hev re biçin Newala Qeremûsê û guhê xwe bidin kilama kezebşewat a vê qewimînê...

### Xiyaneta Silêmanê Bego û Emînê Zînê

Elî, Xelîl û Mamê ji qewmiyeta Mala Eliyê Ûnis, birayên hev in. Mehkûm û firarê destê Roma Reş in, dixwazin derbasî Binxetê bibin. Zavayekî wan ê bi navê Smaîlê Biro, ko ji E'şîra Lûlikan e, li gundê Girikê Boto ya Farqînê dimîne. Her sê bira radibin têne cem mala Smaîlê Biro, ango têne mala xwîşka xwe Meyremê, da ko bi alîkariya zavayê xwe binxet bibin. Leşkerên Sêrtê, Diyarbekir û Farqînê li pey wan in, teqîba wan dikin. Smaîlê Biro, ji bo ko Elî, Xelîl û Mamê derbas bikin, diçe li gundê Qoca ya ko bi ser Bismilê ve ye, Silêmanê Bego û Emînê Zînê peyda dike. Silêman û Emîn rêberên xeta Sûrî ne, mehkûm û firarên dewletê bi peretî derbasî Binxetê dikin. (Pişt re hîn dibin ko ew bi dewletê re tevdigerin, ji dewletê re ajaniyê dikin û cî û dirbên serhildêrên kurd ji dewletê re kifş dikin.) Smaîlê Biro ji Silêmanê Bego û Emînê Zînê re weha dibêje:

— Sê mehkûm hene, divê hûn wan derbasî Binxetê bikin!


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Li hev dikin û ji hev diqetin ko dotira rojê dîsa hev bibînin û mehkûman derbasî Binxetê bikin. Silêman û Emîn xwe digihînin cemseyên leşkerî û ji fermandarên wan re dibêjin:

— Bi navê Smaîlê Biro, ji gundê Girikê Boto zilamek heye ko ciyê mehkûm û asadan dizane...

Li ser van gotinên Silêmanê Bego û Emînê Zînê, leşker Smaîlê Biro digirin. Şikenceyên nebînayî pê dikin. Smaîl li pey erebeya leşkerî girêdidin û wî kaş dikin. Jê dixwazin ew ciyê serhildêr û mehkûman nîşanî wan bide. Ji ber neçariyê Smaîlê Biro gotina leşkeran qebûl dike û bi leşkeran re berê xwe dide ser kozika ko Elî, Xelîl û Mamê lê ne. Lê di vê navberê de, ev her sê mêrxas beriya ko leşker bi ser wan de bigirin, kozika ko lê ne terikandine û di ciyekî din ê newalê de xwe veşartine.

Smaîlê Biro bi leşkerên Farqînê û Diyarbekirê re li gel giregir û keyalerên (mixtar) gundên Farqînê û çend e'şîran ve dikeve Newala Qeremûsê û ji wan re dibêje:

— Min ew anîne li vê derê danine. Êdî ez nizanim ew li kû veşartî ne...

Her yek ji wan di nava newala ko tijî dar, daristan, dirrî û strî ne de dikevin pey nêçîra her sê zarên Mala Eliyê Ûnis ko Qewmê Çiyê jî ji wan re tê gotin.

Gava ko leşker di lêgerînê de ye, Elî Xelîl û Mamê xwe di nava şikefteke ko devê wê wekî tenûrê ye de veşartine. Keysa teqandina gulleyan li wan nayê. Ji nişkê ve leşkerek wan di şikefta ko xwe lê veşartine de dibîne. Yek ji wan tivinga xwe hildide ko leşkêr bikuje, leşker destê xwe dibe ber dev û çavê xwe, çawa ko bibêje, »Min hûn nedîtine«î Tivinga xwe berjêr dikin û bi serhejandinekê ji leşkêr re dibêjin, »Nexwe me jî tu nedîtiyî, biqeşte here«

Bi navê Xelîlê Mala Nasirê ko serekê E'şîra Sînikan e û bi dewletê re bi çend zilamên xwe ve tevdigere û ajaniya dewletê dike ber bi başçawîş ve dibeze û jê re dibêje:

— Welehî, wî eskerî tiştekî dît, lê çawa ko nedîtibe kir!

Fermandarê leşkerî ferman dide ko çend leşker ber bi wir ve herin bê ka kesek li wir heye, yan na.

Belê, leşkerên ko vê carê bi ser wê kozikê de diçin wekî leşkerê berê nakin, çav bi Elî, Xelîl û Mamê dikevin, tivingên xwe bilind dikin ko wan bikujin, her sê ciwanmêrên Mala Eliyê Ûnis ji wan leztir in, lê dixin leşkerê ser kozikê dikujin. Piştî deng bi tivingan dikeve, xirecir û şerekî dijwar jî pê re pê re dest pê dike.

**»Mêrikê xerîb kor e, siûda kuştiyan jî tuneye«**

Belê, dem dema serê sibehê ye. Giregira leşker, ajan û çend e'şîrên xayîn berê mîratên elemanên xwe didin Elî, Xelîl û Mamê. Heta ko reşahî dikeve erdê, gulleyan li hev direşînin. Gava ko dibe şev, leşker êgir berdidin newalê. Çarterefê wan bi cemseyên leşkerî hatiye pêçan. Ji wê demê ta îro tê saloxdayîn ko heger ber bi gundê Qeremûsê ve biçûyana, wê rizgar bibûna.

Li milekî Xelîlê Mala Nasir û fermandar, li milê din jî »Xefîr Makîneî girêdane û berê wan dane her sê mêrxasên Qewmê Çiyê.

Hecî Sidqiyê Seyîdê ji Milefa ko ji gundê Qeremûsê bû, yek ji şahidên wî şerê bi nav û nîşan bû. Ev 9-10 sal e çûye ber rehma Xwedê. Mihemed Salihê Hemê (Salih Yorulmaz) behsa mijûlahiya xwe û Hacî Sidqî yên li ser şer weha ji me re vedibêje:

— Li Newala Qeremûsê, ez û Hecî Sidqî çûn ciyê ko şer lê qewimiye. Wî ji min re digot, »Li vir wisa bûye, li wir ev hebû, nizanim esker li kû bûn?î Hecî Sidqî pişt re ji min re got: »Ez hatime vî e'mrê xwe, min di jiyana xwe de wekî wê şeva ko şer qewimîbû heyv ronahî nedîtibû. Heyv wisa ronahî bû ko, morîstang li erdê biçûna dihatin dîtin«

Belê, di wê taveheyvê de Elî, Xelîl û Mamê ji kozikên xwe derketine, him şerê xwe dikin û him jî ber bi makîneya ko leşker danîne ve dibezin ko makîneyê desteser bikin. Wisa jî dikin, çawîşê li ser makîneyê tera dikin xwarê. Diçin ser makîneyê, lê nikarin bixebitînin.

Ji ser mîrata makîneyê têne xwarê. Berê xwe didin hevraz û baz didin. ko pişta Qeremûsê li pey xwe bihêlin, wê xilas bibin. Xelîl û Mamê ji gulleyan xilas dibin. Êdî tirs ji wan re nemaye, lê Elî li paş e. Bi gulleyekê dikeve. Li Xelîl û Mamê diqîre:

— Qey hûn ê min li vir bihêlin?

Rast e! Biratî şêrîn û zor e. Li ser Elî de dadigerin. Wexta ko dadigerin, her sê li wir têne kuştin. Cinazeyên van her sê xweşmêran li pey hespan girêdidin, tînin li Goristana Farqînê vedişêrin.

Belê, wê rojê, bi mêrxasî û egîdiyeke mezin ev her sê zarên Mala Eliyê Ûnis layîqî navê Qewmê Çiyê şerê xwe dikin. Ligel ko Xelîlê Mala Nasir jî dikûjin, wendahiyên mezin didin hêzên Roma Reş û xayînên bi wan re.

Di giraniya şer de, Şêx Evdilqidusê Şêxê Zîla, ko ew jî yek ji serhildêrên kurd bû, esker li dûv wî bû jî, bi dengê tivingan re derdikeve serê Çiyayê Qîre. Serê Qire û Newala Qeremûsê li hemberî hev in. Di navbera wan de, Çemê Bişêriyê heye. Li serê Qire dengê tivingan tê birrîn. Şêx


E-POSTE: **INFO@NEFEL.COM** MALPER: **WWW.NEFEL.COM**

Evdilqidus dibêje:

— Yan xilas bûn, yan jî hatine kuştin!

Lew re jî bi ser hawara wan de nayê.

Xwendevanên hêja, niha jî em ê guhê xwe bidin kilama vê qewimînê ko ji devê xwîşka wan Emîneyê hatiye girtin. Emîne ne dengbêj bûye, ne ko wê ev kilam avêtiye ser wan. Lê ji ber ko piştî kuştina her sê birayan dilorîne, lorandinên wê ji hêla dengbêjên Herêma Xerzan û Diyarbekirê ve wekî kilam têne gotin. Min ev kilam ji çend dengbêjan guhdarî kir. Lê guhertoya ko em ê niha pêşkêşî dêhn û bala we bikin, me ji devê dengbêjên wekî Salihê Bênatî, Teyîboyê Sêrtî û Salihê Qubînê wergirt. Kerem bikin em bi hev re bala xwe bidin kilama vê qewimînê:

Ere hey lê hey lê hey lê
Hey lê hey lê hey lê hey la wayê

Emîne dibê, taqîb e Gulê Xanê rebenê
Li min û li te bêkesê li vî welatê xerîb
Em ê çawa bikin li min û li te çavrijiyayê
Kula li serê sibê bi sê kula be
Bikeve derê mala bavê Smaîlê Biro
Bekçiyê Bismilê sê pa Emînê Zînê
Îro xeber dane Qereqola Farqînê
Giran e Yedincî Qolordiya Diyarbekir
Esker giran e ketiye Newala Qeremûsê
Kanîka Temo, Aşê Reşo, Satarê Şêx Mihemed
Heste piştа Qoca heta dora Hilêliyê
Li ser peyayê mala bavê min rebenê
Ji xwex re girtine şargeh û kemînê

Ez bala xwe didimê Xelîlê Mala Nasir
Peyayekî delodîn ê çavbixwîn e
Bi orta tivingê digire
Ji destê cendirmakî dertîne
Bi sê denga li Elî û li Mamê dikir gazî
Dibê bi sê qeseman
Erke ne ji vî eskerê giran be
Îro çara we ji destê me tunîne

Peyayê mala bavê min rebenê
Tu car tan û niçan li xwe nedîne
Bi sê denga li Xelîlê Mala Nasir dikir gazî
Dibê, lawo terş û talanên bavê we
Li pêşiya me tunîne
Destê xwe tavêje qayîşa tivingê
Ji milan tîne
Dûrebînê li ber çavên xwe diedilîne
Derbekî davêje bejn û bala
Xelîlê mala Nasir
Bi şûşa dûrebînê kosteka saeta zîvîn e
Derbekî lê dixe şûşa dûrebînê
Ji ber çavê wî difirîne
Kosteka saeta zîvîn e lê dixe difirîne
Heya saqa cizmê
Di nava xwîna sor de dixemlîne

Ere hey lê hey lê hey lê
Hey lê hey lê hey lê hey axao
Emîne dibê, taqîb e Gulê Xanê rebenê
Li min û li te bêkesê li vî welatê xerîb
Em ê çawa bikin li min û li te çavrijiyayê
Heyanî em sax bin li heyata dinyayê
Giran e kula kuştiyên Newala Qeremûsê
Aşê Reşo, Kanîka Temo
Meytên nava dest û piyan
Şehîdên mezelên Silîvanya
Gulê xwehê rebênê ji dilê me dernayê

Ere hey lê hey lê hey lê
Hey lê hey lê hey lê hey axao

Emîne dibê, taqîb e Gulê Xanê rebenê
Rabe em ê bi destê hev bigirin
Xwe bavêjin tor û bextê
Keyalerên Silîvanya
Ez ê bêjim, gelî keyaleran


E-POSTE: **INFO@NEFEL.COM** MALPER: **WWW.NEFEL.COM**

Ez di bextê we û Xwedê me
Eger qisûra peyayê mala bavê min hebe
Li qisûra peyayên mala bavê min nenêrin
Ebr xerîb e ji xwe re rê nedîne

Ere hey lê hey lê hey lê
Hey lê hey lê hey lê hey axao
Emîne dibê, taqîb e Gulê Xanê rebenê
Heta em sax bin li heyata dinyayê
Em ê bêjin Lûlika ji kula dilê min re
Xweş Lûlika
Ji xêrî mala xweziyê Xwedê re
Çaxê li van peyayên mala bavê min rebenê
Lê dibû pêsîrtengî
Bila hingê ji wan re bihata
Hewara Ûnis û Evdirehman
Hirçê kezebşewitî dibê'n Qewmê Çiya
Gelî Silîvanya yeqîna we ji Xwedê bê
Weka teyrên ko îro xwe bavêje ser berata

Ere hey lê hey lê hey lê
Hey lê hey lê hey lê hey axao

Emîne dibê, taqîb e Gulê Xanê rebenê
Li min û li te bêkesê li vî welatê xerîb
Em ê çawa bikin li min û li te çavrijiyayê
Emîne dibê, taqîb e Gulê Xanê rebenê
Bejna Xelîl û Elî û Mamê zirav e
Tayek rihana li serê tehta
Ji xêrî mala xweziyê Xwedê re
Çaxê li van peyayê mala bavê min rebenê
Lê dibû pêsîrtengî
Bila hingê ji wan re bihata
Hewara Ûnis û Evdirehman
Hirçê kezebşewitî bavo Qewmê Çiya
Gelî Silîvanya yeqîna we ji Xwedê bê
Weka teyrê ko îro xwe davêje ser berata

Ere hey lê hey lê hey lê
Hey lê hey lê hey lê hey axao

Axao tu nezan î
Berxê bavê min bûyo tu nezan î
Li qeza Sason tu gula firar û eşqiya yî
Li Girkelo tu qesasê serê telesê cendirman î
Li çiyayê Xerzan tu çira bavê Elî û Evdirehman î
Diketî deşta Silîvanya
Te çima bi destê xwe agir bi xaniyê mala bavê ve danî.


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

## 8. Mêrxasekî çê û kuştineke bêbext: Behcetê Dawûd

»...Min ji nêzîk ve Behcetê Dawûd nas dikir. Serek û rêberê Êşîra Elikan bû. Ji bo min dostekî hêja bû. Di sala 1968, yan jî 69-an de, em bi hev re di Hepsa Qubînê (Bişêrî) de girtî bûn. Ji ber qirên û pevçûnên eşîrtiyê ketibû hepsê. Zilamekî nefsbiçûk bû. Dikaribû bi zarokên heft salî re rabe û rûnê. Her çi qas mezinê eşîr û qewmiyeta xwe bû jî, bi çavê mezinahiyê li xwe nedinihêrt...«

Belê, ev gotinên hanê beşek ji mijûlahiya min û Mihemed Salihê Hemê (M. Salih Yorulmaz) ye, ko me çend sal berê li Batmanê kiribû.

Bi rastî jî, hê gava ko ez 10-12 salî bûm, li gundê me Badayê (Ballikaya), di civata bapîrê min Seyîdê Mamo de, gelek caran ez dibûm şahidê mijûlahî û xeberdanên li ser şexsiyet û mêrxasên Deşta Xerzan, Welatê Serhedê û Warê Botan. Ji Filîtê Quto bigire heta Mîrzikê Zaza, Bişarê Çeto, Emînê Perîxanê, Fetah Begê Mîrê Xerzan, Çûro û Fesîhê Mihê Mîrze û behsa bi dehan navên din, di van mijûlahiyan de dihate kirin. Êdî wisa bûbû me zarokên li nava gund, li ser bênderan, li ser »Girê Ûsî, yan jî li ber »Qulateynêî, di lîstik û mijûlahiyên xwe de yek bi yek navên wan xweşmêr û Êgîdan ji xwe re hildibijart.

Behcetê Dawûd jî yek ji wan kesan bû, ko di wan civat û dîwanxaneyan de behsa wî dihate kirin. Meraqa min a li ser wî ciwanmêrî ji wan rojan tê. Lewma jî ev meraq bû sedem, ko ez li ser Behcetê Dawûd dest bi lêkolîneke bikim û ev axaftinên destpêkê derkevin holê.

### Bi feqîr û belengazan re nan dixwar!

Kerem bikin em hîn baştir wî nas bikin. Behcetê Dawûd kî bû, li ber dilê xelkê mirovekî çawa bû û bi çi awayî hat kuştin? Pişt re jî, di dawiya vê nivîsara xwe de, em ê guhê xwe bidin kilama ko avêtine ser wî û ji hêla dengbêjan ve tê gotin.

Behcetê Dawûd (Behçet Apaydin), wekî li jorê jî hate diyarkirin, serokê Êşîra Elikan bû. Her wekî ko tê zanîn, Êşîra Elikan ji çend mal-

batên wekî Mala Remo, Mala Dîbo, Mala Sîno, Cindikan û Mala Xelîlê Simê pêk tê û li Herêma Xerzan Êşîreke berfireh û mezin e. Îro bi giştî li navenda Batmanê, Misircê (Kurtalan), Qubînê; li gundên wekî Ezikê û Baxemsê bi cî û war in. Îro jî zarên wî li van deran rûdinên.

Li Qubînê, min bi çend kesan re xeber da. Min xwest ew behsa Behcetê Dawûd ji min re bikin. Mirovekî ko temenê wî li dora 50-55 salî bû, wisa digot: »...Rehmetiyê Behcet gava ko bi çend zilamên xwe ve dihat Sûka Qubînê, bi kêf û şahî gazî çend kesên li nava sûkê dikir û ji wan re wisa digot:

— Werin lawo, werin werin! Em nan bixwin!

Du sê kîlo helawa Sêrtê dikirrî û dixwest bi kesên li sûkê re bixwe. Hew qas ko nefsbiçûk bû. Di tu dewrî de nehatiye dîtin ko serek'eşîrek rabe û bi feqîr û belangezan re zorê bide nan û helawê! Welhasil, rehma Xwedê lê be, mirovekî xweş û baş bû..«

## Roja qewimîna kuştinê

Behcetê Dawûd, di rojeke 1974-an de, ji hêla kesên nediyar ve tê kuştin. Ji wê rojê heta îro jî tu kes pê nizane ew ji aliyê kê ve hatiye kuştin. Gelo kuştin çawa pêk hatibû?

Ji ber ko xwediyê du jinan bû, maleke wî li gundê Baxemsê, mala din jî li gundê Ezikê bû. Rojekê, li mala xwe yê gundê Baxemsê ye. Li malê, pîreka wî li ber dêrî nimêj dike. Behcetê Dawûd jî, li ser sedrê pal dayê û bi kurikê xwe yê biçûk re şa dibe û pê yariyan dike. Ji nişkê ve, ji paceya ko pişta wî lê ye dengê teqîna demançeyan tê. Di wê navberê de, misînekî avê jî li ber pacey ye û bi teqîna gulleyan parçe dibe û fîşek tên li pişta Behcet dikevin. Di destpêka teqînê de, tê gotin ko, ji ber ko Behcetê Dawût xwestiye kurê xwe ji fîşekan rizgar bike, ew qepaçe kiriye, lewma jî bûye hingava fîşek û gulleyan. Nexwe ne ji helwesta xelaskirina kurikê xwe bûya, îhtimal bû Behcet xwe xelas bikira. Behcetê Dawûd heya dibêje »Ha e ha« û gewdeyê xwe yê qirase bi ser kurik ve xûz dike, cercûrek fîşek bi ser û pişta wî de vala dikin. Piştî qetilkirina wî, heft fîşek ji can û bedena Behcetê Dawût tê derxistin.

## Nafî Apaydin: »Babê min qesasê zulmê bû«

Nafî Apaydin, ango Nafiyê kurê Behcet, bi temenê xwe 44 salî ye û îro li Batmanê bi cî û war e. Gava ko me jê xwest ew li ser qewimîn û kuştina Behcetê Dawûd ji me re çend tiştan bibêje, piştî keserkişandineke kûr


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

dest bi peyivînê kir: »Dema babê min hate kuştin, ez 18 salî bûm. Babê min mirovekî gelekî baş bû Her kes pê qayîl bû. Ne zalim bû, neheqiyek li kê bihata kirin, qîma xwe nedianî. Jixwe tim wî digot: »Ez qesasê zulmê me« Mirovekî dilşewat bû, li ser herkesî dilê wî dişewitî. Çend caran ji bo ko zulm nepejirand, kete hepsê« Nafî Apaydin li ser bikujên bavê xwe jî diyar dike, ko ji roja ewil heta îro ew ji bikujên bavê xwe ne haydar in: »Kekê min, wele em nizanin ji aliyê kê ve hatiye kuştin. Gelo neyarên wî hebûn? Normal e ko tim û daîm neyar û dijminên mêrikê hezkirî hebin. Şerên me Elikan bi Êşîra Reman re jî çê bûne, bi Êşîra Reşkotiyan re jî çê bûne. Her wisa gelek caran em di nava, eşîrê bi xwe de jî li hev sor bûne û di navbera me de nexweşî pêk hatine. Lewma jî em nikarin bibêjin, Behcetê Dawûd ji aliyê filan û bêvan ve hatiye kuştin«

Piştî ko Behcetê Dawûdê bavê 3 kur û 4 keçan tê kuştin, li gundê Baxemsê, ko ji berê ve wekî paytextê Êşîra Elikan e, tê veşartin. Li gorî saloxdayînên Nafî Apaydin û çend kesên ji Êşîrê, kuştina Behcetê Dawûd di nava Êşîrên derdorê û li seranserê Warê Xerzan de dengekî giran vedaye û bi sedan giregir û axa li gel bi hezaran kes beşdarî merasima cenazeyê wî bûne.

Wekî piştî kuştina bi dehan kesên xweşmêr û mêrxasên li welatê me, piştî kuştina Behcetê Dawûd jî kilam têne çêkirin û gotin. Ev kilama ko niha em ê li jêrê pêşkêşî dêhn û bala we bikin jî yek ji wan kilaman e, ko ji hêla Dengbêj Salihê Qubînê ve hatiye çêkirin û gotin. Li herêmê, ji me re hate gotin, ko Salihê Qubînê dostekî hêja yê Behcetê Dawûd bû. Beriya ko em dest bi xwendina kilama xwe bikin, kerem bikin em guhê xwe bidin Salihê Qubînê bê ka ji bo çêkirina vê kilamê çi ji me re dibêje: »Behcetê Dawûd dostekî min ê hêja bû. Me gelek caran bi hev re nan xwariye. Piştî ko hate kuştin, malbata wî ji min daxwaz kir, ko ez li ser wî kilamekê çê bikim. Ji serî heta binî qewimîna meseleyê ji min re gotin, min jî rabû ji devê pîrek û du keçên wî kilam çê kir. Di kilamê de Nisafê pîreka Behcet e, Naciye û Hafîze jî keçên wî ne..«

Fermo vê gavê jî hûn û kilama qewimînê:
Naciyayê bi sê denga gazî dikir
Dibê: Hafîze lê xweyê Nisafê lê dayê
Wezê bi reben im wezê bi rebena mêra me
Le wezê bi dêrana mêra me
Ezê bi rebena Behcetê Dawûd

Kuştiyê di xew de me dayê
Naciyayê dibê Hafîze lê xweyê
Nisafê lê dayê rebenê serê min dêşî
Çi qas dilê min di xemê de
Kuştina Behcetê Dawûd axayê şekirî
Le kêmahiya her heft bavê Elikan
Heyfa her kesî lê tê
Ji xêra mala xweziyê Xwedê re
Çaxê li Behcetê Dawûd li axayê şekirî
Dibû pêsîrtengî
Bila tê de derketa serê cotê kura
Le weka şerê mîrek û çerkezan
Şer xweş bikirana li odê de
Le belgî li ser cinazê bavêm
Çend hebekî bikuştana di ber heyfê de
Na wile ji ber û pismaman tê de derketa
Serê Xelîlê Dawûd çi mîna ye mîna
Gurê nav keriya ye
Le mêran bikuşta şopê rast bikira
Weka şopa ziya
Le wezê bi reben im
Wezê bi rebena mêra me
Le wezê bi dêrana mêra me
Ezê bi rebena Behcetê Dawûd
Kuştiyê di xew de me dayê

Le Naciyayê dibê Hafîze lê xweyê
Nisafê lê dayê rebenê sibe ye
Serê min dêşî çi qas dengê bê tê
Le seet li nehê şevê û pê de
Li goyê me xweş tê
Dengê mîratê Balçîqa û Teqarifa
Ji bireka bavê min rebenê ji rexê Zêwikê tê
Kuştina Behcetê Dawûd axayê Elikan
Le kêmahiya her heft babê Elika ye
Lawo heyfa her kesî lê tê
Kesekî xwedanî xêra tunene


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Cewabekê bide Sêrtê
Le bêje Şefîq mala te xirab be
Kuştine Behcetê Dawûd
Axayê şekirî di xewê de

Naciya dibê Hafîze lê xweyê Nisafê lê dayê
Serê min dêşî çi qas dilê min di xemê de
Serê dilê min bi kul e bi derd e
Weka mîla seetê çi qas lê de
Seet li nehê şevê û pê de
Li goyê min xweş tê
Dengê mîratê Balçîqa û Teqarifa
Ji bireka mala bavê min rebenê
Ji rexê Zêwikê ve diteqiya
Ezê bi reben im rebena mêra me
Ezê bi dêrana mêra me
Ezê bi rebena Behcetê Dawûd
Kuştiyê di xewê de

## 9. Ji Deşta Xerzan mêrxasekî çê: Bişarê Çeto

Bişarê Çeto ji Deşta Xerzan, serekê eşîra Pencînaran bû. Ne bi tenê li Herêma Xerzan, her weha li seranserê bakur û rohilatê welêt, qismek jî li Başûr û li Binxetê jî tê naskirin. Di dem û dewrana xwe de, dibe mehkûmê Roma Reş. Di vê mehkûmiya xwe de, derbasî Herêma Bişêriyê, ko dorhêla Qûbînê û Reşkotan jî jê re tê gotin, dibe. Li vê herêmê, demeke dirêj li nava eşîra Sînikan, li gundê Zercilê dimîne û xwe vedişêre.

Rojekê ji rojan, di xewê de, cendirmeyên Romê bi ser gund de digirin û Bişarê Çeto digirin, dest û lingên wî dixin kelemçe û qeydan û bi xwe re dibin diavêjin Hepisxaneya Bilîsê.

Çetoyê bavê Bişar rojekê radibe diçe Bilîsê, dîtina wî. Çeto di hevdîtina xwe ya bi Çeto re ko li girtîgehê pêk tîne de, tanan lê dibarîne. Sedema van tanan jî ew e, ko pêlî damarê mêraniya Bişêr bike, ko riyeke xwe bibîne û bi awayekî ji hepisxaneyê derkeve, ango bireve.

Ev diyaloga hanê ko di nava Bişar û Çeto de derbas bûye salan e ko, li çar parçeyên welêt, kilamkî ji hêla dengbêjan ve têye gotin. Kerem bikin vê gavê em dêhn û bala xwe bidin vê diyaloga ko kilamkî tê gotin:

Çeto dibê: Bişaro lawo
Bejna Bişarê Çeto, Bişarî Axê
Kulîlka li nava kûnciya
Hêşîn dike
Li Gozelderê, li Marîbê, li ‘Eynqesrê
Li Kêşa Xerzan, li Birinciyan
Dema ko Bişarê Çeto Bişarî Axê
Dibû mehkûmê serê çiya
Gelekî dilê min
Bi rehma Xwedê xweş bû
Min digo qê wê bigîje eskerê Eliyê Ûnis


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Bibe Qewmê Çiya
Min nizanibû ji axe û axelera
Xwe girtiye Hesoyê Birahîm
Axayê Bişêriya
Roj li nîvro du heb cendirmê Romê
Bi destî Bişarê Çeto, Bişarî Axê girtin
Wî derxistin ji nava ciya û balgiya
Destê wî xistine darê kelepçê
Berê wî dane Hepisxana Belîsê
Li qarşî Seraya Hikûmatê
Destê xwe avêtine kosteka saeta
Ji berîka te deranîn
Ji gotinê 'alemê lawo
Destê xwe li hev didan
Lawo ji xwe re bi te keniyan

Ji ber vê kilama bi tan, ko Çeto li kurê xwe Bişêr dike, dibe sedema acizbûna Bişêr. Hew maye ko deriyê şîş ê di navbera xwe û bavê xwe de bişikêne. Radibe, li bavê xwe Çeto weha dadigerîne:

Bişar dibê: Çeto babo, Xwedê dihebînî
Tu henekan bi min neke
Belgî Xwedê û Rebê Alemê
Tû car ya bêkeysî bi serê
Tu kurê camêran ve neke

Babo qê bîra te nayê
Li bîra xwe bîne
Roja destê bavê min
Li darê kelemçê de bû
Di pêşiya Mifirza Sêrtê de bû
Ew roj min dest hilanî
Min avête derênca Têlanê
Pêşiya Mifirza Sêrtê

Min başçawîşa dikûştî
Li ser cendekê yûzbaşiyan danî

Bi kotek û darê zorê
Bi devê fidaiyê
Min babê xwe ji pêşiya
Mifirza Sêrtê deranî
Kûm û kolozê babê min
Di nava bêlûka Romê de mabû

Min kûm û kolozê babê xwe
Ji nava bêlûka Romê deranî û anî

Babo qê bîra te nayê
Roja Şerê Kelemerana şewitî
Min ecêb û sosreteka giran
Bi serê Mihemedê Bişar ve tanî
Min derbekî dabû li bejn û bala
Xelîlê Mihemed, li babê Cemalê
Li Teharê Zêrê li zavekî salê
Min tovê xweşmêra ji mala
Mihemedê Bişar danî

Babo qê bîra te nayê
Li bîra xwe bîne
Mehîna Fetah Begê Mîrê Xerzan
Li Mêrga Bizêziyê
Min berê sûstemê danî ser mifta qeydê
Şikand û dingan de ji te re anî
Babo Xwedê dihebînî
Henekan bi min neke
Te rihê min bi tan û niçan deranî

Çeto dîsa berê xwe dide kurê xwe Bişar, vê kilamê jê re dibêje:

Çeto dibê: Bişaro lawo
Ez ê bi diyarî Girê Berana diketim
Bi kizin e
Tivinga li ser destê
Bişarê Çeto Bişarî Axê


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Bi sê toq e bi sê bazin e
Ez gelekî caran di odekê
Kurê camêran de dirûniştim
Ez bi te dipesinîm min digota:
Bişarê Çeto kurê min e
Ji tirsa du heb cendirmê Romê
Te kulav li xwe kir
Ji xwe re bûyî şivanê bizina

Ev tan ji Bişarê Çeto re li gorî tanên din girantir e. Hindik maye xwe li pişt şivên hesinî yên hepsê bixe. Hew xwe digire û li bavê xwe Çeto vedigerîne:

Bişar dibê: Çeto Babo, Xwedê dihebînî
Henekan bi min neke
Tu here li Qesra ‘Eynqesrê rûne
Tembiyekî li Gula bûka xwe ke
Bila rojeka weka roja gorişmê
Bila şar û xêliyê xwe li xwe ke
Demançê li cêba xwe ke
Roja gorişmê
Li qarşî Seraya Hikûmetê
Bila bîne demançê bi destê lawê te ke
Bila wê rojê bitûnê axe û axeleran
Bi topa ‘alema Belîsê ve
Wê rojê were temaşa lawê xwe ke
Ez ê wê rojê bi îzn û îrada Rebê xwe kim
Ez ê destê nobetçiyan, midûran, qirdiyanan
Temamî bi qeyd û bi lele kim
Ez ê deriyê Hepisxana Belîsê
Li topa girtî û mehkûman vekim

Piştî van gotinên Bişêr, Çeto vedigere gundê ‘Eynqesra qesra eşîra Pencînaran lê ye, hal û medê kurê xwe Bişêr ji jina wî Gulê re dibêje. Gulê jî radibe, cilên xwe girêdide, demançeya çardexwir li pişta xwe girêdide û berê xwe dide Hepsa Bilîsê. Gulê gava hevdîtina bi Bişêr re bi dizî demançeyê dispêre mêrê xwe Bişar.

Belê, rewşa çûyîna Gulê bo Hepsa Bilîsê, ko çawa demançeyê dide destê Bişêr û pişt re jî çawa Bişar di hepsê de serhildan dike, tevahiya rayedar û leşkerên li hepsê hêsîr û dîl digire û girtî û mehkûman dide berdan, di kilama ko me ji devê dengbêjên wekî Teyîboyê Siertiyê Misircê û Salihê Qûbînê girtiye de, weha tê gotin:

Dilê min evdala Xwedê keto meto
Min dît Gula Bişar şar û xêliyê xwe
Li xwe kir ji mal derketo
Berê xwe daye Hepisxana Belîsê
Li qarşî Seraya Hikûmatê
Roj li nîvro
Demançe da destê Bişarê Çeto
Sibe ye ez ê diyarî
Hepsa Belîsê diketim li kaşa
Tilî û pêçiyê Bişarê Çeto, Bişarî Axê
Xalî nabe ji gustîla sê payî ji qaşa
Hepsa Belîsê têr î tijî ye
Xilas nabe
Ji tirka, ji kurmanca, ji axe û axalera
Ji teketûkê qizilbaşa
Bişar di ‘eynî deqê de
Gazî dikir li topa erqedaşa
Temamî destê xwe li hev didan
Digotin: Yaşa ji te re Bişar Axao, yaşa
Ji wê rojê hetakî weka îro
Yazmîş bûye li paytextê tirko
Li Xopana Enqerê
Li qapiyê Hepsa Belîsê qeyd bûye
Li kitûkê Mistefa Kemal Paşa

### Ciyawaziya di navbera Bişarê Çeto û Cemîlê Çeto de

Bişarê Çeto û Cemîlê Çeto birayê hev bûn. Lê, li gorî ko min bi pismam û zarokên neviyê wî re xeber da, wekî neqeba çiyayan ferq û meylî di navbera Bişar û Cemîl de hebûye. Bişar her awayî ji Cemîl bişereftir, binamûstir û xîretkêştir bû. Tim û daîm Bişar bi şerefî di navê de hatiye behskirin. Lê, berevajî vê yekê, Cemîl her tim bi nebaşî, bi zexelî û bi


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

rûreşiyê hatiye nîqaşkirin. Li hêla din, ligel welatperweriya Bişarê Çeto, Cemîlê Çeto her gav li cem dewletê cî girtiye û dema Mistefa Kemal hatiye Sêrtê, li ber Çemê Botan, milê Kezerê çûye xêrhatina wî û mil dane hev.

Her çend di xortaniya xwe de Bişar hinek çewtî û qeletî kiribin jî, piştre van kêmasiyên xwe ji holê radike û di derdora xwe de bi welatparêzî û bi misilmaniya xwe nav dide. Gelek caran bi eşîrên û babikên girêdahiyê xwe û eşîrên derdora xwe re, li hemberî Roma Reş serî radike. Bi taybetî mêrxasiya wî ya ko di Şerê Mala Eliyê Ûnîs Qewmê Çiyê, ko bi dewletê re kirine de, şayanî pesndayînê ye. Li ser vî şerî jî, bi dehan dengbêjan kilam avêtine ser vê qewimînê û qewimîn û serpêhatiyên wî. Yek ji van qewimînan jî, beşdarbûna wî ya Şerê Ûris û di vî şerî de kuştina wî bi xwe ye.

**Şerê Ûris û kuştina Bişarê Çeto**

Rehmetiyê Şêx ‘Emerê apê bapîrê min Seyîdê Mamo bi Bişarê Çeto re diçe seferê, ango diçe Şerê Ûris. Li gel Şêx ‘Emer û Bişarê Çeto ji Herêma Xerzan çend navên din ên bi hev re tevî vê seferê bûbûn, Şêxê Zoqeydê Seyda û Şêx Hezretê Şêxê Norşênê, Şêx Hiseyn bûn. Her weha, bavê bapîrê min Seyîd Mihemed û du apên wî yên din jî diçin vê seferê. Dema ko ev camêr dikevin rê ko herin pêşiya Ûris, Cemîlê Çeto bi hêstireke sor tê di ber wan re derbas dibe, ji xwe silava Xwedê jî li wan hilnade. Leşkerê Ûris jî, hatiye nava axa welêt û ketiye nava bajarê Bilîsê, hindava »Kevirê Qul«.

Bi rojan bi leşkerên osmanî re, li dijî leşkerên Ûris şer dikin. Konên wan û yên Ûris ji hev xwiya dikin. Rojekê serê sibehê, Bişarê Çeto radibe ji çadira xwe derdikeve. tivinga wî di destê wî de ye. Hezret û Seyda gazî dikin û dibêjin: »Bişar, were va ye xwarin hazir e, were xwirîniya xwe bike!« Bişar li wan vedigere û ji wan re weha dibêje: »Bi serê we, ez vê sibehê heta xwirîniya xwe bi van ûrisan nekim, ez çend heban ji wan nekujim, ez nan naxwim!« Di vê navberê de, dêhna xwe didinê ko, ji leşkerên Ûris sê heb bi serê hêstirên xwe girtine û wan dibin serê avê. Bişar du gulleyên tivingê diteqîne û ji wan du leşkeran tera dike xwarê. Dibêjin, gava ko tiving teqiya, du leşkerên Ûris li ser hêsanê piştê li erdê dirêj bûn, ji aliyê Ûris jî gulleyek teqiya û li nava her du birûyên Bişêr ket û Bişar jî li wir ket û mir.

Piştî ko Bişarê Çeto li Geliyê Bilîsê, li hindava »Kevirê Qul« tê kuştin, cenazeyê wî tînin û li Gozelderê, ko yek ji gundên wî ye, vedişêrin. Piştî

ko şer diqede, çend ji wan seferçiyên ko ji Xerzan çûbûn, wekî kesên bi navê Şêx Hiseyn û apê bapîrê min Şêx 'Emer, vedigerin tên gundê xwe. Lê, li gel bavê bapîrê min û apekî wî, Şêx Ûsûr û çend navên din jî, ji vê seferê danagerin. Ji wê rojê ta îro tu kesî ji wan tu his û deng wernegirt. Jixwe ji ber ko bavê bapîrê min û apekî wî diçin vê seferê û nayên, bapîrê min Seyîd, ko hê çend mehî bûye, bavê xwe hîç nedîtiye. Ji ber ko bapîrê min li cem apekî xwe mezin bûye, navê wî jî bûye »Seyîdê Mamo«.

Derwêşê Sado:«Bapîrê min mêrxas û welatparêz bû.«

Yek ji avakarên PDK'a Bakur, Derwêşê Sadoyê ko niha li Misircê (Kurtalan) bi cî û war e neviyê Bişarê Çeto ye. Derwêşê Sadoyê tim û daîm bi mêrxasî û welatparêziya bapîrê xwe Bişarê Çeto dipesinîne berevajî van agahiyên li ser cî û sala kuştina ko me li jorê pêşkêşî dêhn û bala we kir weha dibêje: »Di sala 1914-an de, li bajarê Xoyê, navçeya Istîkanê, gundê Rehayê, rohilatê welêt bapîrê min Bişar bi guleyeke leşkerên Ûris hat kuştin. Vê gavê qebra wî bûye ziyaretgah û her sal bi sedan kes diçin serdana wî.«


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

## 10. Dîroka ko di çiyayê Sason û şikeftên Karmelîhê de hatê neqişandin: Raperîna Mala Elîyê Ûnis

Mala Eliyê Ûnis, di dîroka me kurdan de, wekî Qewmê Çiyê jî tê naskirin. Bi rastî jî, ev malbat di warê serhildan û raperînên xwe yên welatperwerî de şayanî pesindariyê ne. Bêyî ko navber bixine navê, li dijî Roma Reş 12 sal şer meşandine û li ber wan serî netewandine.

Qewmiyeta Mala Eliyê Ûnis cara yekemîn di sala 1925-an de, ko di heman salê de nav û dengê Serhildana Şêx Seîd li her derê deng daye, dest pê kiriye û heta dawiya sala 1937-an berdewam bûye.

Tê saloxdayîn ko, di Şerê Şêx Seîd de, eşîrên Hezo (Kozluk), Misircê (Kurtalan) û Sasonê bi Şêx Seîd re peymana bihevrebûnê girêdidin. Li gorî vê peymanê, wê li ser Pira Malabadê rê li ber leşkerên Romê bihata girtin û bi vê yekê re jî wê têkçûyîna leşkerî pêk bihata. Lê, wekî ko bav û bapîrên me, di civat û dîwanxaneyên xwe de gelek caran bi dengên nizim û lerzokî ji me re gotine, bêbextî û gafilbûna hinek eşîran bûye sedem ko, ev serhildan jî têk biçe û rê li ber kuştin, girtin, rev, koçberî û karesatên din bê vekirin.

Gelo van eşîrên me yên bê bext vê carê çi kiribûn ko, dîsa kuştin û girtin; rev û fermalûbûnê xwe li can û cesedên me kurdan pêçabû? Baweriya mezin a di nava gelê li Herêma Xerzan de ew e ko, ji Misircê Mala Faro (Mala Cemîlê Çeto), ji Sasonê eşîra Xiyan û ji Hezoyê jî eşîrên Bekirî û Şêxdodî beriya ko serhildan dest pê bike û li ser Pira Malabadê hêza xwe bikin yek, dest û piyên xwe ji serhildanê vedikişînin. Ev karesat jî dibe sedem ko, leşkerên Diyarbekir û Bilîsê bi du milan ve bikevin nava Hezoyê û serhildanê bişikênin.

Her çend ev her çar eşîr bi xayîntî û bi bêbextî dest ji serhildanê kişandibin jî, Mala Eliyê Ûnis, eşîrên Belekî, Mûsî û Sormiyan, ko wekî serhildêrên Sasonê têne naskirin û ji bo parastina Hezoyê hatine wezîfedarkirin, xwe ji serhildanê nadin alî, li ber xwe didin û nahêlin ko Kela Hezoyê bikeve destê leşkeran.

Niha jî, ji vir û pê ve em dêhn û bala xwe bidine beşek ji gotinên bûka Eliyê Ûnis, Pîrê Wesîleya ko di sala 1998-an de 92 salî bû: »...Leşkerên Romê ketin heta nava Hezoyê. Ji ber ko em nikaribûn ji nava kelê derkevin, xwarina me jî nemabû. Êdî ne mumkûn bû em di nava kelê de bimînin. Ji ber vê ye kêserkêşê serhildanê Evdirehmanê Eliyê Ûnis qirar da em derkevin serê çiyê. Em derketin serê çiyê... Ez ne şaş bim, jiyana me, di navbera salên 1925-1930'yî de li serê çiyê derbas bû. Gelek mirovên me, bi tenê ji ber mirovatiya me û ji ber ko nan dan me, dibûn hingava êrîşên Romê. Wê gavê 38 kesên ji gundê Tiropêya Hezoyê, ko ji Mala Eliyê Ûnis bûn, piştî ko destên wan bi daran ve girêbidin, hatin gulebarankirin û kuştin...« (N. Adsan, Ek Gûndem, hej 37, Adar 1998)

Ev kilama ko em ê niha pêşkêşî dêhn û bala we bikin di nava dengbêjên welatê me de, ji aliyê Salihê Bênatî, Teyîboyê Misircî, Salihê Qubînê û Miradê Kinê (Miradko) ve tê gotin. Lê, li gorî saloxdayînan û li gorî ko min guhdarî kiriye, tu dengbêj nikare vê kilamê wekî Miradko xweş û baş bibêje. Lê, ji ber ko guhertoya ko ew dibêje û yên dengbêjên din di kasetan de baş nedihate guhdarîkirin, me ev guherto ji devê Dengbêj Salihê Qubînê wergirt.

Kilama Mala Eliyê Ûnis

Ferman e ferman e ferman e
Fermana serê şêxan û melan e
Darê Îstiqlalê li Diyarbekirê bi cî dane
Emrê vê fermanê li jorê bi destê Xweda ye
Li xwarê li gorî qanûnê tirka ye
Tu li çar terefê dinyayê bigerî şer e
Di Çiyayê Sasonê de
Qetl e qitûl e êxir dewr e
Axirêzeman e
Tim û biharan û payîzan
Fermana li serê me kurdan e

Bavê Mihyedîn bi sê denga
Li birrek peyayê Mala Şeref dikir gazî
Li Mistê li Ûnis li Şêxo li Derwêş
Ronîka çavê min Evdirehman e


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Bavêminbûno
Hûn ê li Hezo û Melefa nexin
Miletê Hezo û Melefa reiya ne
Em ê îro Hezo û Melefan
Ji xwe re bikin xestexane
Xwe li ser Pira Serendê
Xwe li ser pêşiya tabûra Zekî Begê
Xwe bigihînin jê bikin
Serê zabîtan û qûmandaran e
Em ê hê bikin rayîna Mihyedîn û Rindîxan e

Ferman e bavo ferman e
Li çar terefê dinyayê bigerî şer e
Li Çiyayê Sasonê qetl e qitûl e
Axir dewr e êxirê zeman e
Tim û biharan û payîzan
Fermana li serê me kurdan e

Babê Mihyedîn bi sê denga
Li birrek peyayê Mala Şeref dikir gazî
Li Mistê li Ûnis li Şêxo li Derwêş
Ronîka çavê min dîsa Evdirehman e

Bavêminbûno li nefera nexin
Heçî nefer in emirqûl in
Çavê dê û bavê wan e li riya wan e
Hûn ê çavê xwe bigerînin
Li şewqemezinan li terfîliya
Ayildizî li ser milê wan e
Xweyê miaşê giran e
Çavê wan li aferiman e
Em ê îro hilînin heyfa
Feqîr û meqîrên Omeriyan e

Ferman e bavo ferman e
Îro li darika Hezo û Melefa
Xweş tê girrînî teyaran xirênî cîban e

Di pozê Kopeko de xweş tê şîqînî bimban e
Di Şikeftên Karmelîhê de
Xweş tê hermênî topan e
Di singê gelî de xweş tê
Qîjînî çapliyên me kurdan e
Pirkênî kurê bavan e
Xwîn hiltîne leşan e
Tim û biharan û payîzan
Fermana li serê me kurdan e


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

## 11. Ji zargotina welatê Serhedê mînakeke sosret, malkambaxî û şerê xal û xwarziyan: Şerê Xûrûcê

Mala Tûdiyan û Zarên Rehîmê li Welatê Serhedê, li gundê Xûrûcê, ko bi ser Mûşê ve ye, bi cî û war in. Ji ber nexweşî û gengeşiyeke biçûk berê wan dikeve hev û li gorî saloxdayînan, zêdetirî 50 mirovî ji hev dikujin. Îro li seranserê welatê me, ji ber ko şer û pevçûneke pirr mezin û navdar e, dengbêj û kilambêjên ko hay ji vê qewimînê nîn be mirov nikare peyde bike. Şerê Xûrûcê her wekî »Şerê Xal û Xwarziyan« jî tê binavkirin. sebûneta şer bi vî awayî pêk hatiye:

Ji Mala Tûziyan û ji Zarên Rehîmê çend xort li ser gola avê bi hev re kevir diavêjin beqê. Bi kevirên xwe beqê dihingêvin. Xortên herdu aliyan jî dibêjin, beq bi kevirên wan hatiye kuştin. Ji ber vê nîqaşa beredayî, li hev sor dibin, berê wan dikeve hev. Pevçûna li ser gola avê li nava gund jî bi awayekî girantir didome. Di şerê di nava gund de, ji Mala Tûziyan du kesên bi navê Kerem û Yasîn têne kuştin. Ev yek jî dibe sedem ko Mala Rehîmê ji gund derkevin. Çendek derbas dibe, eger şêx, eger axa, eger giregirên dorhêlê, dikevin navbera wan û Mala Tûziyan û Mala Rehîmê li hev tînin. Belê rast e, tê gotin ko, »Gava dijmin û neyarên hev li hev bên, ji hev bizewicin, di navbera wan de kîn û çavsorî namîne.« Ji ber vê yekê jî, bi navê Dirşayê, xwişkeke Mihemed Emînê lawê Rehîmê heye, radibin didin Emerê Tûdî. Her çi qas Emerê Tûdî kalemêr e jî, Dirşayê didinê. Emerê Tûdî jî, li ser xatirê lihevhatinê radibe du heb qîzên xwe dide zarên Rehîmê. Qîzeke xwe dide Mihemed Emîn, ya din jî dide Ehed.

Sal û zeman derbas dibin. Xwedê zarokek daye Dirşayê, ko emrê wî li dora 15-16 salî ye. Navê kurik Silhedîn e. Xort û zarên Mala Tûziyan li hev dicivin, her çi qas di navbera wan de aştî çê bûye û 16-17 sal jî di ser re derbas bûye jî, biryar digirin ko heyfa xwe hilînin. Mala Rehhimê jî, her çi qas di kar û barê xwe de bin jî, ji ber ko du kes ji Mala Tûziyan kuştine, xwedî tevdîr bûne. Xortên wan ji metên xwe re, ko pîrekên

Mihemed Emîn û Ehmed in, lê qîzên Emerê Tûdî ne re dibêjin:

— Divê hûn fîşekên mêrên xwe, ko li malê ne, veşêrin!

Pîrekên wan jî radibin li gorî xwesteka zarên birayê xwe, bi bêbextî û xayîntî, sindoqa fîşekên mêrên xwe dibin û di binê loda kayê de vedişêrin. Eynî rojê jî bi hinceta beravê ji malê derdikevin, ko di qewimîna şer de zilamên wan ji wan pirsiyara sindoqa fîşekan nekin.

Welhasil, wê rojê di nava gundê Xûrûcê de dîsa şerê giran derdikeve. Tê saloxdayîn ko, cara ewil kilama vê karesatê ji hêla Seyda Mele Evdilkerîm ve hatiye gotin. Lê min ev kilam ji devê Şakiro, Salihê Qubînê û Zahiroyê Dengbêj jî bihîstiye. Niha jî em guhê xwe bidin dengê dengbêjê navdar Zahiro, ka wê roja qewimîna şer çawa ji me re bibêje:

Dayê dêran were dêran
Îro bayê Xûrûcê bi ser Mala Rehîmê da girtine
Kirine kafirstanî bila gur nebînin dêran
Evdilbaqî berxê mala Tûziyan bi sê denga
Li lawê Rehîmê dikir qêrîn e
Dibê xalo ji par va panotek perê min li te ye
Tu yê panotê min ê pera bîne

Mihemed Emîn bi sê denga li Evdilbaqî
Li berxê Mala Tûziyan kir qêrîn e
Dibê serê çil û çicûxê min bixwe
'Ilm û egayê min di panotê hûr da tunîne
Bi sê denga li Şerbet Xanima qîza xwe kir qêrîn e
Dibê: Şerbet Xanimê, lawo tu rabe lez ke bilezîne
Cozdanê pera ji cêba çakêt derîne
Şerbet Xanimê lez dike dilezîne
Cozdanê pera ji cêba çakêt dertîne
Cozdan bi destê babê xwe digihîne
Deh panota jê dertîne
Bi ser Evdilbaqî berxê Mala Tûziyan va dişîne
Dibê, serê çil û çicûxê min bixwe
'Ilm û egayê min di panotê hûr de tunîne
Ha ji te ra vî deh panotî


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Gava tu çûyî Kela Melazgirê
Vî deh panotî hûr bike
Panotê xwe jê hilîne
Neh panotê min ji min ra gêrî bîne

Evdilbaqî berxê Mala Tûziyan
Bi sê denga li lawê Rehîmê kir qêrîn e
Dibê satêşa pera li cem min tunîne
Kula min ne panotê pera ye
Axîn û oxîna min kuştina Kerem û Yasîn e

Dema wisa dibêje, hişê wî xweşmêrî diçe
Aqilê wî namîne
Bala xwe bidinê van xweşmêran
Bi hev ra destên xwe li pişkovên demança digerînin
Mihemed Emîn lawê Rehîmê
Gullekî li bejn û bala Evdilbaqî
Berxê Mala Tûziyan dixîne
Cenazê vî xweşmêrî li erdê dikeve
Serê wî pê va tunîne

Berfo ji taxa jorî xwe berda taxa xwarî ne
Cenazê Evdilbaqî berxê Mala Tûziyan
Li serê mêrga Mala Rehîmê dibîne
Kesekî li ser cenaze tunîne

Berfo li nava serê xwe dixist
Bira bira ji xwe re dikir qêrîn e
Emêrê Tûdî kalê heftê heştê salî
Nexweş e di nava ciya da ye
Gava dengê girîna Berfo dibihîze
Bi sê denga li Gulnaza qîza xwe kir qêrîn e
Dibê: Gulnazê, lawo tu bisekine
li derê malê
Bêje, Berfo xweyê negirî, bavê me sax e nemiriye
Tiştekî bavê me tunîne
Temamî gundiyan li dorê rûniştî ne

Gulnazê dertê disekine li derê malê
Dibê, lê lê Berfo, xweyê tu negirî melorîne
Wele bavê me sax e nemiriye
Tiştekî bavê me tunîne
Temamî gundiyan li dorê rûniştî ne

Le Berfo bi sê denga
Li Gulnaza xwişka xwe kir qêrîn e
Dibê: Lê lê Gulnazê, xweyê
Heyfa min li mirina
'Emerê Tûdî kalê heftê heştê salî nayê
Heyfa min tê li wê heyfê
Le cinazê Evdilbaqî berxê Mala Tûziyan
Li serê mêrga mala Rehîmê dimîne
Kesekî me li ser cenaze tunîne

Le gava Emerê Tûdî vê gotina hanê
Ji devê Berfo hiltîne
Yê ko nizanibe wê sond bixwe bi Qûrana Nebî ne
Navê êşê li dora vî zilamî tunîne
Bi sê denga li Heydo û Silhedîn
Li herdu lawê xwe kir qêrîn e
Herdu li balê sekinî ne
Destê xwe li pişta livîna dixînin
Du heb Ingilîsên sêzdederbî bavo
Ji pişta livîna dertînin dayê

Dibê, lawo erebên me tên
Ji Erzeroma rengîn e
Li ser barên ereban
Tenekên qazyax mazot û benzînê
şidandî ne
Bi çend malên Tûziyan bikevin
Sê çar tenekên qazyax mazot û benzînê
Ji bavê xwe ra bîne

Ew lez dikin dilezînin


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Xwe li malên Tûziyan digihînin
Sê-çar tenekên qazyax mazot û benzînê
Ji bavê xwe ra tînin
Xwe bi Mêrga Kozê digihînin
Sê-çar piştiyê çilo ji bavê xwe ra tînin
Îro hersê zarê Rehîmê dêxin xênî
Agir bi xênî va datînin
Ji Mala Rehîmê dikişin agir û pêtî ne

Dirşa digirî dilorîne
Ji xwe re pêgermokê digerîne
Xwe bi ser kuleka xênî digihîne
Devê xwe kir kulekê
Dibê: Birawo Emîno birawo Ehmedo birawo
Fayîqo nemawo
Ka bêje halê we ye çi heye çi tunîne

Dibêj'n: Dirşa xweyê halê me mirin e
Halê me tunîne
Di destê me de tivingên bêşlî ne
Sirmê wan ê qelabtî ne
Ji siba Xwedê va digerim nagerim
Fîşek di xênî da tunîne
Ji jor da agir girtiye kêranên xênî
Çîkên agir xwe berdidin ser devê birînên
Fayîq û Ehmed dişewitîne
Ehmed tîne tasekî avê ji min dixwaze
Halê wî ji ber birînên wî tunîne
Xwedê xira bike îro peşke av di xênî da tunîne
Tu rabe lez ke bilezîne
Xwe bi derê mala Xelîlê cînar bigihîne
Bêje: Xelîl, ez di bextê xîret û namûsa te ketime
Silavên kekê min ji te ra hene
Bila pakêtek fîşek ji kekê te ra bişîne
Êvarê xwe berde pêşiya garana Xûrûcê
Çar heb madeka çar heb qazanê cot
Bila ji ber pakêtê fîşekê xwe va bîne

Dibê, Dirşa lez dike dilezîne digirî dilorîne
Xwe bi derê mala Xelîlê cînar digihîne
Dibê, Xelîl ez li bextê xîret û namûsa te ketime
Silavên kekê min ji te ra hene
Tu pakêtek fîşek îro ji kekê min ra bişîne
Êvarê xwe berde pêşiya garana Xûrûcê
Çar heb madeka çar heb qazanê cot
Ji ber pakêtê fîşekê xwe va bîne

Xelîlê cînar sond dixwe bi Qûrana Nebî ne
Dibê, ‘ilm û egayê min
 di fîşeka de tunîne
Dirşa dîsa digirî dilorîne pêgermokê digerîne
Xwe bi kuleka xênî digihîne
Devê xwe dixe kuleka xênî
Dibê: Birawo qey tu nizanî
Xelîlê cînar xayîn e
Fîşekan ji te ra naşîne
Sond xwariye bi Qûrana Nebî ne
Dibê, ‘ilm û egayê min
 di fîşeka de tunî ne

Mihemed Emîn e dibê:
Ji min û ji Xelîlê cînar
Xwedê kurê derewînan bikuje
Şevê din êvarê min pazdeh pakêt fîşek
Ji Xelîlê cînar ra kirrîne
Lê Dirşa halê me mirin e,
 halê me tunîne
Tu rabe lez ke bilezîne
Xwe bi Qereqola Elî Mele Beyreqdar bigihîne
Sê çar cendirmên siwarî
Bi îmdada kekê xwe va bîne
Bila heyfa Evdilbaqî berxê Mala Tûziyan
Beranê qemer li ‘erasa meydanê bibîne
Çardeh nifûsê mala bavê te di xanî de dimîne
Bila yek li ser ajara mala bavê te bimîne


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Dirşa digirî dilorîne
Xwe bi ser riya qereqolê digihîne
Felata wê ji Heydo û Silhedîn pîçê wê tunîne
Heydo û Silhedîn xwe li pêşiya Dirşa digihîne
Milê rastê dişikîne li ser pêsîra çepê datîne
Halê vê hermetê ji ber birînên wê tunîne
Dibê: Silho çavê xwe kor neke
Ajara mala xalê xwe ji dinyayê neqelîne

Silho dibê, dayê min sond xwariye
Bi Qûrana Nebî ne
Ji vêga heta banga mexrebê
Ez ji atara mêran di mala bavê te da bînim
Kokê mêran ji mala bavê te bikim derman e
Dirşa digirî dilorîne pêgermokê digerîne
Halê vê hermetê ji ber birînên wê tunîne
Ha nayê ha nayê
Hewarî dûr e bavo gazî nayê
Hewara xalan dûr e
Çima di hewara xwarziyan da nayê
Ez ê bi nava gundê Xûrûcê diketim
 bûye kafirstanî
Çardeh nifûsên Mala Rehîmê
Di xênî de dişewitin
Kesekî xwedanê xêra tunîne
Di hewarê de nayê
Dirşa digirî dilorîne
Xwe bi ser kuleka xênî digihîne
Devê xwe kir kulekê dibê:
Birawo ez pîrek im darê şikestî me
Felata min ji destê Heydo û Silhedîn
Her du pîçê min tunîne

Dibê: Dirşa, dêranê halê me mirin e
Wele halê me tunîne
Di destê me de tivingên bêşlî ne
Sirmê wan ê qelaptî ne

Ez digerim nagerim Xwedê xirab bike
Fîşek di xênî de tunîne
Xwe li mala Xelîlê cînar bigihîne
Bêje: Xelîl li ber xîret û namûsa te ketime
Ha ji te ra cozdanê banqê
Bide destê Xelîl bêje:
Hijdeh hezarê kekê min
Li banqa Kela Melazgirê ne
Bila ji ber pakêtê fişekên xwe va bikişîne

Dirşa cozdanê banqê hiltîne
Xwe bi derê mala Xelîl digihîne
Ji nava serê xwe kir qêrîn e
Dibê: Xelîl ez li ber xîret û namûsa te ketime
Silavên kekê min li te ne
Tu yê îro pakêtek fîşek ji kekê min ra bişîne
Ha ji te re cozdanê banqê
Hijdeh hezarê kekê min
Li banqa Kela Melazgirê ne
Dibê, bila ji ber pakêtê fîşekên xwe va bikişîne
Gava Xelîlê cînar cozdanê banqê
Ji destê Dirşa dertîne
Cozdan vedike
Pere di nav da nabîne
Di heyata bavê xwe da
Cozdanê banqê bi çavê serê xwe nedîne
Tekrar cozdan bi ser û çavê Dirşa dixîne
Dibê, Dirşa kesekî enahiyê te û bavê te tunîne
Wele mala min da bû hikûmetê va
Bi sed hezarê guleka min ji kekê te ra tunîne
Dayê ax were ha nayê were ha nayê
Hewarî dûr e bavo gazî nayê
Hewara xalan dûr e bavo
Di hewara xwarziyan da nayê
Ez ê bi nava gundê Xûrûcê va diketim
Bûye kafirstanî
Çardeh nifûsên Mala Rehîmê


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Di xênî de dişewitin
Kesekî xwedanê xêra tune dayê
Li hewarê nayê
Hahîhîhîhhiîîî...

Emerê Tûdî dibê:
Mîna hirça bi birîn e
Bi sê denga li Heydo li Silhedîn
Herdu lawê xwe kir qêrîn e
Herdu li balê sekinî ne
Dibê, heydo tu beşera bavê min î
Xwe bi ser kuleka xênî bigihîne
Sê çar pakêtên tivinga
Li van xweşmêran bixîne
Kanê gulle û barûdên van xweşmêran
Haya wan tunîne

Heydo û Silhedîn
Xwe li kuleka xênî digihînin
Sê çar pakêtên tivingan
Li van xweşmêran dixînin
Felekê mala xwediyê te şewitî
Qolê milê te bişikên
Ez çi bikim gulle û barûdên
Van xweşmêran tunîne

Heydo û Silhedîn ji jor da
Xwe berdane xwarê
Devê mîratê bêşliya
Di cênîkê van xweşmêran da
Hêja diteqînin

Belê, bi vî awayî, ji Mala Rehîmê hersê bira; Mihemed Emîn, Ehmed û Fayîq têne kuştin. Dema ko ev hersê bira têne kuştin, bi navê Temo kurekî Mihemed Emîn heye, ko ji sêrî de ketiye tenûra êgir. Dirşayê lez dike dilezîne, wî ji tenûra êgir dertîne û ji mirinê xilas dike. Pişt re jî, lêwik ji gund dertîne.

(Dirşayê bi xwe jina Emerê Tûdî ye, xwişka Mihemed Emîn e. Zarên Emerê Tûdî jî, ji Mala Rehîmê Mihemed Emîn û herdu birayên wî kuştine. Temo jî kurê Mihemed Emîn e, ko ji hêla meta xwe Dirşayê ve hatiye xilaskirin. Lewma tê gotin ko, Şerê Xûrûcê, Şerê Xal û Xwarziyan e jî.)

Piştî ko Dirşayê Temoyê biraziyê xwe ji nava gund derdixe, bi memleketên xerîb ve direvîne, ji bo ko ew jî neyê kuştin. Temo mezin dibe, 'emrê wî dibe 15-16. Dirşayê radibe, çîroka kuştina hersê birayên xwe ko bav û apên Temo ne, ji Temo re dibêje. Her weha Dirşayê yek bi yek nav û kesên ko bav û apên Temo kuştine, eşkere dike.

Bi vê yekê jî namîne, radibe ji Temo re çek û sîleh dikirre, rê û dirbên gundê Xûrûcê jê re tarîf dike û wî dişîne.

Êvar e, Emerê Tûdî di serê civatê de rûniştiye. Civat lê geriyaye, odeya ko lê ye mişt ji zilaman tijî ye. Temo deriyê dîwanê vedike, silavê li dîwanê dike. Jê re dibêjin: »Eleykûmselam!« Emerê Tûdî û civata wî Temo nas nake, Temo jî kesên di civatê de nas nake. Emerê Tûdî dibêje:

— Kerem bike kurê min. Tu çi kes î? Were rûnê, tu çi kes î, tu yê bi kû de herî?

Temo êdî tê derdixe ev kalemêrê jixwerazî Emerê Tûdî ye. Berê xwe dide Emerê Tûdî û jê re weha dibêje:

— Camêr! Qet te seh nekiriye, kesî şîretek li te nekiriye? Kesî heta niha ji te re negotiye, »Bavê kuran nekuje, wê kur rabin heyfa xwe bistînin?

Hê civat ji van gotinên Temo şaş û matmayî ye, Temo di nava dêrî de li wan direşîne. Wê rojê Temo çardeh kesan di dîwanê de dikuje û direve xwe xilas dike.

Belê, wekî gotina dawîn em dikarin bibêjin, di şerê di navbera »Mala Tûziyan« û »Mala Rehîmê« de, ko çend caran li gundê Xûrûcê pêk hatiye, di destpêkê de ji Mala Tûziyan Kerem û Yasîn, piştî lihevhatinê Evdilkerîm, pişt re jî, ji Mala Rehîmê 14 kes, di dawiyê de jî ko Temo mezin dibe û wekî heyfa kuştina 14 kesên ji Mala Rehîmê, 14 kes jî ji Mala Tûziyan li gel Emerê Tûdî dikuje. Ango, bi kurtî di vê malkambaxiya ko li ser hingavtina beqekê derket de, 31 kes hatin kuştin.


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

## 12. Ji herêma Xerzan serpêhatî û kilameke çêjdar: Babê Fexriya Siwarê Gêjo

Li bakurê welatê me, nexasim jî li Herêma Xerzan, kesên ko ji Bavê Fexriya ne haydar in, ango guhdarî nekiribin, kêm in. Lê ew bi giştî di nava gelê herêmê de wekî şivan, yan jî gavanekî tê zanîn. Her wisa ev camêrê hanê, di gotin û kilamên dengbêjan de, wekî Siwarê Gêjo derbas dibe. Gêjo navê hespê Bavê Fexriya ye. Lê Bavê Fexriya ne şivan bûye û ne jî gavan. Rast e, Siwarê Gêjo ye, lê ew xwediyê gelek taybetiyên cihêreng jî bûye. Ji ber vê yekê, em ê di vê nivîsara xwe de, li gel tevahiya kilamê cî bidin van taybetiyan jî.

Bavê Fexriya kî bû? Di sêrî de, em wî nas bikin. Bavê Fexriya hem serek, hem jî mêrxasê eşîra Reşkotan bû. Ji Mala Filîtê Quto bû. Navê wî yê rastîn, Sebriyê Hacî Mihemedê Mistê Quto ye. Li Herêma Xerzan, di gelek şer û qewimînên li dijî dewletê de, ko bi serfirazî pêk hatine, cî girtiye. Di serhildaneke ko li dijî Roma Reş pêk hatiye de, Sebrî li gel birayê xwe Yehya (Yeho) li Girê Bileyder êrîş dibin ser leşkerên dewletê û topa giran desteser dikin. Lê ji ber ko nikarin topê bidin şixulandin, dev jê berdidin.

Sebriyê Hacî Mihemed, ango bi navê xwe yê dengvedayî Bavê Fexriya, bi salan li serê çiyayan qaçaxî û firariya dewletê kiriye. Gava ko dewlet berê eşîrên Xerzan, Botan û Diyarbekirê da binxetê û ew fermalû kirin, Sebrî jî tevî eşîra xwe Reşkotiyan derbasî Binxetê bû. Lê wî axa bav û bapîran jî nediterikand û çaxa ko fersend û mecal didît, derbasî Herêma Xerzan dibû. Piştî ko ‘efûya wan derket, tev bi hev re dageriyan Serxetê.

Wekî ji nav jî kifş dibe, Fexriya keça Sebrî ye. Lewma jî, wekî me li jorê diyar kir, Sebrî bi navê Bavê Fexriya tê nasîn. Fexriya gelek salan li Qubînê (Beşîrî), ko bi ser Batmanê ve ye, maye û gava ko ez hê di 9-10 saliya xwe de, li Qubînê diçûm mala bapîrê xwe, gelek caran rastî meta Fexriyayê dihatim. 3-4 sal berê, meta Fexriya li gundê Şerbetkoya nêzîkî Batmanê bû, çû ber dilovaniya Xwedê. Li gorî malbata wî, Sebrî, ango Bavê Fexriya jî ev 30-35 sal in ko rehma Xwedê kiriye.

Em werin ser peydabûna kilama ko li ser Bavê Fexriya hatiye çêkirin: Dilê keçikeke fileh li ser Bavê Fexriya hebûye. Keçik bi hisnê dinyayê wekî ronahiya heyvê delal bûye. Her çi qas keçik ji Bavê Fexriya hez dike û bi dehan kilaman li ser wî çêdike û dibêje jî, haya Bavê Fexriya jê tuneye. Keçika fileh bi salan di kilamên ko çêkiriye de ne navê xwe gotiye û ne jî navê Sebrî gotiye, di kilamê de bi tenê navê Bavê Fexriya bi lêv kiriye. Li gorî dengbêjen herêmê, keçikê bi deh meqaman kilam li ser Bavê Fexriya çêkirine. Piştî ko di ser çêkirina van kilaman re sal û zeman derbas dibin û nav û dengê vê kilamê bi saya dengbêjan belav dibe, Bavê Fexriya nû tê derdixe ko keçikê kilam li ser wî çêkirine. Ya rastî, bi van rêzikên wekî, Bavê Fexriya, Kekê Yeho, Torinê Mala Ezo Sebrî tê derdixe ko kilam li ser wî hatiye çêkirin. Di nava gel de, gotinek heye, ko Bavê Fexriya piştî ko ji vê yekê haydar bûye, wisa gotiye: »Heger min bizanibûya ko ew çend dilê wê li ser min heye, min ê ew miheqeq ji xwe re bianiya..«

Niha jî, em bala xwe bidine kilama ko me ji devê dengbêj Salihê Qubînê girtiye:

Bavê Fexriya ew bihar e wextê cota
Ji xêra mala xweziyê Xwedê re
Min serê xwe daniya li ser çokê Bavê Fexriya
Min kul û derdê rezîl têr jê re bigota

Bavê Fexriya ew bihar e
Ji kula dilê min re xweş bihar e
Min dî Bavê Fexriya, Kekê Yaho, Torinê Mala Ezo
Ji mal derket li Gêjo siwar e
Gêjo di bin Bavê Fexriya de dîn û har e
Derket Kavanê Qîre bi sê dengan kir hewar e
Min nizanibû Bavê Fexriya, Kekê Yaho, Torinê Mala Ezo
Ji tilî û pêçiyên xwe birîndar e
Ez ê rabim xwe bavêjim
Tor û bextê Helakêrê File vî hekîmî
Li bextê te û Xwedê me
Birînên Bavê Fexriya, Kekê Yeho, Torinê Mala Ezo
Bikewîne bi eşq û dil e

 E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Ber û memikên min evdala Xwedê
Ji birînên bavê Fexriya re bike piştderman e

Bavê Fexriya, heyra li min hatî êvara înê
Ez ê rabim ciyê Bavê Fexriya, Kekê Yeho, Torinê Mala Ezo
Deynim li koçka jorî li eywanê li şaneşînê
Ez ê xwe bavêjim tor û bextê Helakêrê File vî hekîmî
Bêjim, li bextê te û Xwedê me birînên Bavê Fexriya bikewîne
Ber û memikê min evdala Xwedê
Ji birînên bavê Fexriya re
Bike melhema li ser birînê
Bavê Fexriya, heyra bejna te zirav e
Ji xoxa xemilandî
Min rojê sê cara pê girtî ji eşqa dilê rezîl
Bi ser xwe de daweşandî
Rabe sala îsal bi destê min xemşê min karxezala
Ji xwe re bigire birevîne
Bavêje Xeta Sûrî nav erebên lêvdeqandî

Bavê Fexriya, heyra çem û çemê Bişêriyê
Zozan xweş e li arzem îro li koçeriyê
Çi qas zewaca bi dil xweş e
Li mala bavê li ser hewiyê
Bi destê min xemşê min karxezala
Ji xwe re bigire birevîne
Bibe li hêwiyê

Bavê Fexriya heyra çem û çemê Bişêriyê
Kelekvana kelekê xwe berdane dûv gemiyê
Ji xêra mala xweziyê Xwedê re
Hikûmeta Cimûryetê fermana min jî rakira
Ez ê çend saleka bi Bavê Fexriya re
Bi mehkûmê serê çiyê
Min ê pê re serê xwe daniya
Li ser dara mîrata modoliyê

Bavê Fexriya, heyra dora kaniyê dora min e

Bila serê heft bavê min bixwe
Zendê min tev bazin e
Ez çi bikim cerê avê li milê min e
Bavê Fexriya, kekê Yeho, Torinê Mala Ezo
Li binya kaniyê tî ye ji xwe re li hêviya min e
Tirsa min heye ji wê tirsê
Yekî derbekê lê xe bejn û bala
Bavê Fexriya, Kekê Yeho, Torinê Mala Ezo
Wê ew jî bibe cirmekî bikeve ser milê bavê min e

Bavê Fexriya, heyra çem û çemê Omeriya
Binêre ji xwe re li Sûriyê li keriyê berx û miya
Min dî şeva nîvê şevê destekî sar ê cemidî
Li nava taxima sing û berê min geriya
Min got, qê Bavê Fexriya bi xêr û silamet
Ji Xeta Sûrî ji mehkûmiyê ji firariyê
Li ser çavên min ve dageriya
Min nizanibû 'Keçika Şevê' bû bi min keniya


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

## 13. Şerê Hesoyê Birahîm (sînikan) û Hecî Mihemedê Mistê (reşkotan): Şerê Hethetkê

Hethetkê gundekî Qubînê (Bişêriyê) ye. Kesên ko li gund dimînin ji Êşîra Reşkotan in. Hecî Mihemedê Mistê serekê Reşkotan e. Hesoyê Birahim serekê Mala Nasir e. Ji Êşîra Sînika ye. Navê gundê Hesoyê Birahîm Zercilê ye, ko girêdayî Batmanê ye. Girê Qîre di navbera gundê Hethetkê û gundê Zercilê de ye.

Çend gundên Sînika, ango gundên Hesoyê Birahîm; Zercilê, Kanîrewa, Bahezîrqê, Girêreşê, Basorkê û Bilêyder in. Gundên Reşkotan, ango gundên Hecî Mihemedê Mistê gelek in. Çend ji wan: Hethetkê, Hiznamîrê, Bolindê, Tapiyê, Dilbêsa, Licikê, Xilika, Malê Newalê, Hicrê, Texeriyê (gundê êzdiyan), Kelokê, Kurtikê û Zivingê ne.

Rojek ji rojan (li gorî saloxdaran 100-120 sal berê) serekê Reşkotan Hecî Mihemedê Mistê, tevî 6-7 siwarên xwe, ji Elihê (Batmanê) ber bi gundên xwe Hiznemîrê û Bolindê ve tên. Li serê Girê Qîre, Hesoyê Birahîmê mezinê Sînika birayê xwe Mihemed Elî dişîne pêşiya wan. Ji ber ko ew bêyî destûra wan di ser gundê wan re derbas bûne. Her weha ew dixwaze hîn bibe ka ew kî ne, ji mala kê ne, navên wan çi ne? Mihemed Elî ji Heso re dibêje:

— Rêwî ne, bi riya xwe de diçin, tu eleqeya me bi wan tune, dev ji wan berde!

Lê, Heso mirovekî axa ye, zalim e. Careke din birayê xwe Mihemed Elî bi ser wan de dişîne. Pirsan ji hev dikin. Hecî Mihemedê Mistê jî ne kêm e, radibe bi awayekî bersivdarî wisa dibêje:

Ez Mistê Quto me
Ferxê Mala Ezo me
Min tu car navê xwe ji kesî re negotibû
Ez vê tanê li ser kolosê bavê xwe nahêlim
Ez vê tirê di nav şalê Mala Nasir de nahêlim

Wîla wayê Mala Quto û Mala Nasir
Di kevanê Qîrê de
Li ser Kaniya Badereşê
Li milê Tapiyê li hev û din aliyane
Wekî şîşê mencenîqê
Wek kurê hedada li ser serê hev dadane

Mihemed Elî gazî dike:
Heso rabe lez ke bilezîne
Sê toqê devreşê bide Rizgo ji min re bişîne
Îro me cewabên hev daye
Tê daim bela me û xelkê teklî hev bikî
Tê bêjî were li mala xwe rûnê
Axawo wîla wayê
Siûda min çûye îro îqbala min nayê
Min êrîşa ewilî derbek daye li Silêman û Bazo
Laşê wana maye li Kevanê Qîre
Li ber tîrêja tavê
Ez çi bikim îro fîşek di sustemê de maye asê
Ez dikim nakim bi şîşa tifingê
Bi serê kûriya xencerê jê dernayê
Hawara wan zehf e
Hawara me file û êzidî ne
Tu qayîl bî ne qayîl bî
Îro wê Mala Quto
Koka mala Nasir biqelînin ji dinyayê
Qey tu nizanî roja ko roj reş bibe
Rev bi kêrî her çar peyayê Mala Nasir nayê

Wîla wayê, wîla wayê
Sê şad û şirûdê
Hecî Mihemedê Mistê bavê Sebrî hene li dinyayê
Bi sê denga li Axê Xisarka û Pîloka dikir gazî:
Bavêminbûno lê xin
Êvar e roj nemaye
Termê Silêman û Bazo
Li milê Tapiyê li ber tîrêja tavê maye


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Îro heyfa van xweşmêran li erdê maye
Reşo gazî dikir:
Hecî Mihemedo navê Xwede bide
Êvar e hê ro zû ye
Min derbekî daye Hemîd zava ye
Derba didoya daye
Li bejn û bala Xalîd kevnika li ser desta ye
Min derba sisiyan daye
Bejn û bala Rizgo cilê resmî lê ne
Hikumeta Elmedîna îro li erdê maye
Min derba çaran daye
Bejn û bala Mihemed Elî
Bavê Xezebê kewê sekekirî
Roja ko biqewime mêrekî bi sedan e
Min derba pêncan avêtiye
Hesoyê Birahîm ez nizanim
Ne sax e ne birîndar e
Mirîdê Şêxê Zîla ye
Bi lingê hespê boz reviyaye
Min Heso nekuşt
Min ji bona derd û kulê dinyayê berdaye.
Wîla wayê wîla wayê...

Piştî van başebaş, zirt û xeberdanan, herdu Êşîr li hev sor dibin. Dest diavêjin mîratên tivingên aleman û balçîqa. Di vî Şerê Qîre de, di rojekê de çar birayên Heso yên bi navê Hemîd, Xalid, Rizgo û Mihemed Elî hatin kuştin. Du heb jî, ji Reşkotan, bi navê Silêman û Bazo hatin kuştin.

Hesoyê Birahîm piştî kuştina çar birayên xwe çû Wêranşarê, cem Birahîm Paşa. Lazimiya ji sîleh bigire hetanî mermî ji xwe re anî, hate gundê Zercilê û Bahezirqê. Koma xwe çêkir, hawara xwe bi fileh û êzdiyan anî. Şêwir û mişêwirên giran pêk anî û ji hev re gotin:

— Em ê biavêjin ser Hethetkê, heyfa xwe bistînin...

Mihemed û Elî birayên hev in, Reysê jî kurê mamê wan e. Ev hersê zilam mêrxas in, jêhatî ne. Neyarê wan Hesoyê Birahîm dibêje:

— Eger ji wan hersê kesan yek bifilite, wê heyfê bikine deh heyf, divê yek ji wan xelas nebe!..

Heso deh zilaman dixe hewşa Mihemed, deh zilaman dixe hewşa Elî û

deh zilaman jî dixe hewşa Reysê. Sê zilaman dişîne ser xaniyan, yek jê diçe ser xaniyê Mihemed, yek jê diçe ser xaniyê Elî, yek jê diçe ser xaniyê Reysê. Ji Mihemed re dibêjin, »Elî kuştinî« ji Elî re dibêjin, »Reysê kuştin«, ji Reysê re jî dibêjin, »Mihemed kuştinî.« Hersê bi hev re derdikevin, lê kemîn di hewşê de hatiye danîn. Zilamekî ji Êşîra Reşkotan bi Heso re ye, bi zaravayê dimilkî hawar dike û dibêje:

— Hesoyê Birahim talanê Bolindê û gundê qarşî wan bir.

Wexta ko hawar li gund digere û deng bi tivingan dikeve, herkes ji mala xwe radihêle tivinga xwe û derdikeve hawarê. Eskerên Heso jî, di nava gund de cî girtine. Kî derdikeve devê dêrî, ji aliyê eskerên Heso ve tê kuştin. Gava ko deng ji tivingan tê birrîn, li gundê Hethetkê, di encama şerê giran de, 12 mêr û jinek li ser axa sar dirêj kirine û wê dotira rojê bêne veşartin.

Piştî şer, Eyşêya dayika Mihemed û Elî radibe bi awayekî kezebşewat, li ser kuştiyên xwe kilaman dibêje û dilorîne. Ji wê rojê heta îro jî, kilama ko dayika Eyşê piştî Şerê Hethetkê gotiye, ji aliyê bi dehan dengbêj û goyendeyên welatê Serhed û Xerzanê ve têne gotin. Min ev guhertoya (wersiyona) li jêrê ji devê Dengbêj Teyîboyê Siertî ko niha li gundê Marîbêya Misircê (Kurtalan) dimîne û ji devê Dengbêj Salihê Qubînê wergirt û da ber hev. Min dît ko, di navbera van herdu guhertoyan de zêde guherîn tune. Lew re jî ev kilama ko em ê pêşkêşî dêhn û bala we bikin, kilama ko ji devê Salihê Qubînê hatiye wergirtin bi xwe ye.

Kerem bikin em bi hev re biçin qada şer û guhê xwe bidin axîn û kesera Eyşêya diya Mihemed û Elî:

Eyşê dibê:
Mihemedo lawo
Mihemedê min keya ye
Elî zava ye
Reysê gulçîçekê civata ye
Fata reben qebika li ser sêwiya ye
Eyşê dibê:
Mihemedê min keya ye
Elî zava ye
Sibehê min dît Mihemedê min sekinî
Li ser banê xêniyan
Şalwalê Mihemedê min giran e


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Xwe berdaye li ser gozeka paniya piya
Kula Xwedê bikeve
Derê bavê Hesoyê Birahîm
Hûtê Bişêriya şeva nîvê şevê
Kete devê derê mala bavê min
Weke kupê jehrê
Di devê deriyê mala bavê min de rijiya
Eyşê dibê Mihemedo lawo
Anî sed caran bi min anî
Hesoyê Birahîm li Zercilê li Bahezirqê
Şewir û mişawira giran danî
Qralê filehan qawalê êzdiyan bi xwe re anî
Girte ser Hethetka mala bavê min rebenê
Ji xwe re bi koşk û xanî

Eyşê dibê, Mihemedo lawo
Hethetka mala bavê min rebenê bişewite
Bi xox û tirî
Giran e eskerê Hesoyê Birahîm
Bi tevî qralê fila ve qawalê êzdiya
Avête ser Hethetka mala bavê min rebenê
Bi sê ciha ji xwe re diwirin

Eyşê dibê, Mihemedo lawo
Ez ê derêm li ser banê xaniya
Ji xema dilê xwe û te re
Ez ê gazî bikim hawar e
Hecî Mihemedê Mistê
Bi pismamê xwe re xwar e
Koma Reşkotan hevalê xwîna sar e
Hesoyê Birahîm ji bab û kalê xwe ve neyar e
Hesoyê Birahîm ji mala bavê min
Qeland tovê xweşmêra ji mala roviya

Eyşê dibê, Mihemedo lawo
Anî bi min anî
Min dî Hesoyê Birahîm

Xencer li ser singê Mihemedê min de bir û anî
Tivinga qesetûre li ser laşê Mihemedê min hilanî

Eyşê dibê, Mihemedo lawo
Hethetka bavê Mihemed û Elî û Reysê
Ez diketim şev çile bû berfê lê kir erd spî kir
Ez ji taxa xwarî
Ji ser termê Têloyê birayê xwe dageriyam
Hatim taxa jorî
Ez li termê Mihemed û Elî rast hatim
Kezep şêrîn e
Têlo birawo gazina neke
Min şîn û qedera te ji bîr kir
Dayê dayê qey îslamî ye lawo?

Reşkotan û Sînikan bi sedan caran şer kirine. Şerê Hethetkê jî, yek ji wan e. Ji 50'î zêdetir mirov ji hev kuştine. Pişt re Sînikan û Reşkotan li hev tên. Sebebê qatilê 12 zilam û pîrekekê Hesoyê Birahîm, piştî vî şerî bi 25-30 salî, gava zeman xweş dibe, tê Batmanê, ji hêla Emerê Perîxanê ve tê kuştin. Emerê Perîxanê jî, ji ramiyan bû. Pişt re Emerê Perîxanê dibe ajanê dewletê. Ji ber vê yekê jî, Mala Perîxanê li derdora Sînikan, Reşkotan û Bekiran tevî leşkeran dest bi zulmê dikin. Bekiran derbeyeke pir mezin li Mala Perîxanê û leşkeran dixe. Tê saloxdayîn ko, bi hezaran leşker di Çemê Bişêriyê de hatine kuştin.


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

## 14. Karesatek ji herêma Serhedê: »Çûro û Fesîhê Mihê Mîrze«

»...Li Welatê Serhedê ez ne bawer im ko bi tenê mirovek jî rabe û bibêje min hay ji kilama 'Çûro û Fesîhê Mihê Mîrze' nîne. Tiştê ko ez dizanim, ev kilam li çar aliyê welatê me jî ji hêla 'kurê bavan' ve tê gotin...«

Ev gotin, bejek ji hevpeyvîna min bû ko min li Aydînê bi dengbêjê dengzêrîn Zahiroyê Hingilosi yê Mûşî re pêk anîbû. Min cara ewil vê kilamê, di sala 1996-an de li Batmanê ji devê Dengbêj Salihê Qubînê guhdarî guhdarî kiribû. Piştre jî du-sê çaran min ev kilam li Aydîn û li Stenbolê ji devê Dengbêj Zahiro guhdarî kir.

Piştre jî du sal berê ango di sala 1998-an de, li Stenbolê min kilama navborî ji Hacî Remezanê Melazgirî guhdarî kir û ji devê wî nivîsand. Li gorî gotina Hacî Remezanê 65 salî, ew ne dengbêj û stranbêj e û naxwaze ko wekî dengbêj navê wî bê nivîsandin. Gotinên kilama navborî ko hûnê li jêr bixwînin û guhdarî bikin!; ew gotin in ko me ji devê Hacî Remezan berhev kir û nivîsand. Çend gotinên çîrokî yên berê kilamê jî, ji malûmat û agahiyên her du dengbêjên navborî; ji Dengbêj Salihê Qubînê û Dengbêj Zahiro hatin wergirtin. Niha jî kerem bikin, hûn û kilama Fesîhê Mihê Mîrze û Çûro...

...Her çiqas Fesîhê Mihê Mîrze dixwaze xwe ji hevz û belayê biparêze jî, bi ser nakeve. Ji ber ko di salên derbasbûyî de, Fesîhê Mihê Mîrze ji Pazdeh saliya xwe heta çil û yek saliya xwe ji ber »Mêrkuştinê« tam bîst û şeş sal ji nav malbat û zarokên xwe dûr, li »Xeta Sûrî« li cem »Mala Haco« wekî qaçax û firar dimîne. Divê em di vê navberê de bibêjin ko Fesîhê Mihê Mîrze ne bi tenê »Mêrkuj« e. Her wiha gava ew dibe »Xwînî« û derdikeve serê »Dax û çiyayan«, Serhildana Şêx Seîd têk çûye. Seranserê welêt bi leşkerên Roma Reş tijî bûye. Ango leşker derketine »Nêçîra Serhildêran« Di mehkûmî û qeşqûriya xwe de, di laqîbûneke leşkeran de »Teslîm« nabe û berê »mîrata elemanê« dide leşkeran û çend ji leşkeran dikuje. Piştî vê qewmînê, serûvena Xeta Sûrî û Mala Haco dest pê dike. Bîst û şeş sal li »Binxetê« dimîne. Piştî ko »Efûya Giştî« derdikeve,

dizivire tê li ser mîrateyên bav û bapîrên xwe ango tê Welatê Serhedê. Lê vê carê jî bela li dorê diçe û tê. Çûroyê bavê Dirşayê çav berdaye zozan û gomên Fesîhê Mihê Mîrze.

Fesîhê Mihê Mîrze, herçend mêr û mêrxas e jî, naxwaze bela biqewime û dîsa firarî û qaçaxî bibe para wî. Gelek caran ji civata dora xwe re dibêje »Ezê duayekê bikim, hûnê bêjin ‘Amîn’ Duaya wî jî ev e: »Xaliq Rebê Alemê tu car belayên wisa li pey mêrikê mêrxas nexîne!«

Lê Çûro belayeke gewr e. Bi tir e, bi tinaz e. Mêr û mêrxasan li ser xwe nabîne. Jina wî Emo tevî ko xewnên giran û xirab dîtiye û keça wî Dirşayê, nikarin Çûro ji vê çavsorî û bitiriya wî dagerînin. Piştî ko lê dixe kevirê ber serê Fesîh dişkîne, kozikê bi ser serê wî de diweşîne, Fesîhê Mihê Mîrze êdî xwe hew digire û dibêje: »Êdî bes e ev zilm û zora te« û berê mîrata »Bêşliyê« dide Çûro bavê Dirşayê û ser û mêjiyê Çûro belav dike û wî li erdê direxîne...

Le Axao...
Hey lawo axao
Min got di berxîtiya xwe de têr nemijiyao...
Di kavirtiya xwe de têr neçêryayo...
Di pazdeh saliya xwe de
Bû firar û qeşqûrê mehkûmê serê dax û çiyao...
Birincî bi Feyso re
Ikîncî bi Şêxo re
Uçincî bi Berxê Mala Seydo re geriyayo
Sala çil û yek salê te qediya
Li Dirbêspiyê li Xeta Sûrî
Li cem Mala Haco ma
Sala çil û yek salê te qediya
Efûya te derketî
Te berê xwe da Welatê Serhedê
Kurmancên Hesenan xayîn bûn
Li ser »Zozanê Dexda« Li »Goma Xelef«
Ji Fesîhê lawê Mihê Mîrze
Mêrikê Mêrxas, Melkemotê Kûlê, Kûpê Xwînê
Çima nehewiya axao...
Axao sibe ye, dilê min ê ji dila
Dila dibîne, maqûlo


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Dilê min ê ji dila, dila dibîne
Fesîhê Mihê Heyderî
Li ser nazbalgiyê rûniştiye
Temamê giregirên Hesenan li dorê rûniştîne
Qala êsîrtiya xwe li Xeta Sûrî dike
Ji cemaeta dora xwe re
Dibêje bavo, pê re dinikîne
Fesîh bi sê denga li Eshedê lawê xwe kir qêrîn e:
Eshedo lawo! tu rabe lez bike bilezîne
Bozê li tewlê derîne
Teng û bertengê Bozê çep û rast bijidîne
Destê xwe bavêje Bêşliyê
bi tevî qolê fişeka ve
Deyne qarşî bavê xwe vezelîne
Ezê berê xwe bidime
Zozanê Dexda Goma Xelef Kaniya Mihê
Kûla Zozanê Dexda Goma Xelef Kaniya Mihê
Kûleke giran e
Bavê te bimire bila hefse
Di dilê bavê te de nemîne
Lawoooo... Hehîhîîîîî

Eshed bi sê denga
Li Fesîhê bavê xwe kir qêrîn e
Dibê: Bavo yeqîna te bê
Ji Xaliq Rebê Alemê
Qurana Nebî ne ko bavo rûknê dîn e
Mêrxasekî li Welatê Serhedê rabûye
Jê re dibêjin; Çûro, Kekê Îlyas Bavê Dirşayê
Bavo li »Erdê Kavirê« dimîne
Ev sala hefta ye ketiye sala heşta
Zozanê Dexda, Goma Xelef, Kaniya Mihê
Bi darê zorê ji me distîne
Koç û kêriyê xwe bavo, tê diçêrîne
Fesîh, bi sê denga li cemeeta dora xwe kir qêrîn e
Dibê: Gelî cemeeta hazir
Ezê dûayekê ji rebê xwe bixwazim

Hûn bi hev re bêjin »amîn« e
Belkî Xaliq Rebê Alemê
Tu car belayê wisa
Li pey mêrikê mêrxas nexîne
Fesîh lez dike dilezîne
Hespê Bozê ji tewlê dertîne
Teng û bertengê Bozê çep û rast dijidîne
Destê xwe davêje Bêşliyê
Bi tevî qolî fişeka ve
Datîne qarşî bavê xwe, diwezîne
Ma berê xwe da
Zozanê Dexda Goma Xelef Kaniya Mihê
Koç û keriyê Çûro Kekê Îlyas Bavê Dirşa
Ji Zozanê Dexda dertîne
Kaxizekî dinivîsîne
Li destê Başxûlamê Çûro datîne
Dibê: Çûro tu bidî xatirê Xwedê û Qurana Nebî ne
Tu qetl û qitûlê bi min nekî
Ji nava çil û çicûxê min
Careke din ê lawo
Berê min li Xeta Sûrî nezivirîn... axaooo...
Lawo tu bi Şera Mûhemed bêjî
Li ber te sekinîme
Heger tu bi orfê dikî
Gazî çar alî miqûfa bike
Zozanê Dexda heşt qetih e
Bila qethekî her wiha bê pol bê pere
Ji te re bimîneîîîîî
Heger tu wê yekê nakî
Kifş û raporê derxe
Zozanê Dexda bi kifş û raporê ji min bistîne
Lawo Zozanê Dexda
Zozanê bav û kalê min ê qedîmî ne ê...
Hey axaooo haêêêîîî...

Lê belê roj qameta nîvro
Berê koç û keriyê Kekê Îlyas Bavê Dirşayê


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Başxûlam li nava malê diqelibîne
Çûro bi sê denga li Başxûlam kir qêrîn e
Başxûlam kaxizê bi destê Çûro
Kekê Îlyas Bavê Dirşayê datîne
Lê gava Çûro kaxizê dixwîne
Li nava serê xwe kir qêrîn e
Dibê: Lawo Zozanê Dexda
Zozanê zorê zozanê me ne
Tapû û qoçanê bavê kesî jî
Di zozan de tunîne
Emo bi sê denga
Li Dirşa qîza xwe kir qêrîn e:
Dirşa lawo tu rabe lezke bilezîne
Xwe bi aliyê odê bigihîne
Deriyê odê li taqa piştê bixîne
Bi sê denga li Çûroyê bavê xwe bike qêrîn e
Bêje bavo dayika min
Li berbanga sibê razaye
Sê xewnê xirab bavo ji te re dîne
Dibêje berê xwe nede Zozanê Dexda
Goma Xelef pêsîra xwe nede
Pêsîra Fesîhê Mihê Mîrze
Mêrikê mêrxas melkemotê kûlê kûpê xwînê
Dibêje bavo çûna te bi dawet e
Yeqîn hatina te ji me re bi şîn û girîn e
Dirşa dibêje bavo were em herin lo...
Lê bala xwe bidê
Dirşa lez dike dilezîne
Derê odê li taqê piştê dixîne
Bi sê denga li Çûroyê bavê xwe kir qêrîne e
Dibê bavo tu bidî xatirê
Xwedê û Qurana Nebî ne
Tu were destê xwe ji benda kuştinê bikşîne
Dayika min Emo
Ji berê berbanga sibê razaye
Sê xewnên xirab bavo ji te re dîne
Dibê berê xwe nede Zozanê Dexda

Pêsîra xwe nede
Pêsîra Fesîhê lawê Mihê Mîrze
Mêrikê mêrxas mêrê têr
Melkemotê kulê, kûpê xwînê
Dibêje bavo çûna te bi dawet e
Yeqîn hatina te
Ji me re bi şîn û girîn e
Dirşa dibê bavo tu were em herin lo…
Lê belê Çûro li nava serê xwe
Li Dirşa qîza xwe kir qêrîn e
Dibê: Dirşa lawo wezîfa qîza min ne ew e
Wezîfa qîza min ev e;
Rabe lezke bilezîne
Hespê bavê xwe ji tewlê derîne
Ji te re enexdar
Bismilah bike li devê çekmecê bixîne
Bi sî û du qolê fîşeka ve
Deyne qarşî bavê xwe wezîne
Bavê te li Welatê Serhedê
Mêr li qarşê xwe nedîne
Dayika te Emo ehmeq e
Nezan e aqilê wê nagire
Bila êvarê derkeve hafa
Siwarê Hesenan Fesîhê Lawê Mihê Mîrze
Êsîr û destgirêdayî
Bila li pêşiya bavê te bibîne lê…

Dirşa lez dike dilezîne
Vê tedbîra hanê ji bavê xwe re dibîne
Çûro ji malê siwar dibe
Bi sê telaqê Emo sond dixwe
Dibê: Herçî li ser Zozanê Dexda
Pêsîra xwe bide pêsîra min zilamê
Xêrê ji xêr û bazara xwe nabîne
Dê Xaliq Rebê Alemê
Pelê wî ji darê biqetîne


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Xenîmê xwe li ber çavê xwe bîne
Xêrê ji vê bazara xwe nabîne axaohaîîîî...

Axaooo sibe ye
Ezê bi Zozanê Dexda diketim
Sê karî ne
Ji siba Xwedê ve Çûro
Bi serê Fesîh ve bavo qîreqîr e
Axaooo sibe ye
Wezê bi Zozanê Dexda diketim
Bi kerkora derdora Fesîh
Bi sê denga li Çûro kir qêrîn e,
Dibê: Çûro lawo tu bidî
Xatirê Xwedê û Qurana Nebî ne
Tu qetl û qitûlê bi min nekî
Ji nava çil û çicûxê min
Lawo careke din berê min
Li Xeta Sûrî li cem Mala Haco nezivirîne...
Lawo Zozanê Dexda,
Zozanê bav û kalê min ê qedîmî ne
Heqê kesî di zozan de tunîne
Lawo tu bi şera Mihemed bêjî
Li ber te sekinîme
Tu yê gazî çar heb alî miqûfa bike
Zozanê Dexda heft qetihe ye
Bila qetheke ji te re
Bê pol û bê pere bimîne
Heger tu vê yekê qebûl nakî
Kifş û raporekî derxe
Bi kifş û rapora hikûmetê
Zozanê Dexda bavo
Ji min bistîne lo...

Lê bala xwe bidê
Çûro qet xebera dînlemîş nake
Ji siba Xwedê ve
Hê jî li serê Fesîh de hê qîreqîr e

Lê dixe kevirê ber serê Fesîh dişkîne
Kozikê bi ser serê
Fesîh ve bavo, diweşîne...
Dibê lawo Zozanê Dexda Zozanê me ye
Zozanê zorê ye
Tapû û qoçanê bavê te jî
Ji Zozanê Dexda re tunîne
Heger tu bi hikûmetê
Bi min re xeber bidî
Geleke serê min jê naşî
Hikûmet li pêşiya bav û kalê min nîne
Mamûrê hikûmetê van e
Li navbeyna min û qarşî wezilîne
Ezê vê sibê ji malê siwar bûme
Bi sê telaqê Emo sond xwariye
Herçî li ser Zozanê Dexda
Pêsîra xwe bide pêsîra min zilamek
Xêrê ji vê bazara xwe nabîne
Xaliq Rebê Alemê
Pelê wî ji darê diqetîne
Axaoo ax haîî...

## 15. Li Geliyê Zîlan Çemê Hesen, evdalê evîneke bêmirad: Heso û Nazê

Heso û Nazê, li Geliyê Zîlan li Çemê Hesen Evdalê diman. Nazê qîz bû Heso xort bû. Her du aşiqê hev dibin. Heso, ji aliyê malê dinyayê ve feqîr û belengaz bû. Bavê Nazê zilameke dewlemend bû, xwedî famîle û eşîr bû. Rojekê Heso ji Nazê re got:

— Nazê! Divê em dest ji vê eşqa xwe berdin. Tu zanî ko tiştekî nebûyî ye. Di isûl û qaîdeyên memleketê me de, zilamê ko eşîr be, dewlemend be, qîza xwe nade mêrikê kurmanc ê feqîr. Were em dev ji hev berdin, an jî were bi min re bireve !

Nazê got:

— Belê Heso tu tiştekî baş dibêjî. Lew ez jî gune me. Heval û hogirên min wê sibê rabin û ji min re çi bêjin? Were, isûleke dinyayê ye, min ji babê min bixwaze. Gava ko nede, ew jî ji min re dibe, senedeyekî, delîlekî. Wextê ez bi te re birevim, wê xelk bibêje »Qîz û xort bûn, her du aşiqê hev bûn, bi qewl û resûlê Xwedê Heso Nazê ji babê Nazê xwest. Babê wê Nazê neda, Nazê jî bi Heso re reviya!« Ew jî ji min re dibe delîl û hincetek.

Welhasilî kelam em zêde dirêj nekin. Heso hate cem Qûlîxanê birayê xwe. Gundê wan nêzî hev in. Ji birayê xwe re got:

— Qulîxan, gereke tu herî ji min re Nazê bixwazî !

Qulîxan bi awayeke şaş û acizbûyî ji Hesoyê birayê xwe re got:

— Lawo te ji babê xwe, kalê xwe kengê seh kiriye, mêrikê eşîr qîza xwe daye mêrikê kurmanc?

Hesoyê gewr e, ji ya xwe nakeve, gavan bi paş ve navêje. Dibêje:

— Na Qulîxan! Ev dîn e îman e, erd e ezman e. Tu yê herî Heso ji min re bixwazî...

Qulîxan tirsiya. Wisa dizane ko gava here Nazê ji babê wê bixwaze, dibe ko lêdanê jî bixwe. Berê xwe da Heso û got:

— Lawo wele, belkî lêdan jî tê de hebe, kuştin jî tê de hebe. Bi xwedê

tu yê jî bi min re werî.

Heso da pey Qulîxan û çûn dîwana mala babê Nazê.

Piştî şêwr û mişêwiran babê Nazê li Qulîxan zivirî û wisa got:

— Qulîxan xêr e? Qet hûn nedihatin dîwana min cemieta min. We xêr e gelo?

Qulîxan destên xwe danîn ser hev û bersiva babê Nazê da:

— Ezbenî, em hatine heger reza û destûra te hebe, bi qewl û resûlê xwedê, em Nazê ji Heso re dixwazin.

Belê babê Nazê jî bi meseleya qîza xwe hesiyaye ko dizane dilê Nazê jî li ser Heso heye. Di dilê xwe de got: »Wele heger ez kurt cewab bidim û bêjim ez qîza xwe nadim, dibe ko sibê qîza min pê re bireve, di nava şirîk û hemberê min de, wê serê min berjêr bibe. Ya rast ew e ko ez bareke giran li wan bikim û riyeke dirêj bidim pêşiya wan, wê dev jê berdin, emê ji bara hev bikevin«

Babê Nazê berê xwe da Qulîxan û dest bi van gotinan kir:

— Heger Heso heft salan şivaniya min bike, ezê Nazê bidimê, heger heft salan şivaniya min neke ez Nazê nadimê.

Hesoyê ko heta vî emrê xwe berê pezekî û heywanekî danegerandiye, piştî van gotinên babê Nazê wisa got:

— Wele ji min re zor e, lê ji bo xatirê Nazê ne heft sal, deh sal jî be ezê bikim.

Heso rahişte dar û kulavê xwe, bû şivanê babê Nazê. Sê-çar salên Heso qediya. Herçî Nazê ye, di dorhêla xwe de qîzeke wisa deng pê ketiye ko hewçend bi hisnê dinyayê delal e.

Xalid Begê jî, delaliya Nazê seh kiriye. Çend siwariya da pey xwe û hat di mala babê Nazê de rûnişt û di dîwana mala babê Nazê de got:

— Nazê bidine min! Heftê hezar qelenê wê, bi pênc heb çek xelatê wê ve ezê bidim. Meaşê xelkê ko hezar kaxit be ezê du hezar kaxitê bidim Heso ezê wî îqna bikim.

Babê Nazê li pera tima bû. Diya Nazê got:

— Heyra şêwr ji sinet e. Serî Nazê ye, heger Nazê qîma xwe bîne, jixwe mesele tine ye. Ezê herim pirsiyarekî bi Nazê bikim.

Diya Nazê derbasî odeya Nazê dibe. Ji Nazê re dibêje:

— Lawo, te tunehî û feqîriyê nedîtiye. Li cem Heso wê zikekê te têr yek birçî be. Xalid Begê zilamekî dewlemend e. Heftê hezar qalanê te, bi pênc heb çek xelatê te ve dide. Meaşê xelkê hezar kaxit be wê du hezar kaxit bide Heso û wê wî îqna bike.

Ji hêrsbûnê erd û ezman li ber çavê Nazê bû yek, derziya xwedê li ber çavê wê çû û hat. ji diya xwe re van gotinan dibêje:

— Dayê! Tu bi qurbana wî şîrê sipî bibî ko te ji pêsîra xwe daye min. Heger ko min bizanibûya ko xelk lome û ithaman li min nake, welehî niha min ê te di odeya xwe de bikuşta. Lê ka ew mêrê ko ji malê xwe û ji mêrê xwe têr e, tê namûsa xelkê bi qeweta malê xwe dixwaze û distîne, ka ez wî mirovî bibînim mirovekî çawa ye?

Diya Nazê zûka xwe gihande Xalid Beg û jê re got:

— Xalid Beg zûka xwe xilas bike. Nazê ko bigihije te, wê te di mala min de bikuje!

Xalid Beg, bi bêhna lingê hespê reviya. Nazê demançe tazî di desta de, derkete derê dîwanê, li pey Xalid Begê de kire qîr:

— Ew mêrê ko ji malê xwe ji mêrê xwe têr e, namûsa xelkê bi pereyên xwe distîne, haşa hizûr ka ew çi bênamûs e ez bibînim?

Malbata Nazê li dora wê civiya jê re gotin:

— Lawo, kesekî behsa te nekiriye. Me te da Heso pirsekî siwalekî me ji te nekir. De ko dilê te li ser Heso heb,e xêr li bazara te be.

Em dirêj nekin. Heso qewlê xwe yê şivaniyê temam kir. Îrada xwedê pê hebe. Heso daweta xwe kir. Bi qasî mehek du mehan li cem hev man. Dûr ji van deran, êşek li canê Heso peyda bû ko êşeke wisa pîs neûzûbilah! Xelk û alemê xwe ji Heso dûr xist. Dor û civat îthaman li Qulîxan kir. Ji Qulîxan re gotin:

— Lawo, xwedê derd daye lê derman jî daye. Çima tu birayê xwe nabî dixtorekî, nexweşxaneyekî xweyîtiyekî lê nakî?

Ji ber ko xelkê zêde îtham û lomeyan li Qulîxan kir, rahişte Heso da pişta xwe û nakire nexweşxanê. Wextê dixtor Heso mieyene kir, bi ser Qulîxan de kire qîreqîr:

— Malmîrat! Te vî cendekî aniyê ezê çawa bikim jê? Êşa wî lê pîr bûye, tesîra ko derdê wî derman bike, nemaye. Ez çawa bikim ji vî cenazeyî?

Qulîxan tirsiya. Di dilê xwe de got: »Bi xwedê dibe ko min sûc kiribe, wê werin min jî bigirin« Bi hinceta destavê, Qulîxan mîna lingê hespê, got : »Lingo ez bi qûrbana te!« û reviya.

Nazê jî, ji berê ve wead kiriye û wisa gotiye:

— Gava ko cewaba mirina Heso ji min re were, ezê fincanekî jehrî wexwim. Piştî mirina Heso, ez sax li dinyayê nemînim.

Nazê bazda pêşiya Qulîxan û jê re got:

— Keko, bextê te û xwedê, te çawa kir ji Heso, Mir an ma?

Qulîxan li Nazê vegerand:

— Qet pirsa Heso ji min neke.

Nazê, zarezar bi Qulîxan kir. Qulîxan vê carê wisa got:

— Wele hal û meseleya Heso ev e. Dixtor wisa ji min re gotiye, ez tirsiya me. Min gotiye wele wê werin min jî bigirin. Bi xwedê min Heso di nav lepên wan de hiştiye, ez reviyame û hatime.

Xew ji nazê re namîne. Wê şevê radibe, destekî cilê zilaman li xwe dike, berjêrî bajêr dibe, diçe nexweşxaneyê dixtorê nobedar dibîne, pêve zarezar dike, riya xwedê û pêxember ji ber digire. Nazê ji dixtor hêvî û reca dike:

— Ew nexweşê ko îro anîne cem te, navê wî Heso ye. Ez dixwazim tu wî nexweşî teslîmê min bikî.

Ew jî dixwazin ko gavek zûtir ji Heso xilas bibin. Dixtor kete pêşiyê, çûn deriyê bodromê vekirin, Heso ji binê bodromê derxistin. Nazê kete binê milê Heso, ji nexweşxaneyê derxist. Ew gotina ko dixtor gotibû: »Em nizanin wî bavêjin behrê, an jî bi saxîtî wî bixin binê erdê!« di mejiyê Heso de cemidî. Heso di dilê xwe de ji xwe re wisa got: »Wele vaye min birin. Yan wê min bavêjin behrê, yan jî wê min bi saxî bixin binê erdê«

Bi awayeke xayîsbûyî serê xwe rakir û got:

— Tu bi qedrê Mûhemed Mistefa bikî, tu çi kesî tu min bi ko ve dibî?

Nazê, tevî cilên xwe yên mêraniyê ko ji bo nenaskirinê li xwe kiribû, wisa got:

— Heso, ez Nazê me!

Heso axîn ji paniyê kişand û berê xwe da Nazê:

— Nazê, heft sal emeka min jî bi te re heye. Lê ez bi wî xwedayî bikim ko wî rihê me daye û wê bistîne jî, ev heft sal emeka min wekî vê saniyê li ber çavê min nayê.

Nazê got:

— Heso Xwedê mezin e!

Bi şev nîvê şevê Heso anî malê, ko sebebî li Heso bike. Yan Xwedê teala wê şîfa ji Heso re bişîne yan jî wê rihê wî bistîne.

Jinbira Heso ko xwedê sitarê nede serî, sitarê neda ser Heso. Ji Qulîxanê mêrê xwe re got:

— Camêr! Ev êşa Heso pîs e. Li me li zarê me peyda bibe, hebek ji me namîne. Ez bi wî xwedayî bikim, yan ez di xaniyê te de dimînim yan Heso dimîne. ko Heso di vî xaniyê de bimîne, ha ji te re zarê te, bi xatirê te ez diçim mala bavê xwe.


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Belê, Qulîxan ji jina xwe zalimtir bû. Bi gotina jina xwe kir, kete binê milê Heso wî avête binê Geliyê Zîlan Çemê Hesen Evdalê. Holikekî bi qirş û mirşan li ber devê avê ji Heso re çêkir.

Piştî ko Qulîxan dageriya û hate malê, jina wî bi qasî nîv metre lêvaxwekirî, hate pêşiya Qulîxan. Wê rojê tim di dilê xwe de digot: »Wele, gava ko Heso bimire û Qulîxan jî jinbira xwe mar bike, xwedê wekal e, ez çûm av û av, di diya wê jina ne hazir hate niyan, ezê biçim ber pêlavan! Ev kelemeke giran e li pêş çavê min, ezê îtirafiyekî mezin bêxim stûyê, Nazê ko ez jê xilas bibim«

Pîreka Qulîxan çavê xwe girt û devê xwe ji mêrê xwe re vekir:

— Qulîxan, tu ketî xewê, haya te ji bayê felekê tune ye!.

Qulîxan got:

— Xêr e, Çi bûye?

Jina wî dewam kir:

— Nazê heta berê sibê, xew jê re tine ye, li pey xortê xelkê digere. Sibê di mala te de, jinbira te rabe bi xortê xelkê re bereve, mirina mezin ev e. Oxweşikê kesî li mirinê nayê. Emê jî bimirin, kurê me jî bimire, babê me jî bimire, lewra ko însan tixmê mirinê ye, em çêbûne ji bo mirinê. Mirina mezin ev e ko, jinbira te rabe di mala te de li pey xortê xelkê bireve. xeberek ji babê wê re bişeyne, bila were qîza xwe bibe, li mala babê xwe çawa dike bila bike, namûsa wan e, elaqa me jê tine. Birayê te êdî miriye, tu xêra birayê te ji te re tune.

Qulîxan bi xeberê jina xwe kir, xeberek ji mala babê Nazê re şand û got:

— Vaye birayê min miriye, werin qîza xwe bibin.

Belê, navê mirina Heso li dinyayê belav bû. Hêj jî ew kûl û hesret bi Xalid Begê re ye. Bi çend siwariyên xwe ve hat li mala Qulîxan de rûnişt. Xalid Begê ji Qulîxan re got:

— Nazê bide min! Heftê hezar qalanê wê, bi pênc heb çek xelatê wê ve ezê bidim. Heger babê Nazê qîma xwe neanî, tu li mala xwe rûne qarşê wê nebe, ez heme.

Ji ber ko ji berê de gazî mala babê Nazê kiribûn. Ew jî hatibûn. Di mala Qulîxan de li hev rûniştin û li hev hatin. Nazê xwestin, şîraniya wê birîn û wê xelat kirin.

Nazê bi stûxarî rabû ser xwe û wisa got:

— Heyra ev çi kafirstanî ye ko hûn bi min dikin? Zilamê min sax e.

Wê gavê, nîvmeleyekî ko li civatê pal daye, bi meqseda ko çend qirûş pereyên markirinê bistîne radibe ser xwe û dibêje:

— Babo xira xira we çi ye? Wele Heso miriye û min Heso bi destê xwe şûştiye.

Li ser vê derewa mele Nazê dibin. Wextê ko Nazê dibin, riya wan bi wir dikeve, di ber Geliyê Zîlan Çemê Hesen Evdalê de derbas dibin. Nazê xêlyê xwe dadigerîne û dibêje:

— Xwedê ji we razî be! Hûn çi kes in, çi qewmiyet in, dînê we û meshebê we çi ye?

Tev bi hev re gotin:

— Em misilman in.

Nazê li wan dagerand:

— Ne xêr hûn ne misilman in. Ev kirina we di nava tu dînî de nabe. Çi ye hûn vê kafirstaniya hanê bi mir re dikin. Heger hûn misilman in, ji min re misade bikin ez herim zilamê xwe bibînim, xatirê xwe pê bixwazim. Ezê xwe pê helal bikim. De tu sîleh û qeweta min tuneye, xwedayekî min li jorê heye, bila qebûl neke.

Di nav karwanê de dubendiyek çêbû. Rabû hinek ji wan gotin:

— Lawo wele ev kafirstani ye, kesê tiştê wisa nekiriye.

Welhasil, ji Nazê re misade kirin, du mirov jî wekî şahid bi Nazê re şandin ko li ser devê Heso bibin şahid û Heso jî Nazê berde.

Nazê hat bi ser holika Heso de sekinî. Heso nexweş e, xayîs e, haya Heso ji bayê felekê tuneye. Ketiye halekî ko ne hal e. Xêr û şerê Heso tev di binê wî de ye. Kezeba Nazê şewitî hate xwarê. Nazê di ber xwe de got: »Niha ez bi vî halî ez xatirê xwe jê bixwazim, ew rihê ko heye jî wê here, ezê bibime sebebê qetla wî. Heso di wextê xwe de kêfçî bû, henekçî bû, ezê kilamekê ji Heso re bibêjim. Heta hişê wî were serî ezê xatirê xwe jê bixwazim«

Nazê li ber serê Heso sekinî û dest bi gotina kilama xwe kir:

Nazê dibê herê dewranê dewraanê dewranê
Le Nazê dibê Heso birîndaro sibeye
Ezê bi diyarê Geliyê Zîlan
Bi Çemê Hesen Evdalê dikevim
Ji xema dilê min ji te re bi dar kinêre
Birîndaro tê digere refên qaz û qûlingan
Bi lingên xwe digere
Ji xwe re bi nikûlê xwe diçêre
Kesî nedî dewrî bedîlî zemana salox nedaye


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Bira çawa rabe
Jinbira xwe di mala xwe de bide mêr e siwaro
Axx were were ax were birîndaro
Hayîîhaax ay hahîhîhî

Heso serê xwe ranake cewaba Nazê nade. Ji Heso kirî ko Nazê hatiye van teklîfên acî lê dike. Di dilê xwe de dibêje: »Halê min, kûla min, derd û birînên min ne bes in, ev hatiye tinazê xwe bi min dike. Ev rihê ko heye jî distîne.« Qet serê xwe ranake. Nazê kilama xwe berdewam dike:

Nazê dibê herê dewranê, dewranê, dewranê
Le Nazê dibê Heso birîndaro sibeye
Ezê bi diyarê Geliyê Zîlan
Bi Çemê Hesen Evdalê dikevim
Dilê min bi demar e
Kuro malxirabo bejna min bilind e
Ji te re pira li serê heft riya
Kûlîlka diwazdeh waran e
Ev îro sê roj û sê şevê min qediyaye
Bi xwedê xwezgîniyê min
Di mala Qûlîxanê birayê te de li hev civiyane
Le heftê hezar qalanê min
Bi pênç heb çek gelo xelata min dane
Nexweşo birîndaro ka serê xwe rake
Nizaanim birînê te çawa ne
Birîndaro serê xwe rake
Qasekî ji xwe re li xemlaa min mêze keê
Wele vanê du heb şahid
Di navbeyna min û te de sekinîne
Ez îro hatime xatirê xwe bi te dixwazim
Ez nizanim birînê te çawa ne siwaro
Axx were ax were birîndaro axxx ay
Hahîhîîîîîî...

Belê Heso çavên xwe vedike. Nazê xêlkirî bi ser de sekiniye. Wekî nîvxêlê li qarişî Heso sekinandine. Yeqîniya Heso ji xwedê tê ko Nazê hatiye teklîfa berdana xwe li Heso dike. Heso li xwe dinêre, li halê xwe dinêre, li

binîrên xwe dinêre ko kurm di birînên Heso de dileyîzin. Kezeba Heso ji halê Heso re dişewite. Ji halê xwe re, ji birînê xwe re, ji derdê Nazê re li gorî qeweta xwe Heso serê xwe radike û dest bi kilama xwe ya ko ji Nazê re dibe bersiv, dibêje:

Heso dibê herê dewran e dewran e dewran e
Le Heso dibê lê lê Nazê rebenê
Sibe yi wezê bi diyarî Geliyê Zîlan
Li Çemê Hesen Evdalê diketim
îro ji taliê min û te re ji asîmanan li minê agir barî
Lê dilê min evdalê Xwedê
Ji hemî teyra hêlîna teyrê narî
Ewî heywanî hêlîna xwe çêkir
Ji asîmanê li binê qanatê reş û tarî
Nazê tu bi xatirê Xwedê kî
Tu hatî xatirê xwe ji min dixwazî
Bi vê teklîfa hanê te goştê canê min heland
Kezeba min di nava min de kiriye parî parî
Wele ez şakir im ji Xwedayê xwe re
Êşa ko daye min bila nede tu kurê camêra
Bila neyne serê tu canik û tu ciwana
Heft salan xistibû canê wî pêxemberê
Kûrma xwarî Nazê axx were were ax were ez birîndar im

Heso dibê Nazêêê te piçûkê
Li ber miradê te çavreşê bejn bilindê
Gerden qazê te sing sipî ye
Belek î berfa çiyakê li ser xalyazê
Heso çima pê nekir miradê
Nazê tu bi xatirê Xwedê kî
Tu hatî xatirê xwe ji min dixwazî
Tu giyayê binê min teze bike
Birîndaro bila serê xwe deyne û razê ax ay haîhaî

Nazê dibê herê dewranê dewraanê dewranê
Le Nazê dibê Heso birîndaro sibe ye
Ezê bi diyarê Geliyê Zîlan


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Bi Çemê Hesen Evdalê diketim
Dilê min hêlîna teyrê li etek e
Nexweşo birîndaro jê firiyane
Refê qaz û qûlinga teyreka per belek e
Ez bi qûrbana te me
Gunê xwe bi halê xwe neyne
Ezê çoka xwe deynim
Serê xwe li ser çoka min deyne
Te rabe rûnê destê xwe veke
Dûayên nexweş û birîndaran
Li cem Rebê Alemê yek bi yek e
Ez bi qûrban rabe emê dûayekî
Ji rebê xwe bixwazin Xweda xwedayekî mezin e
Belgî êşa canê te li canê min peyde ke
Bila ez piştî Hesokê xwe
Ji kesî re nebime bermalya mala teze siwaro
Ax were were ax were birîndaro hahîhahî

Heso dibê herê dewran e dewran e dewran e
Le Heso dibê lê lê Nazê rebenê sibe ye
Ezê bi diyarê Geliyê Zîlan
Bi Çemê Hesen Evdalê diketim
Dilê min hêlîna teyrê li sîmir e
Lê lê Nazê kûlê dilê min giran e
Xemê dilê min li hûndir e
Îro Ava Geliyê Zîlan Çemê Hesen Evdalê
Tê bi ser me de gur e gur e
Bes e Nazê tu bi xatirê Xwedê kî
Tu hatî xatirê xwe ji min dixwazî
Vê teklîfa hanê çawa tu cozdan û meqesê
Berbera bidî serê dil û cîgera min
Ji xwe re bibirî Nazê
Ax were were ax were
Ez birîndar im

Hesoo dibê here Nazê te piçûkê
Li ber miradê te çav reşê bejn bilindê

Gerden qazê te sing sipiyê
Belekî ji berfa çiyakê
Li ser Xalyazê çima Heso pê nekir miradê
Lê lê Nazê tu bi xatirê Xwedê kî
Tu hatî xatirê xwe ji min dixwazî
Tu rabe giyayê binê min teze bike
Birîndaro bila serê xwe deyne û razê
Haîhaî

Nazê dibê herê dewranê dewranê dewranê
Le Nazê dibê Heso birîndaro sibe ye
Ezê bi diyarê Geliyê Zîlan
Bi Çemê Hesen Evdalê diketim bi bax û reze
Îro Ava Geliyê Zîlan Çemê Hesen Evdalê
Tê bi ser me de bi xar û lez e
Nexweşo birîndaro gunê xwe bi halê xwe neyne
Ezê çoka xwe deynim
Serê xwe li ser çoka min deyne
De rabe rûnê destê xwe veke
Dûayên nexweş û birîndaran
Li cem Rebê Alemê yek bi yek e
Nexweşo birîndaro rabe emê dûayekî
Ji rebê xwe bixwazin Xwedê Xwedayekî mezin e
Belgî êşa canê te li canê min bibeze
Ez piştî Hesokê xwe
Ji kesî re nebime bermalya mala teze
Ezê serê xwe êdî girê nedim
Xêliya sor gevez e siwaro
Axx were were ax were birîndaro
Hahîîîî

Heso dibê herê dewranê dewranê dewraanê
Le Heso dibê Nazê rebenê sibe ye
Ezê bi diyarê Geliyê Zîlan
Bi Çemê Hesen Evdalê diketim
Ji xema dilê min û te re bi bar e
Îro Ava Geliyê Zîlan Çemê Hesen Evdalê


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Tê bi ser me çiqas bi meyl û xwar e
Belgî Xwedê Teala min ji birakê min re nehêle
Çawa bi xeberê jina xwe dike
Bi çepilê min digire min davêje Geliyê Zîlan
Çemê Hesen Evdalê êvar e ne gaziye li minê ne fîraz e
Nazê tu bi xatirê Xwedê kî
Tu hatî xatirê xwe ji min dixwazî
Tu xwe berde devê Geliyê Hesen Evdalê
Ji min re bîne tasek ava sare Nazê
Ax were lê lê Nazê te piçûkê li ber miradê
Te çavreşê bejn bilindê gerden qazê
Te sing sipiyê belekê berfa çiyakê
Li ser Xalyasê Heso pê nekir miradê
Nazê tu bi xatirê Xwedê kî
Tu hatî xatirê xwe ji min dixwazî
Tu giyayê binê min tezeke
Heso serê xwe deyne belgî Xwedê emanetê xwe
Ji min bistîne birîndaro ranazê ax haayyy

Belê, Heso avê dixwaze, heta Nazê diçe avê jê re tîne, serê xwendevan û haziran xweş û sax be. Heso canê xwe dispêre rehma Xwedê Teala. Nazê jî diçe ber serê Heso disekine, destê xwe ber bi asîmanan ve bilind dike û dibêje:

— Ya Rebî tu rûhê min jî bi yê wî re bistînî. Bila piştî mirina Heso ez jî li dinyayê nemînim...

Xwedê Teala dûayên wê jî qebûl dike, Nazê jî li vê derê canê xwe teslîm dike. Îro tirba Heso û Nazê li Geliyê Zîlan Çemê Hesen Evdalê ne û ev tirb bûne ziyaret.

* Cara yekem min çîroka vê kilamê, di sala 1983'yan de li gundê Badayê ya Misircê (Kurtalanê) ya Sêrtê ji devê pîrika xwe Şêfîqe guhdarî kir. Wê gavê bi Şakirê birayê xwe re li gund diçûm dibistanê û di hefteyekê de bi kêmasî sê car pîrika min, li gorî daxwaza me, kilama Heso û Nazê ji me re digot.

Her çiqas min ev kilam di çend salên dawîn de, ji devê çend dengbêjan guhdarî kiribe jî, cara dawîn di sala 1997-an de li Edeneyê li mala Birahîmê Torî me ji devê Dengbêj Salihê Qubînê guhdarî kir.

Dema Salihê Qubînê bi awaza Xerzanî ev kilam digot, sîlûetên ko pîrika min digotin, li ber çavên min kifşe dibûn.

Wekî gotina dawî; her çiqas kilam ji Dengbêj Salihê Qubînê hatibe wergirtin jî, çîrok û diyalogên kilamê ji pîrê Şefîqe hatine hînkirin. (S.K)


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

## 16. Bavê Elfezya Siwarê Eznawir: Ferzende Beg

Ferzende Beg, ji Eşîra Hesenan mêrxas û şerkerekî çak e. Yek ji pêşewayên »Serhildana Agiriyê« ye. Di vê tevgera navborî de navê wî, piştî Îhsan Nûrî Paşa û Bro Hesko (Brahîm Paşa) Têlî tê. Tabî di vê tevgerê de navên wekî Xalis Beg, Nadir Beg û Memo Beg (zarokên Kor Hiseyn Paşa), Elîcan, Reşoyê Silo, Seyîdxan û Zahir Axa jî têne bilêvkirin û piraniya van navan, di gotin û kilamên dengbêjên welêt de, bi mêrxasî û cengawerî têne jiyandin.

Ferzende Begê Hesenan, beriya Tevgera Agiriyê, di sala 1925-an de beşdarî Serhildana Şêx Seîd dibe û bi taybetî li dorhêla Melazgira Mûşê mohra xwe li bin qehremaniyên mezin dide. Li gorî hinek çavkaniyan, piştî têkşikênandina Serhildana Şêx Seîd, Ferzende Beg ligel 150 siwariyên xwe derbasî nav sînorên Îranê dibe. Dîsa li gorî van çavkaniyan, gava ev dixwaze xwe li sînor bixe, ji hêla leşkerên tirk ve tê birîndarkirin.

Piştî ko ew derbasî aliyê Îranê dibin, hêzên Îranî ji wan daxwaza teslîmkirina çekan dikin, lê ew vê yekê qebûl nakin. Di navbera hêzên kurd û hêzên artêşa Îranê de şerên dijwar derdikevin û tê saloxdayîn ko di encama vî şerî de, Şemsedînê Xalid, Bavê Ferzende Silêmanê Ehmed, Kerem Begê Zirkanî û Evdilbaqî jiyana xwe ji dest didin û Ferzende Beg jî birîndar dibe. Yên ko ji ber gule û barûdên leşkerên Îranî filitîne, xwe spartine hawara Simko Axayê Şikakî.

Li gorî hinek çavkaniyên din, ev derbasbûna hanê, ne piştî têkçûna Tevgera Şêx Seîd, lê piştî Têkçûna Tevgera Agiriyê pêk hatiye. Lewre jî di dîrokê de navê şerê di navbera kurd û iraniyan de, wekî »Serhildana Makoyê« tê zanîn ko di sala 1931'î de pêk hatiye. Di vê serhildanê de hêzên leşkerên Îranî, raserî 6-7 hezarî ye û wekî fermandar, li ser serê wan Kelb Elîxan Nexsîwan heye. Hejmara leşkerên kurd, ko di nava wan de kesên wekî Ferzende Beg û Bro Hesko Têlî jî hene, ji 900 kesî pêk dihat. Piştî vê serhildanê, Kelb Elîxan Nexşîwan jî di nav de, bi qasî 700 kesên ji hêzên îranî, ji hêla Serhildêrên kurd ve têne kuştin. Serhildana navborî,

piştî lihevkirin û yekbûna hêzên tirk û îranî hate têkşikandin.

Her çiqas me got, navê Ferzende Beg û kesên din di Serhildana Şêx Seîd û Serhildana Agiriyê de jî derbas dibe, di rastiya xwe de mêrxasî û cengaweriyên van ciwamêran, di kilam û gotinên dengbêjan de bi salan e ko derbas dibin. Li gorî van kilaman ko emê yek ji wan li jêr bidin, qewimîn û bûyer piştî têkşikestina Serhildana Şêx Seîd pêk hatine. Ev yek di pirtûka nivîskarê kurd Rohat Alakom a bi navê »Hoybûn Örgütü ve Axri Ayaklanmasi« (Rêxistina Xoybûnê û Serhildana Agiriyê) de jî hatiye pesendkirin.

Niha jî beriya ko em derbasî kilama li ser Ferzende Beg bibin, kerem bikin em cih bidin beşek nirxandinên li ser Ferzende Beg ko di heman pirtûka Rohat Alakom de cih ji xwe re peyda kiriye:

»...Ferzende Begê ko di Serhildana Şêx Seîd de nayê girtin û derbasî Îranê dibe, di sala 1927-an de ji bo ko beşdarî li Serhildana Agiriyê bibe, dizivire. Bi awayekî aktîf beşdarî li Şerê Agiriyê dike û mohra xwe li bin qehremaniyên mezin dixe. ÊRîş û sabotajên mezin li dijî hêzên neyar pêk tîne. Serekê Serhildanê Îhsan Nûrî Paşa, di bîranînên xwe de ji bo Ferzende Beg nirxandinên balkêş dike. Qedrî Cemîl Paşa di di bîranînên xwe de ji bo Ferzende Beg gotina »abîdeya zindî« bi lêv dike. Osman Sebrî, di nivîsa xwe ya bi navê »çar leheng« de Ferzende Begê wekî »lehengê yekemîn« bi nav dike. Di şerekî de du alay leşker bi ser wî de dişînin. Ferzende Beg bi 60 kesî li dijî vê hêzê şer dike û qehremaniyeke mezin bi dest dixe. Fermandarê tirk, piştî vê têkçûnê, raporeke sexte amade dike û diyar dike ko tevahiya gundên derdorê piştgirî û alîkariya Ferzende Beg kirine û leşkerên wan kuştine. Li ser vê yekê bi qasî 80 gundên li Geliyê Zîlan wêran dikin û dişewitînin. Osman Sebrî di nivîsarekî xwe de diyar dike ko ji ber qehremaniya Ferzende Beg 80 gund hatine şewitandin. Hesen Hişyar jî di heman baweriyê de ye...«

Le axao hey li min li min li min
Bê maqûlo hey li min li min li min
Le Asyayê bi sê denga bang lê dike
Dibê de lê lê Besrayê rebenê sibe ye
Şereka li me çêbû
Qaleka li me qewimî
Le Kil Îskender
Li sûr û bedena Salim Begê


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Li hewşa kafirê Emer Tûman
Dayê rebenê vê sibê
Li ser kaniyê way ax way

Le belê ji êvara Xwedê ve
Li gohê min xweş tê
Dengê gula topê li me sil kir
Sewtêna mîrata vê boriyê
Gule û barûdê vî kafirî
Li me dibare dayê mînanî
Tevana gelo li ber taviyê

Le Asyayê bi sê denga bang lê dike
Dibê de lê lê Besrayê
Hey lê agirê Helebê
Bi derê mala bavê te ketê
Tu rabe li ber çoka Ferzende rûnê
Tu bêje Ferzende mala te xirab be
Lo bila mala min jî pê re
Te digo 'Ez Ferzende me ez Ferzende me'
Ez bavê Elfezya Siwarê Eznawir im
Xwedanê kuçik çapliya me
Rojê qale qalê oxirmê giran
Li welatê 'ûçincî ordiyê' de
Mêr di ser min re qet tune ne
Evya ne şerê me û Hesenan e
Ne şerê Heyderan e
Ne şerê Cibiran e
Ne şerê Sînikan e
Ne şerê duwazdeh bavê eşîratê giran e
Evya ecem e 'bêşincî mezheb' e
Ne dîn e ne îman e
Li gorî qarşî şerîeta Mûhemed
Li qarşî me disekine me dixapîne
Ji êvara Xwedê ve
Cinazê Silêmanê Ehmed
Bi tevî komê Hesenan ve

Gelo li pêş miqabilî çavê min e
Ezê bi du gulê tometîka vî kafirî
Birîndar im
Destê min têtikê mîrata modoliyê
Modoliyê nagire dayê rebenê
Pêçîka min a şahidê li min nagere
Heyfa min nayê li kuştina mêran û şêran
Heyfa min tê li wê heyfê
Çar heb ji tûxayê vî kafirî
Li ser me re sekinîne
Ji milê Silêmanê Ehmed
Bavê Kazim digirtin
Dixistin nîşanê Hemîdiyê

Le Axao wile nabe bile nabe
Îşev sê şev û sê roj e
Şer ketiye ser milê Keremê Qolexasî
Mêrekî çê tê kuştinê
Bi du gula birîndar e
Bi sonda mezin sond xwariye
Tê kuştinê lo bira jê venabe
Erz û eyalê Mala Emer
Îşev sê şev û sê roja
Li kavila Îranê digere nagere yêr nabîne
Ji xwe re li ser pişta kihêl û malekiyan
Lo bira peya nabî

Kerem dibê wez Kerem bim
Ez Kerem bim
Ez firar û qaşqûrê mehkûmê
Dewletê bim
Berxê Mala Emer bim
Ezê bi maleka weka Mistefa Begê re mal bim
Evî kafirê li bira qesr û qûnaxê me girtine
Dibên tivingên destê xwe deynin


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

## 17. Welatperwerekî hêja, dostê feqîran: Dr. Yusuf Azîzoglu (1917–1970)

»Yusuf Azîzoglu, heta tu bibêjî bes miroveki hêja û nefsbiçûk bû. Quretî li cem wî peyda nedibû. Tim û daîm dixwest ji bo miletê şerqê kar û xebatê bike. Ji malbateke mezin û dewlemend dihat. Lewma jî, her gav derî û dîwana mala wî, ji xelqê kurd re vekirîbû. Dabara bi sedan kesan dikir...«

Belê der barê parlamenterê kurd Dr.Yusuf Azîzoglu de, dostê wî Dengbêj Mahmûd Qizil wisa dibêje. Yusuf Azîzoglu, di sala 1917-an de, li Farqînê (Silîvan) ko bi ser Diyarbekirê ve ye hatiye dinê. Ew bi eslê xwe ji heman navçeyê, ji eşîr û malbata Ferhendiyan, birayê Hacî Huseyn Axa ye. Ji malbateke dewlemend tê û xwedî 6-7 gundan e. Ji wan çend gundên wan ên ko me bidest xistine navê wan ev in: Tirbesipî, Tilmî û Soranê. Azîzoglu, dibistana seretayî li Farqînê, dibistana navîn û lîseyê jî li Amedê diqedîne û ji bo perwerdehiya tibiyeyê, qeyda xwe li Zanîngeha Stenbolê Fakulteya Tipê dike. Yusuf Azîzoglu, di dema perwerdehiya xwe ya li Stenbolê de, wekî bi dehan xwendekarên welatparêz ên kurd, li »Dîcle Talebe Yurdu« yê dimîne û hewl dide xwe ko, ev der bibe navenda şiyarbûna şagirtên kurd û qada çandê.

### Azîzoglu dibe wezîrê tendurustiyê

Piştî xwendina xwe ya zanîngehê, Azîzoglu bû doktor. Pê re pê re jî, giraniya xwe da siyasetê. Wekî tê zanîn piştî cuntaya leşkerî ya 1960'î, li Tirkiyeyê çend partiyên siyasî hatibûn avakirin. Yusuf Azizoglu, ligel çend hevalên xwe yên bijare û welatperwer, di 13'ê reşemiya 1961'ê de YTP'ê (Yenî TÜrkiye Partîsî) ava kir. Piştî çend mehan, di hilbijartinên ko pêk hat de, vê partiyê gelek parlamanter derxistin û wekî şirîkê hikûmetê kete kabîneyê. Azîzoglu, di hikumetê de, wekî Wezîrê Tendurustiyê kar û bar meşandin.

Yusuf Azîzoglu, piştî ko dibe wezîr ji bo kar û barê tendurustiya welatê xwe di cih de bibîne û di vê riyê de projeyan saz bike, diçe Tetwanê ko

navçeya Belîsê ye. Lêkolîner û zimanzan Feqî Huseyn Sagniç ko yek ji dostên Azîzoglu ye û bi hev re karê siyasetê jî gerandine, di xebata xwe ya bi navê »Portreler« de behsa serdana wî ya li Tetwanê wisa dike: »Piştî ko bû wezîr, hate Tetwanê. Wê çaxê, tevî çend hevalan, me li Tetwanê ji bo ko xaniyên tendurustiyê (Saglik Ocagi) vekin û bi karê tenduristiya gel re mijûl bibin, me komeleyekê ava kiribû. Ez ne şaş bim navê wê 'Komeleya Parastina Tendurustiya Gel' (HalkÎn SaglÎgnÎ Koruma Dernegi) bû. Li Tetwanê ji bo xebatên xwe me jê alîkarî xwest. Li gorî pereyên wê demê, ji me re got, 'Ezê 50 hezar lîre ji we re bişînim, bi vê pereyê ji bo saglik ocagi ji xwe re eraseyek bistînin, ezê peyderpey ji bo we alîkarî bikim...'Piştî demeke kin, pereyê ko behs kiribû ji me re şand, me jî eraseyek kirî û me dest bi xebata xwe ya tendurustiyê kir...«

Yusuf Azîzoglu, di karê xwe yê wezaretiyê de, mohra xwe li bin peywirên giring dabûn. Ji bo ko li seranserê Tirkiyeyê pêk were, xebata 'Projeya Tendurustiyê' dabû destpêkirin. Ji bo vê yekê jî çend bajarên welêt ên wekî Sêrt, Belîs û Mûşê wekî 'Herêma Pîlot' hilbijartibû.

### H. Oguz Bekata: »Azîzoglu 'cûdaxwaz' e!..«

Xebata wî ya ji bo gelê kurd, kir ko ew ji wezîrtiyê îstîfa bike. Ji ber ko Wezîrê Karê Hûndirin ê demê H. Oguz Bekata, di meclîsê de gotibû ko Azîzoglu, nîjadperestî û kurdîtiyê dike. Bekata, vê yekê bi kar û barê li xebata tendurustiyê ya welêt ve girê dabû û van xebatan wekî 'cûdaxwazî' binav kiribû û wisa gotibû: »Azîzoglu, doza kurdîtiyê dike. Projeyên tendurustiyê dide mutehîdên kurd û karkerên kurd dide xebitandin. Heger, Azîzoglu li meclîsê biaxive û bibêje, 'Ez ne kurd im, ez tirk im ezê jî gotinên xwe yê der barê wî de, paş de vekişînim...«

Yusuf Azîzoglu, van gotinên Bekata bê bersiv hiştibû û ji karê xwe yê Wezaretiyê îstîfa kiribû, êdî wê xebatên xwe wekî parlamenter, di riya gelê xwe de bidomanda. Dîsa li gorî malûmatên Feqî Huseyn, pişt re ew dibe Serokê Giştî yê YTP'ê û di destpêka sala 1970'î de, ji ber nexweşiya xwe ya xedar, ji serokatiya partiyê jî, îstîfa dike.

Belê di heman salê de, ji ber nexweşiya xwe ya weremê, (tuberkuloz) ji nav gelê xwe yê 'şerqê' koç kir û bû mêvanê axretê. Li gorî saloxdayînên ko min ji çend kesên Farqînî bi dest xistin, wê roja ko cendekê Azîzoglu, anîbûn Farqînê bi dehezaran kes, li Farqînê civiyabûn.

Hezkirina Azîzoglu di nav gelê wî de kir ko, dengbêjên herêmê li ser wî kilaman çêbikin. Yek ji wan dengbêjan jî Mehmûd Qizil e ko, bi navê


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

‘Lîdero’ li ser wî kilam çêkiriye û di kaset û sêlikên xwe de xwendiye ko piştre bi dehan dengbêj li çermedorê welatê me vê kilamê gotine.

Kerem bikin em niha guhê xwe bidin vê kilamê ko ji hêla Mehmûd Qizil ve hatiye çêkirin û me ji devê wî girtine...

Lîdero
Lîdero lîdero lîderoo
Lîdero qurban li me dabû stêrka sibê stêrka salê
Lîdero qurban li me dabû stêrka sibê stêrka xurbetê
Ezîzoxlî mehkî berê îstîfa dîlekça xwe da Enqerê
Li Reîsê Cimuryetê
Heyfa min nayê li wê yekê
Heyfa min tê bi wê yekê
Di welatê şerqê de bila li piştî babê Murado
Kesekî ranebe neke dawa siyasetêêê ax
Lîdero lîdero
Bê lîdero ez nemînim li dinyayê
Heta sax bim li dewrana dinyayê
Lidêrekî mîna Ezîzoxlî
Babê Murado tucarî nayê Tirkiyayêêê ax
Hahîhîîîî

Lîdero lîdero lîderoo
Lîdero qurban li me dabû stêrka sibê stêrka salê
Evî mîratê radiyoyê yayîn dikir
Xeberkî ne bi xêrê ji me re tanî
Nav û dengê mirina Yûsif Ezîzoxlî
Tirkiyayê lawo heft diwalê ecnebî tev hilanî
Ezîzoxlî te mala xwe tenê xira nekir
Te kon û çîtên perdê me feqîran bira li ser danî
Ax lîdero lîdero lîdero
Wez nebînim li dinyayê
Heta sax bim li dewrana dinyayê
Lîderkî mîna Ezîzoxlî nayê Tirkiyayêê ax
Hahîhîîî

Lîdero lîdero lîderoo
Lîdero qurban li me dabû
Çûme Diyarbekira şewitî lawo
Bi kevirê reş û tarî
Evî mîratê teyarê cinazê Ezîzoxlî
Ji me kurmanca re ji Enqerê hey lo lawo
Hediye tanî
Ezê çûme ser cinazê Ezîzoxlî
Min go Ezîzoxlî te mala me xira kir
W'em nizanin li Enqerê
Heyra te tembiya me feqîran
Keko îcar li kî danî
Ax lîdero lîderê me feqîran
Ez nizanim piştî babê Murado
Berê me kete bajarê Enqerê
W'em nizanin derdê xwe bêjin ji kê re ax
Lîdero ez nebînim li dinyayê
Heta sax bim li dewrana dinyayê
Lîderkî mîna Ezîzoxlî nayê Tirkiyayêêê ax
Hahîîîî

Lîdero lîdero lîderoo
Lîdero qurban sibe ye ezê çûme Farqîna şewitî dayê
Bê li hafê deştê
Minê bala xwe didayê bîna bayê çiya lê dixe
Dayê rebenê li bejn û bala Ezîzoxlî çiqas xweş tê ax
Ezê çûme li ser cinazê Ezîzoxlî
Derb û birîn tê de tunebû
Axîn dike ji derdê miletê şerqê
Ji kezebê xwîna reş tê
Lîdero lîdero wez nemînim li dinyayê
Heta sax bim li dewrana dinyayê
Lîderkî mîna Ezîzoxlî nayê Tirkiyayêêê ax
Hahîîîîî

Lîdero lîdero lîdero
Lîdero qurban çûme Farqîna şewitî


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Dayê rebenê bi hewl û bî ye
Minê bala xwe didayê
Berê vê êvarê pêşiya texsiya derketî
Texsiya Ezîzoxlî dayê rebenê
Hezê hezê li pêşiyê
Ez çûme pêşiyê min go belkî mala we xirab e
Çi bû çi qewimî çi ciriya mesele çi ye
Digotin belkî mala we xira be
Heyra Wele Yûsif Ezîzoxlî ji Enqerê
Ji Biyuk Milet Meclîsê xeyidiye ebediyen
Şerqê malikşewitî hiştiye bê xweyî yee ax
Ax lîdero lîdero lîdero
Lîderoo lîdero qurban
Wez nebînim li dinyayê
Heta sax bim derdê Ezîzoxlî
Derdekî giran e lawo
Ji dilê me dernayê
Heta sax bim li dewrana dinyayê
Lîderkî mîna Ezîzoxlî babê Murado
Tu carî lawo nayê Tirkiyayêêêê axx ê
Hahîîîî

## 18. Teyrê ser milên qîz û bûkan: Dengbêj Ferzê

Dengbêjê bi nav û deng Ferzê ango Ferzende, ji gundê Kevir a Melazgira Mûşê ye. Di dem û dewrana xwe de wekî Şahê Dengbêjan û Teyrê ser milên qîz û bûkan dihate naskirin. Li warê Serhedê yek ji dengbêjên herî mezin û bi kêf bû.

Wekî tê zanîn, ji berê ve di nava eşîrên kurd de rikeberî, kîn û edawat hebûye. Dîsa li gorî saloxdayînan, li ser rikeberiyeke wisa, di daweteke de Dengbêj Ferzê ji hêla Zekiyê Lawê Mîralî ve hatiye kuştin. Li gorî hinek kesan jî ev yek ne rast e. Piştî kuştina Ferzê, Dengbêjê navdar Reso ko mamosteyê Şakiro ye, li ser wî kilamekê çêdike ko emê niha li jêr bidin. Lê berî wî em hinekî berê xwe bidin roja qewimîna kuştinê:

Roja ko li gundê Kevir dawet û dîlan çêdibe, ji bo ko were dawetê û çend kilaman bibêje, mûma (dawetname) Ferzê jî dişînin. Wekî bi dehan giregirên dorhêlê, wan mûma Zekiyê Lawê Mîralî jî şandiye. Zekiyê lawê Mîralî ji eşîra Şewêşiya, pismamê Fesîhê Mihê Mîrze bixwe ye.

Rast e eşîrên kurd bê çek û sîleh naçin şahî û dîlanan. Şeşagir (bêşataş) ên wan hebûne. Govend û dîlan xilas dibe, dora siwarkirina bûkê ye. Dibêjin: Bila Ferzê were kilaman bibêje. Saloxê didin ko di dawetê de 50 60 siwarî hebûne. Bûk derdikeve, Ferzê kilaman dibêje. Di wê navberê de siwarî bi şeşagir û berdengeyên xwe guleyan diavêjin. Zekiyê lawê Mîralî gava ji demançeya bi navê Malnihêr’ gule diavêje, diçe li Ferzê dikeve. Malnihêr, şeşagirê wê demê bûne. Ferzê li cihê şahiyê, ji ber guleya Zekiyê Lawê Mîralî dimire.

Gelo ji bo çi Ferzê hatibû kuştin. Di vê kuştinê de qestîbûnek hebû an na? Gelek kesên ji herêmê dibêjin ko, hindê Ferzê dengbêjekî bi nav û deng bû, di civatan de alemê jê hez dikir ko Zekiyê lawê Mîralî jê qehirî û lê xist, kuşt. Lê Dengbêj Zûlkuf ko bi eslê xwe ji Erzeromê ye, diyar dike ko piştî qewimînê, Zekiyê Lawê Mîralî ji firariyê hatiye gundê wan û ji bavê wî re sond xwariye û gotiye ko gule bi şaşî ji destê wî teqiyaye û Ferzê kuştiye. Belê wekî me li jor jî behs kiribû, Dengbêjê bi nav û deng


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Reso li ser wî kilam çêkiribû.

Niha emê bala xwe bidine kilama Ferzê ko çêkerê wê Reso ye lê me ji devê dengbêj Zûlkuf girtiye. Li gorî gotina Dengbêj Zûlkuf, wî ev kilam ji devê dayika xwe ya dengbêj Senemê girtiye...

Xasê digo Nazê
Nazê digo Bîlnazê
Bîlnazê digo lê lê Gulnazê Gulnazê
korê ax...
Korê de rabe ezê bi Melazgirê bi
gundê Kevir biketama
Wê bi zeviya ketim way way way

Sibe ye min dêhna xwe dayê
Du heb siwar derketin derê Ferzen

Şahê Dengbêjan
Teyrê ser milê qîzan û bûkan wî
De bavê Mihemed Salih namekê
didane destan
Digo li gundê Kevir dawet e
Kerem ke were kambaxa vê dawetê
way way way

Min dît Ferzende bavê Mihemed
Salih Şahê Dengbêjan
Li malê li Boa siwar bû
Dikete binya mala go sê cara
Di bin da li kinî sivêr ketî
Xasê diçû pêşiyê digo bavo tu neçe
kambaxa dawetê
Digo lê lawo tu nizanî gotinê bapîrê min e
Co sefer ji bavê berê de ji mala
bavê te tê way way way

Birîndaro de deng nayê
Birînxedaro lo de deng nayê

Birîna bavê Mihemed Salih giran e
Dinale dinale dinale dinale
Çima bixew nayê way hahî hahî
Xasê digo Nazê
Nazê digo Bîlnazê
Bîlnazê digo lê lê Gulnazê xweyê
Sibe ye bi Melazgirê bi gundê Kevir biketama
Soran û son derbas kir
Min dît bûk ji derê malê de hatî
Bavê Mihemed Salih
Teyrê ser milê qîzan û bûkan
Kilam digotê çerxa dawetê saz kir
way way way
Kula Xwedê tu yê bi kulê bikevî
Mala Zekî Lawê Mîralî

»Min dît demançekî şeşagira Mal nihêrî
Daye li bedena bavê Mihemed Salih
Şahê Dengbêjan
Mîrata gula malnihêrê
Movikê pişta xilas kir way way way

Dibê wezê bi gundê Kevir
Bi Melazgira Şewitî biketama
bi dare
Bavê Mihemed Salih ji ser pişta
hespê da ketî erdê
Gazî dike gelî siwaran mala we
xerab be
Birîna min kûr e herî xedar e
Hey Melazgiriyan mala we xerab be
Bidin Şahê Dengbêjan
Teyrê ser milên qîzan û bûkan
Taseke ava sar e way way way

Birîndaro de deng nayê
Birînxedaro lo de deng nayê


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Birîna bavê Mihemed Salih giran e
Dinale dinale dinale dinale
Çima bixew nayê way way way
Hahî hahî
Xasê bi sê denga dike gazî
Digo Nazê Nazê digo Bilnazê
Bîlnazê digo lê lê Gulnazê
Sibe ye bi Melazgirê bi gundê Kevir
biketama
Bi hêlîna kewê way way way
Birîna bavê Mihemed Salih şahê
Dengbêjan giran e
Dikim nakim nare fitile milê kewê
Di kêleka min de dinale
Nizanim çima serê min nagire balgê
û qewê way way way

Xasê bi sê denga dike gazî
Digo Nazê Nazê digo Bîlnazê
Bîlnazê digo lê lê Gulnazê
Sibe ye bi Melazgirê bi gundê Kevir
biketama Bi kereng e
Li bejna bavê Mihemed Salih
Şahê Dengbêjan mêze dikim
Li şal û şapika ezê bala xwe bidim
Têlikê tûtikê silîvanî reng e
Li bejna bavê Mihemed Salih mêze dikim
Kul bikeve mala Zekî Lawê Mîralî
Derbekê Malnihêrî li bedena vî
xweşmêrî daye
îro sê roje ketiye axê
Ez li der û dorê xwe dinêrim
Hezdiyê malê gundê dor heft reng e
way way way

Birîndaro de deng nayê
Birînxedaro lo de deng nayê

Birîna bavê Mihemed Salih giran e
Dinale dinale dinale dinale
Çima bixew nayê way way way
Hahî hahî

# 19. »Mîrê ribabê« Miradê Kinê û nîmûneyek ji dengbêjiya wî: Firman a*

Dengbêj Mirado ne tenê li herêma Torê, her wisa li seranserê bakurê welatê me; ji Botan bigirin heta Xerzan, Diyarbekir û Serhedê delalê ber dilê hezkiriyên kilam û stranên evînî û şeran bû. Dengbêjê hêja ji »Malbata Kinê« tê. Ji ber vê yekê jî wekî Miradê Kinê nav daye. Ev ciwamêrê hanê di lîteratûra folklor û hunera kurdî de wekî »Mîrê Ribabê« tê naskirin. Malbata wî bixwe di zargotina kurdî de reng û dewlemendiyeke hêja ye. Baş tê bîra min li mala me ya Misircê û piştre jî li Batmanê ko zarokatiya min li wan deran derbas bûye, ji sê kasetên ko tim dihate guhdarîkir in, yek ji wan jî kaseta Mirado bû. 'Ehmed Axa û Eyşê Xanimê', 'Lawikê Daqorî' û 'Seyra Gulîsor' ji bo min çend kilamên wî yên çêjdar û sereke ne. Lê di nav kilamên wî de yek heye ko tu dengbêj nikarin wekî wî xweş û baş bistrên. Ev kilama hanê, kilama »Ferman e« ko li ser »Serhildana Mala Eliyê Ûnis« tê gotin bixwe ye. Bi rastî jî gava mirov li vê kilamê guhdarî dike, hîsiyeta ko çawa wê lehzê mirov li qada şer pêk tê. Beriya ko em dêhn û bala xwe bidine vê kilamê, kerem bikin em guh bidin gotinên siyasetmedar û nivîskarê kurd Şerefxan Cizîrî bê ka ji bo gorbihûşt Mirado çi gotiye...

»...Deng li Kurdistanê hê jî wekî dengê Miradê Kinê peyda nebûye. Ew dengê zîz û zelal, bilind wekî Çiyayê Zagrosê û xurt wekî naqosa dêrên filehan, bûye normekî ji dengbêjiya Kurdistanê û li hemû deverên welêt belav bûye. Miradê Kinê bi dengê xwe yê berz û zelal, nexweşan ji nava livînan radike ser piyan... (Şerefxan Cizîrî-Kultur û Edebiyata Devkî, Weşanên Nûdem rûp. 46«

Firman a firman a firman a firman a
Firman a firman a firman a firman a
Xalo emê çi bikin şer giran a

Firman a firman a firman a firman a
Keko li me firman a
Ne bi zirtê odê kurê camêran a
Ne bi hovê kirikên simbêlan ba bide
Li nav qîz û bûk û jinebî û van pîrekan a
Ne ko mirov berê xwe bidê şerê giran a
Destê xwe bavêje van demançan û van alamaniyan a
Bila kesekî zirtê xwe nedê
Û nebê emê berê xwe bidin şer û qewxê giran a
Û bira li ser Mala Eliyê Ûnis
Qewmê çiyan a axao...

Firman a...
Xalo li me firman a..
Bira bila kesekê zirtê xwe nedê
Li ser Mala Eliyê Ûnis wa Qewmê Çiyan a
Û lê belê sond xwarina bi Şêx Evdilqadirê Gêlanî
Maz û Evdiyê nava Nisêbînê
Û bi perda wî Weysel Qiranî
Sond xwarine wî sî salê Siltan Şêxmûs
Bi wê qûbe û perda wan a
Û jin û namûs û pîrekên xwe

Bi sê telaqan berdana
Go emê serê xwe nakin şewqana
Emê destê xwe nakin kelemçana
Emê berê xwe nadin tu hepisxanê giran a
Bira emê tu cara destê xwe nakin
Destê van bêbavên tirkan a

Bira bila heçiyê ew in ew qisasê serê
Me bixwe na
Bira bîra we nayê wextê ko Şêx Seîd
Li devê Ûlû Camiya Diyarbekirê xeniqandin
Û stûyê wî avêtina şerîtê
Bûkên serbizêrî
Bi serê mala xwe ve dageriyana


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Bila hûnê wê rojê li bîra xwe bînin
Van eskerên Sêrtê, Bedlîsê, Wanê, Tetwanê
Xelatê, Erdîşê, Mûradiyan
Û Qersê, Qaxizmanê, Bazîdê û Erzeromê
Li ber Pira Malabadê li kenarê avê dîsanê
Van e li hev civiyana

Û lê belê hûnê li bejn û bala
Pîs neferan herçî ew in
Ewê ji me kurdan a
Hûnê derba lê bidin li bejn û bala
Van çawîşan, astêmena, ustêmena
Û van têmena, yûzbaşî û bînbaşî
Yarbay û albay û van buyuk qumandana

Wele bira ezê dênê xwe didimê
Li ber Pira Malabadê, li kenarê avê
Li ber Gorê Qeremûsê
Û li ser serê Mala Eliyê Ûnis
Çi ecêb û çi qiyamet û çi tofan a
Waye mewzî û tapiyê xwe kolan a
Û simbêlê reşê boyaxkirî
Avêtine van Meqerifê tivingan a
Bi elba fişek vala kirina ser gohkê van ebana
Wele bira dênê we li wa bê
Û bila Xwedê şeş kula lê bidê

Li mala çawîşên Farqînê
Tu nebê dûrebîn li ber çavê wî ya
Û dimêzênê li ber Pira Malabadê
Li Newala Qeremûsê
Çi ecêb û tofan a
Lêlî belê ewê çûye ser telefonê
Ciwabê didê Yedincî Qolordiya Diyarbekir
Û ji wê dê ciwab kete xopana bajarê Enqere
Ew dibê: 'Elo!'
Ew dibê: 'Efendim!'

Ciwab dane wê miclîsa giran a
Wa axao firman a finman a...

Wele firman a...li me firman a
Wele bira wextê ciwab kete
Xopana bajarê Enqerê
Wê miclisa giran a
Û lêlî belê carekî rabû bû çîreçîrê deriyan
Çingeçingê kursiyan û masa na
Û buya çîreçîrê van qeleman a
Û navê Mala Eliyê Ûnis
Deranîn ji van kuçik defteriyan
Navê wan avêtin dewra siltanan
Wele navê Mala Eliyê Ûnis
Carekî avêtina qezetana
Bû çîngeçing û zirezira telefonê wan a
Bila wê rojê şêst û heft welayetê
Tirkiyê xeber dana
Wa pê hesiyan a
Bila carekî mifte lê dane
Devê wan depoyan e
Bi sindoqan bi elban fişek vala kirina
Van mîratê cemsan a

Wele bila dênê we li wan bê
Heçî sûbay bûn ewê siwar bûn
Li van texsî û li van cîb û li van fordan a
Û heçî êdî sefer bûn li van ekmek çentesiyê
Xwe dagirtin ji baliqan û ji van sabûnan a
Wele heçî yedek sûbay bûn
Û nûka hatibûna eskeriyê

Nizanibûn berê xwe bidin
Şer û qewxê giran a
Nizanibûn çi ecêb û qiyamet û tofan a
Wele ewê siwar bûna li cemsan a
Mendîl û desmalên xwe


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Ji berîka xwe dertanîn
Û li siwarbûna li çemsan a
Ban kirine pîrekên xwe
Got: 'Heqinî helal edin!'
Emê berê xwe bidine
Şerê Mala Eliyê Ûnis
Qewmê Çiya na axao...

Wele firman a firman a firman a...
Li me firman a
Eme çi bikin şerê Mala Eliyê Ûnis
Û hikûmatê
Wezê dênê xwe didimê
Pir giran a axao...

Firman a... Li me firman a
Wele bira wezê dênê xwe didimê
Li ber Pira Malabadê
Li Newala Qeremûsê
Li min xweş tê dengê van mîratên
Otomotîk makîneliyan a
Wele lêlî belê Mala Eliyê Ûnis
Çawa bi elban fişek vala kirine
Ser gohên van eba na
Û sond xwarina bi Weysel Qeranî
Bi wî Siltan Şêxmûsî
Bi wê perda wan a
Û destê wan ji zarok û çolix û kifletên
Wan qetiyan a
Go emê serê xwe nakin şewqan a
Emê berê xwe nadin hepisxan e
Û emê destê xwe nakin darê kelemçan e

Wele namûs û pîrekên xwe
Bi sê telaqan ji xwe berdan a
Lêlî belê simbêlên reşê boyaxkirî
Avêtine van Miqerifê tivingan a

Lêlî belê Mala Eliyê Ûnis
Dênê xwe danê fişek û
Mermiyên wan neman a
Û zanibûn ko barê hikûmetê
Barê risês a zehf giran a
Û lêlî belê van bêbavên tirkan
Dênê xwe danê ko
Dengê tivingê wan nayê
Fişekên wan neman a

Lêlî belê carekî wan singo
Avêtin devê van sîlehan û tivingan a
Û hicûm berdana ser kozik û çeperên
Mala Eliyê Ûnis
Û heyf û mixabin wê rojê
Bîst û pênc mêrê me kurdan
Dane nav lingan e axao...

Wele firman a...Li me firman a
Wezê çi bikim Şerê Mala Eliyê Ûnis
Li ber Pira Malabadê
Li Newala Qeremûsê
Kenarê avê
Û emê çi bikin hemî emr û îrada
Xwedan e axao...

* Firman a: Orjînala kilamê 'Ferman e' ye. Lê ji ber Mirado ji herêma Torê ye, bi devoka torê mijûl dibe. Kesên ji vê herê mê, tîpa 'e'yê wekî 'a'yê bi lêv dikin. Mirado serdanpê bêjeya 'Ferman e' wekî 'Firman a' bi lêv dike. Lewre jî, ji bo orjînalîte û xweseriya kilamê me dest neda kilamê û wekî bilêvkirina resen berhev kir. (Salihê Kevirbirî)


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

# 20. Li warê Serhedê axînek ji kezebê: Qezaya Bûlanixê

Beriya niha bi 9–10 salan li welatê Serhedê, herêma Mûşê qezeyeke trafîkê pêk hat ko ev karesat ji wê demê heta îro di nav gelê herêmê de nehatiye jibîrkirin. Dev ji jibîrkirinê berdin, ji roja pêkhatinê heta îro ev qewimîn bi navê Qezaya Bûlanixê ji hêla dengbêjên herêmê ve bi awayeki dilşewatî tê gotin û li ser tê strandin. Gelo ev qewimîn çawa pêk hatibû?

Mecîdê Şifêr, li gundê Lîzê ko bi ser Bûlanixê (Kop) ve ye, bi cih û war e, hefteyê carekê seferekê ji bo Erziromê dike ango rêwiyan ji Bûlanixê dibe Erziromê. Roja qewimînê, otobûsa Mecîd bi awayekî dagirtî li hindava Bakimevî yê, li rasteka gundê Gêdûkê, li otobûsa Hecî Evdile diqelibe ko wî jî rêwî ji Melazgirê hildane û dibe Diyarbekirê. Di encama vê bûyerê de bi giştî 24 kes dimirin, 34 kes jî bi awayekî xedar birîndar dibin. Piştî vê karesatê, Cahîdê Dengbêj diçe cihê bûyerê û di cih de kilamekê diavêje ser vê qezayê.

Kerem bikin, em guhên xwe bidine kilama vî dengbêjî ko li ser Qezaya Bûlanixê gotiye.

Wayê wayê wayê wayê wayê
Ax bê wayê wayê wayê wayê ax
Mecîd lawo bila dayika te ji te re kor be lawo li dinyayê

Lê lê dayê rebenê rabe ezê bi kavilê
Bûlanix û Mûşê diketime birawo li me hatiye payiz e
Bira Xwedê neyine serê xelqê dayê rebenê payiza rengîn e
Keko welatê me Serhed e, berfa welatê Serhedê bi
ser me de dipûtîne
Mij û dûmana kavila Bûlanixê wisa bûye erd tije kiriye lawo
Çavê mirov erdê nabîne ji mij û dûmanê
Qebehetê şifêra tunîne ay

Lo bira Mecîd rabû ji kavila Lîzê ji xewa şêrîn e
Go dayê rebenê êvarê
Wele min serê xwe li ser balîfê danî lê
Gelekî xewnên xirab min di xewna xwe de dîne dayê rebenê
Min dît dîregê bînayên me ji binê dikeve lawo
Bînayê me li ser dîregekî dimîne ay

Lo lo bira tu bala xwe bidê qam û qidûmê min şikestî ne
Sibê dora Erzeromê dora me ye
Lo birayo dilê min û çûyîna kavila Erzeromê qet tûnîne
Min dît telefon li ser telefonê didane Lîzê
Digot lawo Mecîd lawo yolciyê te di xeracê de beklê te dike
Li hêviya te sekinîne wayê wayê wayê wayê ax

Lê lê wayê wayê wayê wayê ax
Mecîd lawo bila her du çavên dayika te
Ji te re kor be lawo li dinyayê

Lo lo bira tu bala xwe bidê
Serê sibê Mecîd xatir ji mala xwe dixwest
Wele siwar bû li mîrata otobosê mîrata dîreksonê dihejîne
Deh deqe ji saeta wî derbas dibe
Li girîşa Bûlanixê sê caran li qornê dixîne
Yanaşmîşî xeracê dibû
Şefîq ban kir go Mihemed Elî tu bike qêrîn e:
Her çî yolciyê me yê ko diçin Erzeromê
Bila lawo kesekî li erdê nemîne

Lo lo bira tu bala xwe bidê
Mecîd ji otobûsê peya bû dayê rebenê
Lîsteya yolciyê xwe hiltîne
Belgî Rebê Alemê tu bi kesî de neyîne
Ew roj otobûs wisa tije ye çima cî da qet rê tûnîne
Elbet Rebê Alemê ji wan re xirab tîne
Mecîd peya bû dayê rebenê tu sêr bike
Lîsteya yolciyê xwe hiltîne
Ew bi tevî Şefîq û Fayîqo xatir ji hev dixwazin


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Hev du helal dikirin dayê dibû qûzîn û zarîn û girîn e
Heyra bala xwe bidine min dî
Li Petrola Hacî Teharê Licî
Dayê rebenê mazota xwe hiltîne
Lo lo bira siwar bû berê wî kete Erzeromê dilezîne
Wayê wayê wayê bê wayê wayê wayê
Mecîd bira lawo her du çavê dayika te kor bin lawo li dinyayê ax
Hahîhî

Lê lê dayê rebenê bala xwe bidê
Ezê bi Bûlanîx û Melazgirê dikevim dayê rebenê li vî banî
Ew otobûsa ko ji kavila Melazgirê derketiye
Hecî Evdile lê siwar e »Teyrê Ecelê« li kêleka wî siwar bûye
Bira ji kavila Melazgirê deranî

Lo lo bira tu bala xwe bidê li Bakimeviya rasta Gêdûkê
Her du otobûsa bi serî li hev du dikevin dayê rebenê
Wele dengê van mîrata mîna dengê top û tivinga bira
Ji xwe re deng deranî

Lê lê dayê rebenê bala xwe bide
Belgî Rebê Alemê tu bi kesî da neyinî
Keko wele fîzan û zarîna kuştî û birîndara ji erşê zibil anîn
Ew roj bira 24 kuştî 34 birîndar ji her du otobûsan deranîn
Min xwe xwar kirî binê otobûsa
Heyra tu bala xwe bidê
Lo lo bira belgî Rebê Alemê tu bi kesî da neynî
Xwîna cinaza û kuştiya ji binî dikişe lawo mîna çem û kanî

Lo bira tu bala xwe bidê dotira rojê
Emir derxistine sê cemse esker deranîn
Serê sibê li Bûlanixê
Sawcî û hakimê gelî Kopê bira tev hilanîn
Lîste bi wan re ye min dî kimligê wana derxistin birawo
Bi ser pêsîrê wan ve danîn
Heyra wele serê sibê cinazan derxistine
Li ser bûzê cemedê pêşiya berfê dayê rebenê danîne

Lo lo bira tu bala xwe bidê
Lîste bi wan re ye kimligê wana ji cêba wan derxistin
Keko wele bi toplînê bi pêsîrê wan ve danîn
Bi têlsiz û têlefonan didane şar û bajar û memleketan
Her kes dihate lawo nexweşê xwe hilanî

Lê lê dayê rebenê tu bala xwe bidê di sona olayê de
Ez çûme tevna otobûsan sê hebê wê derê bê xwedî ne
Lo birawo fîzan û zarîna wan li erşê ezîm hiltîne
Min got: Keko hûn ji ko ne?
Du heban go: Bira em xelqê Doxûbazîdê
Birano dibên em Celalî ne
Yeka dinê min pirs kir min go: Keko tu ji ko yî?
Go: Navê min Elî ye navê bavê min Hecî Emer e
Mala me li Hemzeşêxa Bûlanixê dimîne
Wele pişta min bi du ciya şikestî ye
Halê min ji berê de milê rastê tune ye
Yek hebûya cewabekî bida dê û bavê min
Bila min helal bikin
Ez dimirim gunê dê û bavê min stûyê min nemîne
Wayê wayê wayê wayê way wayê wayê
Ax de wayê Mecîd lawo bira dayika te
Ji te re kor be lawo li dinyayê


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM